**K.T.**

**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ YA WANÊ**

**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYÊ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

# ŞI‘RÊN ŞAIRÊN YARSAN Û HIZRÊ YARÎ

Shatav Naderi MOGHADAM

VAN/2016

T.C
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

# YARSAN ŞAİRLERİNİN ŞİİRİ VE YARÎ DÜŞÜNCESİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Shatav Naderi MOGHADAM

DANIŞMAN
Yrd. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

VAN-2016

**K.T.**

**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ**

**ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

# ŞI'RÊN ŞAIRÊN YARSAN Û HIZRÊ YARÎ

**Amadekar**
Shatav Naderi MOGHADAM

**Şêwirmend**
Alk. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

VAN-2016

# NAVEROK

KURTE ..... III
ÖZET ..... 159
ABSTRACT ..... 161
PÊŞGOTIN ..... V
DESTPÊK ..... 1
METOD Û ÇARÇOVEYA MIJAR ..... 2
1. OLÊN ROJHİLAT Û YARSANÎ ..... 4
1.1. Olên Rojhilat Û Bandûra Wan Li Ser Yarsantîyê ..... 4
1.2. Yarsan-Kakey-Ehlê heq-Elî Îlahî ..... 24
1.3. Felsefeya Yarsan ..... 26
1.4. Çand û Edetên Yarsan ..... 32
1.5. Bingeha Ola Yarsan ..... 35
1.5.1. Nêrîna Wan li Çawaniya Avabûna Cîhanê ..... 35
1.5.2. Nêrîna Wan li Jiyanê ..... 37
1.5.3. Donandin ..... 38
1.5.4. Gerdîleya Xweda ..... 38
1.5.5. Rôjî û Nimêj ..... 39
1.5.6. Cem ..... 39
1.5.7. Qurbanî ..... 41
1.5.8. Simbêlberdan ..... 41
1.5.9. Sersipardin ..... 42
1.5.10. Parastina tiştên veşartî di nava olê de ..... 43
1.5.11. Dema Razanê ..... 43
1.5.12. Pênc Rêberên Olî Yên Mezin Yên Yarsan ..... 44
1.5.13. Balûlî May ..... 44
1.5.14. Bawe Serhengê Dewdanî ..... 45
1.5.15. Şaxoşînê Loristanî – Mobarek Şa ..... 48

1.5.16. Bawe Nausî Caf – Bawe Nausî Sergetî ... 50
1.5.17. San Sehakê Berzincî – Sultan Îshakê Berzincî ... 52
1.6. Pirtuka Pîroza Yarsan ... 53
1.7. Mûzîka Yarsan ... 54
1.8. Pîroziyên Yarsan ... 55
1.9. Yarsan ji Nivîs û Çavkaniyên Cuda ... 57
2. ZIMAN Û ERDNÎGARÎ ... 59
2.1. Ziman ... 59
2.2. Erdnîgara Yarsan ... 60
2.3. Cihên Pîrozê Yarsaniyan ... 62
3. HELBEST Û WÊJEYA YARSAN Bİ GİŞTÎ ... 68
3.1. Qonaxên Helbestên Yarsan ... 69
3.1.1. Qonaxa Yekem a Helbestên Ola Yarsan ... 69
3.1.2. Qonaxa Duyem a Helbestên Yarsan ... 78
3.2. Helbestên Yarsan di Roxsar de ... 85
3.3. Helbestên Yarsan di Navrok de ... 86
3.4. Felsefeya Yarsan di Helbestên Wan de ... 87
3.5. Sirudên Pîroz Yên Yarsan ... 90
3.6. Pexşanên Pîroz ên Yarsan ... 107
3.7. Kesayetiyên Girîng ên Yarsan ji Dîroka Helbestên Wan de ... 109
3.8. Efsane di Helbestên Yarsan de ... 129
3.9. Rehber , Arîf û Şaîrên Yarsan ... 132
3.10. (Dewreya Heftwane) Beşa Duyem a Pirtûka (Serencam) Hejmarek ji Sirudên Wê Beşê 142
3.11. (Dewreya Gilîm Wekol) Beşeke ji Pirtûka (Serencam) Çend Sirudek ji Wê Beşê 146
3.12. (Dewreya Çilten) Beşeke Ji Pirtûka Serencam Û Çend Sirudek Ji Wê ... 148
ENCAM ... 152
ÇAVKANÎ ... 153
FERHENGOK ... 157

## KURTE

Yarisan , kakey , ehlê heq , ely îlahy , komelek navên ku ew aîn bi wan navan hatine nasandin û ji bingeh de hemy yekin.hizr û boçûnên coda heye ji sere yarisan , hindek dibêjin: tewlê hew buneke ji bîr û baverên zerdeşty , mîtray , manewy , hînduy , mezdeky , û mesîhy , hindeka din jy dibêjin:yarisan yek ji fîrqeyên îslamîye û bi şîe nav diben , yan jy dibêjin hizreke ku ji îslamty derbas buye .hineka din jy ji bona pîroz buna(hezretê ely d.x) dibêjin wan ely îlahîn e.lêbelê bi nihêrtinê peyrewkaranê ew aîn , dibêjin aînê yarisan wedigere ji bo pêş xîlqetê mîrov , asiman û zemîn , ubingehê ew aîn hew dem ligel xolqandinê hefit firîşte cêgîr buye , bi wî watayê ku bingehê ew dîn birîtiye ji peymanê ezely ku ji dest pêkê de heq(xoda)ligel firîşteyên xwe bestiye û ji ew dem wê aînê bi coreya(raz)ji peyxember û ewliya hatiye û her kam ji wan jy qonaxeka ew aîn pêk anîne û erkê xwe bi cî anîne , heya sedeya heftemê koçy sultan sehak qonaxê dwiyê ew aîn aşkira kir , ji bona ewe sultan sehak bi damezrênerê aînê yarsan tê nasîn.

Zimanê daqên pîrozê ew aîn kurdy û bi diyalê hewramî ye , û hemiyê têkistê sire wan ji destpêk bi kêşn heşit hêcay hatiye nivîsîn û beşeka kêm jy turkiyê azery ye.çenid taybet mendiyeka ew aîn heye , mina parastinê nihêniyê ew aîn ji bo demeka dirêj , nivîsînê têkistê wan bi zimanê kurdy , bandoreka pir mezinê aînê yarisan hebuye ji zîndy kirin û parastinê zimanê kurdîde , efsaneya xîlqet û mijarên weky donadon û derketina xweda ji cesteya mirov de.

Sultan sehak ê berzency , ku bi nujen ker û binyat nerê aînê yarisan hatiye nasîn , ji wî aînê de kesyetiyeka pir taybetê ew heye: ji aliyek we yekeke ji mezherê xweda û ji aliyeke din kesyetiyeka civaky-dînî ye bandoreka pir meznê ew ji sere ew aîn heye û ji îşên giringê ew:

1- Nihêniyê yarî hînê xelkê kiriye.
2- Yaran û peyrewanê xwe kiriye bi panizdeh baş , û ji her beşek erkeka taybet dîtiye.
3- Pêk anîna (cem) û merasîma cewîz şikestin(cewîz şikestin yek ji nerîtên kevnê yarisanan e û ji nav wan de pir pîroze).
4- Diyar kirina sê roj ji bo rojy girtin û diyar kirina resmên ceşin.
5- Diyar kirina sirudên dîny û xwendina şîr û bi kar anîna tembur ji dema xwendina sirud de , û hemiyê rewiştên dîny(telqînê mry , xwe şoştin , niyaz kirin , …) bi fermanê ew bi şîr hatine honandin.

Sultan sehkê berzency pir bi nav û deng bûye û hejmareka pir ji mele û zanayên aîny bûne morîdê ew , ewejy hokarek bu heya çenid melayên binavê ew serdem mina:(mela elyasê şehrezûry , mela şefî , mela

şokrola , mela sure , mela xwfûr , mela nesûr , mela qudûr…)dijê aînê ew bin.

Sultan hizrê xwe ji qalibê şîry de ji pertukê pîrozê "serencam" de bas kiriye , hindeka din jy ji aliyê peyrewan ew ji serdemê code bi şîr honandin e , wan şîran bi "kelem" hatine nasîn , bas ji civak û çand yary dike û wateyê taybetê wan heye.

Şîr û edebiyatê yarisan ji sedsala dehemê mîlady(901m-1600m)bingehê edebê rengînê kurdy tê hisab kirin.ew edeb ji bo xizmet kirina bîr û baweriyeka gelê kevin çê bu , ew bîr û bawery coreyeka sofîzim bi xwe girit , mijulê "yekitiya bûn" bu.u felsefeya yarisan ji şirê wan de ji ser bingehê donadon çê buye , ku ji "defterê xêla heyasy" de bas jê kiriye , û bi şîr jy hatiye.ji pertukê pîrozê serencam de hatiye ku , sire aînê yarisan mina her edebeka din bi dirêjahiya rojgar çê buye paşan kon kirine.

Ji wî lêkolînê bi rêya şîrove û hewdodana şîrên şaîr û arîfên mezinê wan , hizir û coreya civak û çand û culture wan û peywesit buna wan bi rêbazên din didem nasîn.

## PÊŞGOTIN

Ola Yarsan yek ji mîratên mirovahiyê û bi taybet ya Kurdên Zagrosnişîn e. Tijî ye ji felsefe , remz û razên jiyan û gerdûnê. Rojhelatnas û lêkolînên biyanî pir li ser vê olê axaftine , hinek caran tiştên ne rast gotine yan jî ji aliyê neyarê vê olê bihîstine û nivîsandine. Ji aliyê nivîskarên Kurdan ve jî çend xwendinên hevçerx , şîrovekirin û lêkolîn li ser vê olê ku beşeke zîndî ya çand û dîroka Kurd e.Afirandina gerdûnê , mirov , felsefeya "cameguhertin ango donadon" (derbasbûna rûh ji laşekî bi laşekî din) , muzîk bingehên Ola Yarsan in. Koka vê olê ji nav xaka Kurdistanê û Çiyayên Zagrosê ye. Pakî , rastî , nîstî (fenabûn) û riza çar şertên Yarsan in. Bi wateya rastî , jiyaneke derwêşane û fîdakarî ji bo gel , şairê yarî Şah Teymûrê Banyaranî yek ji helbestwanê yarsan e (898-961q)li ser van şertan bi Hewramî dibêje:

***Yarî çwar çêwen baweriş we ca***

***Pakî û rastî û nîstî û reda***

Bi wateya ku ola Yarsan li ser çar şertan e peyrewên vê olê divê van şertan bicih bînin ango pak û rast bin û jiyaneke sade û fedakarane bi ser bibin. Ev xal nêzîkahiya ola Yarsan û ya Zerdeşt nîşan dide. Ola Zerdeşt jî sê şert hene; kirdara baş , fikra baş û gotina baş.

Sedsalên 13 û 14 zayînî serdema zêrîn a ola Yarsan e. Di vê serdemê de ku wekî ya kamilbûn û xetmbûna Yarsan tê dîtin , Sultan Sehak**(**1272-1388m) yasa û bingehên vê olê temam kirin. Pir kes ji gelek cihên dûr û nêzîk li derdora wî kom bûn û bûne peyrewê Yarsan. Bazneyên yarî bi awayê heftkesî ango "heft ten , heftewane ," çilkesî ango "çil ten ," heftê û du pîr , û not û neh pîr ji aliyê Sultan ve hatine rêkxistin. Ji vî awayê rêkxistina bazneyan re "Dewreya Pirdîwer" tê gotin ji ber ku li gundê Pirdîwer ê Hewraman hatiye danî ku îro dikeve Rojhilatê Kurdistanê.

Wê serdemê , Şehrezûr navendeke serekî ya zanist û perwerdeyê bûye. Xelk ji cihên dûr ji bo hînbûna zanist li ser destê melayên (misilman) ên navdar wekî Mela Ilyas Şehrezûrî û Mela Qîdûr Şehrezûrî diçûne wir. Bi cudabûna Mela Abidîn ji Îslamê û çûna wî bi ser ola Yarsan , gelek kesên din berê xwe dane devera Şêxan li Pirdîwer a bi ser qezaya Newsûd. Pirdîwer navend û qibleya ola Yarsan e û tiştên pîroz ên yarî li wir in.

Du sedemên hilbijartina min a vê mijarê hene. Yekem sedem şexsî ye; ez li Navçeya Hewraman ji dayîk bûme. Piçûkahiya min kal û pîrên me ji folklor û baweriyên kevn diaxiftin. Ji ber vê yekê ola Yarsan ji min re bû pirsek ku jê re li bersivan geriyam. Ev tez ji min re bû derfeteke baş ku bi lêkolîn li dûv bersivên pirsên xwe bigerim.

Sedema duyem jî helbet akademîk e. Ji ber ku;

Nivîskar û lêkolerên kurd li ser ola Yarsan gelekî kêm xebat kirine û di civaka me de bi giştî agahî derbarê vê olê de kêm in.

Ola Yarsan oleke Kurdî ye û heya niha jî bi giştî xwênerên Kurd pir ne şarezayî vê olê û xizmetên peyrewên wê ji ziman û edebê Kurdî re ne. Ji ber vê yekê ez dixwazim bi vê xebata xwe herçendî piçuk jî be vê kêmasiyê hinekî ji holê rakim.

Sipasî:

Ji mamoste Sîdo Dawid Elî re ku di dîtina çavkaniyan de arîkariya min kir.

Ji mamoste Mewlûd Îbrahîm re ku pir arîkarê min bû.

Ji mamosteyê xwe yê şêwirmend Ark. Doç. Dr. Abdulhadi Timurtaş re ku mijara min qebûl kir û rênîşaniya min kir.

Şetav Nadirî Muqeddem

## DESTPÊK

Giringî û Armanca Mijar:

Dosed sal piştê hatin û sepandinê ziman ,aîn û kolturê ereb ku bi navê aînê îslam ji qelemrewê ariyaiyande bilav bû ,ji bo yekemîn car kurdek bi navê Behlûlê Dana ,hatiye û bi zimanê kurdî banghêşit kiriye heya aîn kevnarê kurid û ariyaiyan zindy bike. Bi wateyeka din derketina runakbîrek ku bi dû ziman û koltura kevnarê (nasnameya xwe)xwe ketiye ,ewe yanî red kirina ziman û koltura ereb û ewejy zimanê kurdy ji bingehê aînê yarisan pîroz dike û bi wî core aînê xwe bilav dike û ji jinav çun diparêze. Heya ji sedeya duhemê koçy de balûl û yaranê ew bi sud wer girtin ji aînên kevnar(mîtray û zerdeşty) , aînê yarisan pêk anîn , gotinê û têkistên aînîyê xwe bi diyalêktê hewramy nivîsyn , bi wan çavkaniyan ku min ji wî lêkolînê xistiye ber çav , rêbazê aînê yarisan yek ji aînê mêjuyê mirovahiye û her hebuye û ji belûlê dana û serheng dewdan û runakbîrên din ku bi du hewda hatine û ew rêbaz nujen kirin e , ji têkistên pîrozên serencam de hatiye ku (serencam)ê peyrewkaranê yarisan cihê (avêsta)yê zerdeştiyan girtiye , pîr binyamîn ku pîr û morşîdê hemiyê yarisanane cihê zerdeşt girtiye , wate ji cewherda yekin. Ji serencamê de (pîr binyamîn şaho) , ji derdewra sedeya heftemê koçy , ji çiyayê şaho ji hewreman , rêbazê hizr kirin û felsefeya yarisan ji ser bingeha donadon û berdewam bun binyat kir , mîna aînê zerdeşty yasayê suran û berdewamy dubare dike. Aînê yarisan heya îro jy bi nihêny maye û hatiye parastin , peyrewanê ew aîn jy pir kêm ji ser ew aîn diaxavin , yarisanan ji ser ew baverîne ku aînê wan aîneka kurdîye û kevintirîn aînê ser zemîne û ji demek ku kirdigar jiyan çê kiriye bi coreya donadon hatiye ser zemîn û heya îrojy berdewam e.

Bi wî core dikarîn bizanbîn ku girinniyê ew mijar ewe kutêkistên name û pertukên yarisan weky têkistên pîrozê aîny ji wan nihêrtine û bi aşkira îş ji ser wan nekirine û bi nihêny hatine parastin , ji rêya wê lêkolînê derwazeyeka nû ji aliyê wan têkistan we dibe û ji bazneya aîny derdikevin û mîna belge û têkistên edeby ligel wam mamile dikîn , ji ber ku ji bingeh de aîn û têkistên pîrozê yarisan beşekin ji kultûrê resenê kurid.

**METOD Û ÇARÇOVEYA MIJAR**

Di wê lêkolînêde bi pişt bestin bi çavkaniyîn mezheby û mêjuyên lêkolîn ji aînê yarisan û şaîrên kevinê wan , rêbazê wesfy bikar anînimku di destpêkêde pêwîste , reçelek , serheldan û bingehê ew aîn nas bikîn û paşan dest bi şirove û rave kirina deqên şîrîyê wan bikem , ji bona ewe ji destpêkê wê lêkolînêde ew girîmane heye ku bi pişit bestin bi xwendinê têkistên pertukê pîrozê yarisan(serencam)bi zimanê kurdy û paşan lêkolîn ji wan çavkaniyan ku ji bo şiroveya wan têkistan hatine nivîsîn , bigehêjîn e ew encam ku ji bo gehiştin ji bingeh û serheldana ew aîn , pêwîsit bi xwendineka bi hêz ji mîtolojiya , aîn û nihêrtinê dînîyê îslam û derweyê îslam ji wan navçane heye ku ew aîn ser heldaye û geşe kiriye.ji ber ewe têkistên yarisan tijîne ji amaje û sîmbolê mîtolojy û dîny û mêjuy ku ji rêya xwendineka hûr pêwîst bi şîrove û gehiştin ji wan dike.Peyva h.b tê wateya herwekî bihuri , û peyva r tê wateya rûpel.

**Dîrok û Çavkaniyên Bingehîn**:


1. Kiyani Mohsên , Tarîxê Xaneqah Der Îran, Tihran, Kêtanxanihy Emîry, 1380, r2

2. Rîçarid.n firay,Mesud Receb Niya,mîrasê bastanîyê îran,Êntişarati Êlmy û Ferhengy, Tihran,1963,r55

3. Rostem,Eyûb,Yarsan,Melbendê Rewşenbîrîyê Hewreman,Hewlêr,2006

4. Mîxael Oîç Diyakonof. Wergêr: Rohy Erbab. Danişnamêhy Îran Basitan. Emîr Kebîr, Tihran, 1380. r1994

5. Îgor Mîxa elioiçDiyakonof.Danişnamêhy Îran Basitan.Emîr Kebîr, Tihran,1380,r1998

6. Îgor Mîxa elioiçDiyakonof. Danişnamêhy Îran Basitan.Emîr Kebîr,Tihran,1998,r2054

7. Cîmiz Hal,Ferhengê nigarihy nemadha der honerê şeriq û xerib, Wergêr, Roqiye Bihzady, şabok, Tihran, 1389, r85

8. Rizay, Haşim, Aînê mîhir-mîtraîsim, bihcet, Tihran,1371,r ,307

9. Borekey,Sefyzadeh,Sidîq ,Ehlê Heq pîran û Meşahîr,Horûfîyêh,Tihran,1387,r

10.Bextur Taş, Nosretolah, tarîxê perçemê îran, Bihcet, Tihran, 1391, r,92

11. Zerînkub, Ebdol Hoseîn, Do qerin Sikut, Mohrêgan, Tehran, 1330, r 90

12 .Osiş Mandilay Ewel.Rêg Wida,şomal xerbîyê şibhê qarihy hind,1100,1700,sirudê 48.

13. Reuf Tewekolî,Mohemed,Tarîx Tesewof Der Kordistan,Tewekoli,Tehran,1381,r17

14.Qadirî,Teymur,tolo û xorub ê zertoşty gery,şabok,Tihran,1375,r,261

15. Mîrça Elyade,Wergêr,Celal setary,çişmendazhay osture,Şabok,Tihran,1393,r,144

16.Mêskub,Şahrox,sug siyaweş,Xarezmy,Tihran,1386,r,81

17.Can Rasil HînlizWergêr,Ehmed Tefzîly,Jalê Amuzigar,Şinaxtê Esatîr Îran,Çişmêh,Tihran,1368,r330

18. Orşîdy,Cehangîr,Danişnamey Mezdîsna,Şabok,Tihran,1371,r37

19. Mîrça Elyade,Wer.Celal setary,çişmendazhay osture,Şabok,Tehran,1393,r,144

20. Mehmud Efendy Bayzîdy,Adab û Rosumê KUrdha,1368,Kitabxanihyê Merkezy,Tehran,1368,r85

21. Mînorisky,Kurd,Şabok,Tehran,1973,r76

22. Siddîq Sefîzade (borekey), Nameyê Serencam ya Kelamê Xezanê,Hîrmend,Tehran,1375, r.11,12,13

23. Namîq Hewramî, Peyrewakanî Yarsan Le Kirmancî Seruda, Hewlêr,Hewlêr, 2013, r.20

Yekem kesê biyanî ku lêkolin ji ser Yarsanan kiriye Henry Creswicke Rawlinson dîplomat û Serq nasê birîtanî buye 1810,1895 bi nawê Safernamehy Henry bi xuzistan,

Min bi xwe ji wan çavkaniyan pir sud wergirtm ji her aliywa.

# 1. OLÊN ROJHİLAT Û YARSANÎ

## 1.1. Olên Rojhilat Û Bandûra Wan Li Ser Yarsantîyê

Zimannas û rojhilatnasê Alman Max Müller dibêje ol xebateke ji bo têgihîştina wan tiştan ku em ji wantênagihin an gotina wan tiştane ku nayênnivisîn. Herwiha sîstemeke hevbeş a bawerî û kirdaran e ku taybet in bi tiştên pîroz. Li gorî civaknasê fransî Emile Durkheimol wan kesên ku pê bawer in di nav konekî manewî de kom dike.

Ol ango dîn bicihanîna kirdar , dabû nerît , exlaqê sirûştî ji bo gihîştin bi aştbûn û aramiyê ye. Herwiha bawerî bi sîstemekegiştî ye kugerdûnê ûcandaran hemû dihewîne.

Bi nêrînamateryalîstan ol ji rastiyê dûr e û encama tenêtî û tirs ji gerdûnê û bûyerêntirsnakên sirûştê ye. Hinek ji sedemên çêbûna ol pêwîstiya bi hevgiriya mirovan , xebata ji bo gihîştin bi aştbûnê , fitret û rûh in.

Bi vîawayîpêşketin û puxtebûna ol , xwenîşandana fitret û xebata ji bo gihîştin bi aştbûnê bûne sedem ku mirov hest bi hebûna hêzeke raserî gerdûnê bike. Ev jî dike ku mirov ji tenêtiya xwe ya li gerdûnê û tirsên sirûştî dûr bikeve.

Mirov ji bo rê bigire li nexweşî û belayan xwe disipêrewê hêza raser ku wekî çare û bersiv ji hemû pirsan re tê dîtin. Ev bawerî dibe tabû ango “taboo.” Bawermend jî bi vê tabûyê li rêberên xwe yên olî temaşe dikirin û digirtin.

Her tabûyek xwedî hêzeke nediyar û remzî ye ku jê re “mana” tê gotin. Ew hêza nediyar ducûr e:

1- Tiştên nepak û xebîs.

2- Tiştên pak û pîroz.

Ku ji wan re heram û helal tê gotin.

Totemîzm corek e ji baweriya olî ku heya niha jîdi nav civakê de diyar e. Bi pîrozqebûlkirina dar , kevir , şînahî û candaran e.

Fetîşîzm ango“tiştperestî” yek ji hizrên olî yênkevn bûye. Li gorî vê hizrêhinek ji tiştan hêza sihrî heye , wekî mînak qiloçê bizina kovîbûye.

Ew bawerîwekî mînak di xaça krîstiyanan û peykerên Îsa kurê Meryemê û dayîka wî de tê dîtin.Xaç û peykerfetîşên Krîstiyaniyê ne.

Anîmîzm jî yek ji hizrên olî yên seretayî ye ku li gorî wê canê hemû bûneweran heye ango her tiştek xwedî rûh e , ji kevir , dar û beran heta bi nebat û giyayan. Anîmîzm ji peyva “anima” hatiye çêkirin ku wateya rûh e.

Bi van awayanmirov dikarinbikevine dinyaya rûhî , li gorî baweriya xwe rûhekî ji laşekê derxin û bixin laşekê din.

Piştî van danasînan em bala xwe bidine Kurdistanê.

NavçeyaZagros ji destpêka dîrokê ve paytextê hoz û eşîrên cihê bûye ku gelek ol û bawerî jê derketine belav bûne.

Herwiha beriya hatina eşîrên Aryayî rûniştvanên resen û kevnên Zagrosê , hêz û diyardeyên sirûştê pîroz dihesibandin ûwekî mînak ji av , agir ûba re perestîş dikirin.

Gelê Mîtanî bi xwedayekîbi nave “Hûr” bawer bûnku bi taveke xwedî bask wêne kirine.

OlaHûrî ji girîngtrîn ola serdema xwe bûye û di wêolê de bawerî bi jiyana paş mirinê hebûye.

Gorna Şîrîn û Ferhadli navçeyaSehne yanêzî bajarê Kirmaşanêyeku dîroka wê vedigereserdema Mediyan. Ser deriyê gornêwêneyêtaveke xwedî bask heye.

Ev wêne dikare nîşaneyek be li ser peywendiyên navberaola Hûrî û rûniştvanên başûrê Kurdistana Îranê de.

Ola Mîtra yan jî Mîhr , pêşiya derketinaZerdeşt li nav Aryanan de hêzeke manewî bûye ku bi taybet xelkê ji rêzê diheband.

Dûvre piştîhatina Zerdeşt bandora Mîtra pir kêm bû û Zerdeşt asta Mîtra bi kirina beşek jiola xwe kêm kir.[1] Îrannasê alman Helmut Humbach di wê nêrînê debûye ku Zerdeşt baweriya bi Ehûra ji pêşiyên xwe wergirtiye û guhertiye , yan jî bi xwe navêEhûra Mezda daniye.[2]

Mîhr mîna yek ji wan Ehûrayan e ku di pirtûka Rîgveda ûli ba hozeke Gatakan de mîna xwedayê peyman , rastî , tîrêj , û ronahiyê hatiye nasîn û ligel du xwedayên girîngên wê serdemê bi navênÎndra û Varuna hatiye navanîn. Piştre cara duyem bi coreyekî din roja 25 Çileya Pêşî ya 272 pêş Zayînê , ji xwedayaNahîd dîsa ola Mîhr

---

[1] Mohsin Kiyanî, *Tarîxê Xaneqah Der Îîran*, Weşanxaneya Şabok, Tehran, 1380, r28
[2] Richard N. Frye , *Mîrasê Bastanîyê Îran*, wergera Mesûd Receb Niya, Weşanxaneya Ilmî û Ferhengî, Tehran, 1963, r55

derdikeve û bi rêya rojavayêÎranê yanîKurdistanê digihe Asyaya Piçûk û ji wirjî digihe Ewrûpayê û dibe ola fermî ya welatên Ewrupayê.

PirtûkaRîgveda behsa Mîtra kiriye û li gorî wêdema Mîtra diaxave , teşwîqa xelkê dike ku îş bikin.

Mîtra zemîn û asman girtiye , Mîtra bi çavekî vekirî temaşeya xelkê dike. Mîtra xwediyêcîhanê ye û ji asman û zemîn mezintire.

Her pênc nîjadên Aryan berê xwe didine Mîdya û ew bi hêz e ji bo arîkirina wan ji ber ku ew mezinê hemî xwedayan e.

Mîtra bixwe rizqê xwedeyên din , xelk û wan kesan bûye ku ji bo birêvebirina yasaya pîroz kar dikin.[3]

Li gorî pirtûka Avesta , Mîtra xwediyê hezar guh û deh hezar çav e. Ji mêrgaxwe ya mezin rizq dide candaran û hêz dide cengaweran , bexşendeye. Pile û payeya wî padîşahî ye.[4]

Di ola Mîhr de du hêzên sereke her dem di şer de ne. Ew du hêz jî Ehûra Mezda û Ehrîman in.Hezarsala duyema pêş zayînê , bi hatin û niştecihbûna hozên Hind-Ewrûpayî , guhertineke mezin diol û zimanê rûniştvanên Zagrosêde çêdibe. Peydabûn ûçêbûna bawerî bi xwedayên Ariyan wekî Varuna , Îndra ûMîtra li nav neteweyên Zagros nîşaneyeke wêguhertinê bû. Pir nakêşe ku Mîtra dibe girîngtirîn û mezintirîn xwedaya wê serdemê ûMîtraîzmdibe ola serdest yaw ê navçeyê û heya li Ewrûpayê jî belav dibe. Ola Mîtraîzm bi taybet di leşkeran de belav dibe. Sedema vê yekê jî ew bû ku bingeha wêolêmêrxasî , yasa û fedakarî bûye. Ev taybetî di Ehlê Heq de bi distûra“riza”heye ku yek ji hizrên sereke ye.Şêx Emîr dibêje:

*Yarî çwar çêwen bawerî we ca ** Rastî û pakî û nîstî û rida*[5]

Mînakeka din jî ji bandora hizrê Mîtra li ser olaYarî , gotina rastî ûpeyman neşikandin e ku pir girîng e. Sultan Sehak li ser vê yekê dibêje:

*Çe qewl yektir nekeranê rem ** Daîm zîkrê heq biwe nîşan nedem*[6]

Abidînê Cafyak ji helbestwanê bi navê yarisan e(1320-1394m)di benda262 ya dîwana xwe de dibêje:

---

[3] Tayêb,Tahiri,Mêju felsefey Serencam,Şabok,Tihran,1381,r.597
[4] h.b., r.597
[5]h.b., r.597
[6]h.b., r.597

*Rastîûpakîû nîstî û reda ** Biken armanc le berda*[7]

Mîtra di Veda û Birehman dejî xwediyê peyman , rastî û ronahî ye. Mîtra diVedayê de li dijî derew û derewgotinê ye.[8]

Baba Nawis jî di benda 41ê ya dîwana xwede dibêje:

*Ham îqrarê qewl ywêş bo hewadar ** Bira we qewlû bira mewo resgar*

Rêzgirtina li peyman diolaYarî de ku di dûaya Hevaltî ya Serencamêde hatiye , û pir dişibe soz û peymana ku di Avestayêde behs hatiye kirin. Divê pir rêz ji peymanê re bê girtin , jiber ku peymanşikandin gunehekî mezin e û hin cezayên wê jî hebûne.[9] Di hizra yarîde her yarsanek divê xuşk û birayekî yarsan ê din hebe , yan jî divê li gel mêr an jinekê peymana biratî anjî xuşktî çêke. Ew peymanjî bi rêwresmeke taybet çêdibe heya ku biratî yariyan bi yawerî û xweşdiviyê bi bazneyaYarsananve bibeste.

*Ray birayîman pa heya w şerme ** Yek bêdar kerdê çey sengîn werme*

*Yaran birayî berdê we îqrar **Kemer bestey dîn ezelî teyyar*[10]

Komek peyrewên Mîtra li Mêhrabeyê wek hev bûne , peyrewên yarî jî liCemêbi wî coreyî wekhev bûne. Kincên wekî hev û yekcore li xwe dikin û bi hev re goştê ga û xwîna wî vedixwin. Pîr ûmirîd li ba yariyên ji rêzê dirûnin ku nîşaneya wekheviya wan e. Ji bo wan ga candarekî pîroz.[11] Ji berê ve ga li ba qewmên Arîyan ajelekî pîroz bûye.Ev hizr li ba hîndûyan bi temamî hatiye parastin ku berevajî yarsanan goştê wî nayê xwarinê. Di ola Zerdeştî de qurbanîkirin ûxwarina goştê ga qedexe ye. Ga ji berêve berçavtirîn remza cînsî yanêrîne ye li ba mirovan. Ango xwedî hêzeke mezin a cotbûnê ye. kir. Enerjiyê cinsî yê ga ji mîtolojîyê de têkildar bûye li gel tav , asman û xwedaya.Ga wekî Yezdan çêker tê hesibandin. Perestina ga li Misr û rojavayê Asyayê

Diyardeyekehevpar bûye û li Hîndistan , Yûnana Kevn , Roma û beşek li Ewrûpayê jî ga mîna xwedê diperestin. Perestina ga li ba gelek qewman , têkildar e li gel ustûreya Yezdan bûye.[12] Li mîtolojiya Skandînavya ku pir dişibe mîtolojiyaÎranê mirovê pêşîga bûye û ev diyardedi olaYarsande jî heye. Rêz li ciyêku ga lê tê qurbanîkirin û

[7] h.b., r.597
[8] Îgor Mîxaîlovîç Diyakonof, T.Rohî Erbabcî, Wer. Kerîmê Kişaverz, *Danişnamêhayê Îranê Bastan.* Êlmî Ferhengî, Tehran, 1380, r.1994
[9] Îgor MîxaelioiçDiyakonof.*Danişnamêhy Îran Basitan.*Emîr Kebîr, Tihran,1380,r1998
[10] Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r598
[11] Îgor Mîxaîlovîç Diyakonof, T.Rohî Erbabcî, Wer. Kerîmê Kişaverz, *Danişnamêhayê Îranê Bastan.* Êlmî Ferhengî, Tehran, 1380, r.1998
[12] Îgor Mîxa elioiç Diyak onof. . T.Rohy Erbab,wer,Kerimê Kişaweriz, *Danişnamêhy Îran Bastan*t,Êlmi Ferhengi,Tehran1380,r.2054

goştê wî tê danîn tê girtin.[13]Qurbanîkirina ga û bizinakovî nîşaneya girîngiya wan ajelan e li ba Yarsanan. Ji ber ku bizna kowî û ga destnîşan dibin ji bo qurbanîkirinê dibine totem. Di derbare vê yekê de Sultan Sehak ku wekî Padîşah jî tê nasîn dibêje:

*Beqeren beqer , beqeren beqer ** Gaw binyamîn , beqeren beqer*

*Binyamîn gawiş , mahûxor in mahû xor ** Nîşanedaro , ew ne ferq ser*[14]

Dîsajî di heman dewreya kelamî de ango beşa pirtûkade Pîr Binyamîn-Pîr xidrê şaho (633k)hatiye dinyadibêje:

*Zatiş ne kelen , zatiş ne kelen **Gawim wayren , zatiş ne kelen*

*Zatiş ehmeden , naziş çewelen ** Heniş nîşane , şaxiş pel pelen*[15]

Totem di olaYarîde tenê ga nîne , belkî bizna kovî , beran , dîkjî pîroz in. Ji bo qurbanî û serjêkirinê kîjan ji wan candaran be dibe. Di ola Mîtra de demaGa tunebe , nan û şerab bikar dîanîn. DiolaMezdaperestî de jîxwarina nanekî pîroz ku jê re dibêjinDirawne û vexwarina şeraba bi navêHome adet bûye.[16]Şairekî Yarsan , Dawid dibêje:

*Gaw beyo we war , gaw beyo we war ** Çi ser û sîre , gaw beyo we war*

*Ez we fîdat bam , şîrîn kemandar ** Koştey a gawe aman we tomar*

*We goşt kele zerd girtenima îqar ** Mayey mêrdanen siren çe koy yar*[17]

Wekhevbûna olên Yarsan û Mîtra bi şibîna qurbanîdanêxilas nabe. Wekî mînak jidayîkbûna Mîtra û pîrkalên berê yênYarsan , balamirov dikişîne. Mîtra ji keçekê ango ji dayîkeke bakîre çêbûye.

Jidayîkbûna ji keçekê di olaYarsande jî heye.Em dikarin bibêjin piraniya kesayetiyên sereke yên wêolê bi vî awayî hatinê dinê. Mînakên ducanîbûna Mama Celale bi tîrejeke tavê , jidayîkbûna Şaxoşîn , yan jî çêbûnaMîtra li cihekî çiyayî ku ji zinarekê derdikeve hene.

Şibînaola Yarî û Mîtrayîdi pile û payeyarêberên olî jî tê dîtin. Diola Mîtrayî de heft pileyênolî hebûne ku her peyrewek bi qasê asta baweriya derûnî ûçalakiyên olî

---

[13]Rizay,Haşim ,*Aînê mîhir-mîtraîsim,*bihcet,Tihran,1371,r ,307
[14]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r.599
[15]h.b., r.599
[16]Îgor Mîxa elioiçDiyakonof.*Danişnamêhy Îran Basitan.*Emîr Kebîr,Tihran,1998,*r2054*
[17]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r.599

digihe pileyekê û dûvre dikare xwe ji bo pileyeke dinamade bike.Ew heft pile û paye di ola yarî de jî hene.

Hejmara heftdiolaYarî de çerxekegirîng e. Hejmara heftdi serdema Sultan Sehak de bingeha çêkirina civaka Yarsan , pile û payeyên olî bûye. Rêkxistina bazneyên olî wekîheft ten , hewt wane , hewt bêjer , hewt Jenyar , hwd. Pîroziya hejmaraheftê ûdabeşkirina pileyên olî li ser wê , hem di ola Mîtra û hem jî diolaYarsan de remze û coreyeke pir girîng a nihêniyên wanolane. Nabe tu car sir û remzan aşkera bikin. Dawîn û bilindtirîn pileya olê Mîtrayî heftemîn pile ye ku nave wê pileya “piter , peder” ango bav e û wekî Helo hatiye nasîn. Ew pile di ola yarî de wekî hêzamutleqû nîşaneya meziniyaHeqîqet (Yarsan) tê dîtin. Nîşaneya wê pileyê Şabaz' ango Şahê Teyran e. Di pirtûkaSerencamêhatiye destnîşankirin. Helo yan Şabaz nîşaneya Hezretê Heq e.Li ser nîhayeta kemal , Qelemdar Pîr Mûsa dibêje:

*Niyet pey kamîn hasila erco** Weşyawe zêlim Şabazman meyo*[18]

Di vêderbarê de Kaka Reda li benda 159a dîwana xwe de li ser Şaxoşîn dibêje:

*New şeqey Şabal Şabazê sifîd ** Birûzkerdiş zat ne daney omêd*[19]

Dîsa di gotina dewreya Damyarî de hatiye ku Pîr Binyamîn damyar ango dav vedide da ku Şabaz bigire. Yanî hewl dide ji bo derketina Hezretê Heq.Ehmed di benda heftem a Damyar de dibêje:

*Damiş bê zewal , damiş bê zewal ** Damyar Binyamîn , damiş bê zewal*

*Nîna teneniş , ne werew Şabal ** Şabazîş girten xwacey yar Kema*[20]

Di pirtûka Rîgveda de rêz ji wan balindeyan rehatiye girtin. Di pirtûka Mandelaya Çarem , sirûda 26m de hatiye ku Şabazserwerê hemû balindeyan e.Helo di Avestayê de bi Sen nav birine ku ew peyv ligel peyva Şey ya Senkrîstî hemwate ye. Em dikarin bibêjin ku ew heman peyve ku di zaraveya Lekî ya zimanê Kurdî de bûye Saîn.[20]Bingeheke din ahevpar di navbera ola Mîtrauyî ûYarî de rêzgirtinaTavêye. Tav di ola Mîtrayî de remzaMîtra te , di hizraYarsan de jî tav menzilgeha Hezretê Heq e.Binyamîn di gotina dewreya Sac narî di hejmara 16m de dibêje:

*Ez we şone pay , pîrê çemdarî ** Melom pey coyay şay xawendkarî*

*Wêm fir da , çetoy a sacnarî **Dîm ke şa nîşten , ne dilê narî*[21]

---

[18]h.b., r.600
[19]h.b., r.600
[20]h.b., r.600

Bi gotina Serencam û bi hêzra yarîtav an her tişteke din ku ji aliyê pakbûnê ve ji tavê bi hêztir be , ewXwedawende. Ji ber wê sedemê bi "lamekan"ango bêmekan nav dînin. Ser wê kelamê Serencam dibêje:

*Sitarey mezyo ne camey xorşîd ** Pîşanî heyder cay şewq û omîd*[22]

Di Serencamê dedûayek heye bi navê Zerdexor ku her Yarsanek dema avabûna tavê tê xwendin.Abidîndi gotina dewreya Xezane de dibêje:

*Ezanom nesîm karxaney zate ** Xor ke lîsk medo selwat selwate*

*Xor ke lîsk medo cîhangîr mewo ** Şewqiş çe cemal Padişa w pîr mewo*[23]

Dîsa jî ji ber ku Şa Îbrahîm Eywet(1324 , 1407) Baba Yadgar Eqîqû Yeqîn(761k)hatiye dinya , nûnertiya îrfanî Hezretê Heqdikin , tav ji zatê wan çêbûye. Tav Baba yadigar e , hêz tîrêj jî Şa Îbrahîm e. Nîmet Şa îbrahîm di wê derbarê de dibêje:

*Zirîne gîsa… ** Nawis , Ehmeden zirînegîsa*

*Ez çenêş şanam pirşing we lîsa ** Lîsman ça weren nûrû temîsa*[24]

Şêx Zemanê Mirkey jî dibêje:

*Aftaw Ehmeden şehîde w canî** Ham lîfş nêmet şîr Yezdanî*[25]

Dibêjin Seyîd Heyder-Seyîd Birake(1210k)hatiye dinya ji 80 salide wefat kiriyeku yek ji peyrewênmezinênSultan Sehak bûye di sedsala sêzdehem de , her sipêde diçû cihekî bilind û li hêviya hilatina tavê dima. Dema tavê dihilta ew jê re diçû secdeyê.

Derwêş Fetholayê Goran jî her roj serê sipêde û berêvarêdiçû ser çiyayekî bilindli navçeya Sehne û temaşaya tavê dikir û perestîş dikir. Tav mîna remza pakî di hemi olande cihê taybet bi xwe heye. Di Îslam detav navê yek ji sûretên Quranê ye. Di Rîgvedayê de bi vî awayî behsa tavê hatiye kirin:

"Bi bextewerî derkeve ey Şajina ronahiyê , bi serwet û saman derkeve ey bexşindeya mezin."[26]

---

[21]h.b., r.601
[22]h.b., r.601
[23]h.b., r.601
[24]h.b., r.601
[25]h.b., r.601
[26]h.b., r.601

Ev kes ku dema nêz bûye her hizrek ji bo aliyê xwe dikêşe. Mîna kesên di deryayê de , ji mezintir digirîn. Tav mîna dayîkeka mîhreban tê û pir bi baldarî her tiştî kontrol dike , jiyanê vedijîne , hemû candaran hişyar dike û hemû balindeyan difirîne. Jibo dîtina wê , hemû candaran xwe amade dikin. Ew serwera xaliqê ronahiyê ye.[27]Ev core rêzgirtin li tavê ji bo pakî û ji ber bexşîna jiyan bûye sedem jiYarsanan re tavpişt bê gotin.

Tav di nêrîna Yarsanan de hêz û pakîye ku ji xulqênerên din hilgirê cîlweyeke zêdetire.Şaxoşîn dibêje:

*Ey dîre daran dîret kere eriz** Dost dîre daran dîret kere eriz*

*Teng bozet bikêş metirse w melerz ** Xorem , dire dar , ser awer we beriz*

*Şikar aşqan nimebo ser herz*[28]

“Firer” bi wateya tîrêj û ronahîye ku di zimanê Pehlewî de. Di zimanê Avestayî de tav e. Peyva xor di Avestayî û Kurdîde bi wateya tav hatiye. Ferir ronahiyeke yezdanî yekubi her kesî tê bexşîn û şayesteya serwerîyê ye.

Piştî çerxeya yekemê Pirdîwer , yekem kes ku dibe xwediyê pileya ferirŞa Îbrahîm bûye ku ji tavê yanî Baba Yadgarronahî girtîye.

Ferir pêşiya hilatin û piştî avaçûna tavê li pişt çiyayên bilindtê ditîn.Ew dibe sedemaçêbûna peywendiya navbera tavê û çiya ku li ba Yarsan ûZerdeştî bi çavekî pîroz têne temaşakirin. Ew pîrozî li navçayê Hewraman di çiyayên bilindên Şaho , Delaho û Yaftekêw de tê dîtin ji aliyê Yarsanan ve.

Peywendi di navbera tav (Roj) û du baskên teyrê Baz di dîrokê de tê dîtin , weke ku li ser tirba Şîrîn û Ferhad li navçeya Sehne jî tê xuyakirin. Ew yek jî nîşaneya rêzgirtinê ye li Baz û rojê. Roj dema ku ava dibe weke bask yan jî tirêj nîşan dide û ji

Aliyekî din ve baz jî weke teyrekî. Baz weke nêztirîn teyrê nêzî rojê tê dîtin ku hevdu digirin ku tavek bi 2 baskan xuya dike ku ew yek jî weke sirrên Yarsan û sembola heqê Yarsan tê zanîn.

Bi wî awayî , şop û şunwarên bi wî rengî ku li Kurdistanê tên dîtin derdixin holê ku heya sedsala şeşê ya beriya zayînê , ola Kurdan Mîtrayî bûye û piştî derketna ola Zerdeştî , neteweyên Arî , Zerdeştî qebûl kirin û dest ji ola Mîtranî berdan û dîtina hejmareka zêdeya Ateşgehan , tê wateya wê yekê ku kurdan jî Zerdeştî qebûl kiriye û

---

[27] Osiş Mandilay Ewel.Rêg Wida,şomal xerbîyê şibhê qarihy hind,1100,1700,sirudê 48.
[28]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r.602

şopên ola Zerdeştî jî di nava kurdan de zêde tê dîtin mînak:- hebûna helbest , şunwar û edetên herdu olan. Herweha di Serencamê de jî gelek belgeh hene ku kesayetiyên weke Emşaspendan , Pîr Binyamîn li Pirdiwer , Zerdeşte Dawûd Behmen , Pîr Musa Ordîbihêştî , Mistefa Şehrîwerî , Remizbar Sipendarmez , Baba Yadgarî Mordadî , Şa Îbrahîm Xordadî. dikarîn bibêjîn ku hemû kesyetiyên serekiyê Yarsan Heft ten û Heftwane û Hefê û du pîr , behsa wê rastiyê kirine. Ew kesayetî di gel xwedawendên ola Zerdeştî yekin û baweriya wan bi felsefeya Donadin û paqijî û başî jî bingeha xebata wan bûye. Pîr Ehmed Genceyî ku yek ji Heftê û du pîrên ola Zerdeşte ji bo nasandna erkê xwe û sedema derketina xwe di Serencamê de dibêje:

*Hem we rehmetit mewlay girdîn daw ** Diryan we destim jarê bêne aw*[29]

Xwedawendê Guşrun ku erkê wî parastina sewalan bûye , di Serencamê de navê wî weke Pîr Ebdol Ezîzê Besreyî derbas dibe , li ser erkê xwe dibêje:

*Hem we emrê to şay sirê pinhan ** Diryan we destim elîmê heîwan*[30]

Xwedawendê Eştad ku rênîşanderê Bihiştiyane û bi wateya rastî û paqijî tê û di Serencamê de navê wî weke Pîr Nasirê Bextiyarî derbas dibe û berpirsê erebaneya heyvê ye ku bi xwe dibêje:

*Hem we rehmê to padîşay ser dang ** Diryan we destim cilwe kêşî mang*[31]

Xwedawendê Zamyad ku erkê wî parastina erdê ye roja 28ê mehê bi navê wî kirine ku ji bo seferkirin , çandina şitlan û çalakiyên din pîroze ku di Serencamê de navê

Wî weke Pîr Qabîlê Semerqendî derbas dibe , di dema Pîrdiwer de yek ji Heftê û du pîrane dibêje:

Hem wey rehmetit azîzê bê bak ** Diryan we destim maye we ruy xak

Xwedawendê Ram ku di Awestayê de weke Rameh an jî Ramînû û di zimanê Pehlewî de jî weke Ramîş tê zanîn , roja bist û yekê mehê bi navê wî kirine û xwedawendê lêborîn , agirgeh ûxwarinên xweş bûye. Di dema Pîrdîwer de weke Kemalê Maholanî hatiye nasîn û derbarê rekê xwe di serencamê de dibêje:

*Hem we rehmetit xwacay Serencam ** Diryan we destim lizetê team*[32]

---

[29]h.b., r.604
[30]h.b., r.604
[31]h.b., r.604

Xwedawendê Raş yan jî Reştaw ku erkê wî misogerkirina serkeftinê di eniyên şer de bûye. Di dema pîrdiwer de û di serencamê de weke Pîr Îbrahîm Caf tê nasîn.

Xwedawendê Çîsta ku xwedawendê zanist î meirîfeyê ye di serdema pîrdîwer de weke Îbrahîmê Tebrêzî hatiye nasîn. Xwedawendê Dinyan ku erka wê bihêzkirina wîjdana mirovan bûye û di serdema Pîrdiwer de weke Ehmêdê Loristanî hatiye nasîn. Xwedawendê Dîwe ku xwedawendê Ba ye di dema Pîrdîwer de weke Pîr Roknedîn tê nasîn. Hemû xwedawend di dema Pîrdîwer de derfet ji wan re çêbÛye kucarek din derkevin û erk û peymana xwe bicih bînin. Di wê demê de erk û peymana xwedawendan cuda bû û her yek ji wan xwedawendê tiştekî bi tenê bû. Mînak pîr Îbrahîmê Caf bi tenê xwediyê wan çekan bû ku di qada şer de hatine bikaranîn. Lê kesekî din serperiştiya meydana şer kiriye ku ew jî pî Mihmemed Şarezûrî bûye û erka wî ya din birêve birin û rêkxistina bûyeran û diyardeyên xwezayî bûye. Her weha hejmarek din xwedawend hebûne mîna:- xwedawendê xweşikiya mirovan , xwediyê Erzaniyê , xwediyê xîretê , xwediyê ji xew rabûnê , xwediyê Razanê , xwediyê Bîhna xweş.

Ola Yarsan kesayetiyên beriya xwe weke girîng û pîroz dibîne. Dikarin bibêjîn ku hemû kesayetiyên Zerdeştî  mezin û girîngin li cem yarsanan û rêz li wan girtine. Ev yek jî sedemeka herî girînga çanda Yarsan û Zerdeştiye. Ji bo zelalkirina şibandina hizra Yarî û Zirwan mirov dikare pişta xwe bi metnên Zerdeştiyan girê bide ku Zirwan xwedawendê ziman bûye. Li wir mirov dikare balbikşîne ser gotineka Baba Necim ku Yarê Behlûl bûye û di Serencamê de hatiye behiskirin. Li gorî Serencamê , Pîr Mûsa dibe

mêvanê Baba Necim. Baba Necim di Çarîneyê de xwe weke Zirwan nîşan dide û dibêje:-

Zirwan biyanê , zirwan biyanê ** Ne dewrey werîn zirwan biyanê

Ehrî w wirmiz yaran diyany ** Kalay xas yare w dem şiyany[33]

Şirovekirina metna wê Çarînê :-

Zirwan piştî Hezar salan ji Qurbanîkirin , şukranekirin û duakirinê zarokekî bi navê Ahûra Mezda dixwaze. Lê goman li cem wî çêdibe û zarokê ku di ecnama duakirin û qurbanîkirinê çêdibe Ahora Mezdaye û zarokê di encama gomanê jî çêdibe Ehûraye. Zirwan jî soz dide ku pileya Padişahiyê bide wî zarokî ku zû tê dinyayê ,  Ehrûman jî agehdarî wê sozê dibe ûsînga diyaxwe didirîne û derdikeve. Lê ji ber bêhna nexweş Zirwan padişahiya wî qebûl nake . Ehrîman jî soza wî tîna bîra wî û Zirwan neçar dibe

[32]h.b., r.605
[33]h.b., r.606

ku padişahiyê neh hezar salan bide Ehrîman jî piştî neh hezar salan padişahiyê ji bo ebedî dide Ahora Mezda.

Zirwan di Avestayê de weke xwedayê demê hatiye binavkirin. Di metna Zadispêrim , beşa yekem de , di benda 24'ê de weke afirênerê Ahora Mezda tê nasîn. Çerxçî yan jî kesê ku demê dizivirîne di hizra Yarîde Dawûde. Her ew jî berpirsê hemûu wan bûerane ku ji roja ezelê hatine diyarkirin û dê biqewimin.

Bingeha baweriya wê rêk û pêkiyê jî ji 12 borcan pêk tê. Her borcek jî xwedî xwedawendekî ye ku kelama gewahîya heftê û du pîran û heft stêrkan ku serpêhatiyên miorvan di destê wan deye û pêşeroja mirovan destnîşan dikin , nîşana wê yekê ye. Bingeha wê baweriyê jî vedigere ji bo wê yekê ku bersiv ji bo hemû wan pirsan heye ku heya niha çi bersivek ji wan re nehatiye dîtin. Mîna ku çima divê ez mirovek hejar bim. Yan ji malbatek taybet an li cihek taybet weerim dinê. Bersiv jî bi wî awayî ye ku felsefeya Donandinê hemû li ser taybetmendiyên û binegha hêz û ruha mirovan de çêbûye. Mîna ku Hafîze şîrazî dibêje:-

*Men eger xarem we ger gol çemen aray hest ** Kez an dest ki û mîkşedem* mîruyem.

Wate: Eger ez nexweşik bim weke dirî an xweşik bim weke gulekî , bi destê wî kesî hatime nexşandin ku ez afirandime.

Bi wî awayî , di ola Yarsan de miorv encama liv û tevgera bihûriya xwe ye û neçare ku bedela tiştên nebaş yên ku di bihûrî de kirine bide. Dem pêkhateyeke taybete ku ji sê faktoran pêk tê ku evin( Bihûrî , Niha û pêşeroj) . lê ew jî li hev cudane û serbixwe ne. Di rastiyê de ew sê faktor weke zincîrê bi hev ve girêdayî ne û di encamê de demê pêk tînin. Felsefeya dem derdixîne holê ku dem tu carî ji hev venaqete. Ji ber wê yekê mirov dikare di niha de bijî û di bihûrî de jî.

Bi wateyekî din dikarin bêjin ku hebûna bihûrî ji ber dewama nihaye û niha jî cureyeke nediyare di dahatûyê de. Niha dahatûyê çêdike. Mirov bi dirêjahiya temenê xwe hewil dide bigihije dahatûya xwe . Bihûrî li ba Yarsan ew deme ku cihê niha ji wan re diyar kiriye. Wate kesê baweriya wî bi Donandinê heye , baweriya wî ewe ku encama bihûriya xwe jiyan dike.

Fîlosufê mezinê Elmanî Georg Frider Handel li ser wê mijarê dibêje:- Bingeha min ji bihûriya min tê û ew yek jî zagona jiyanê ye.[34]

[34]h.b., r.607

Fîlosufê Fransayî jî Rene Descartes jî dibêje: Nihaya me derdixe ku em berê hebûne. Di hedîseka Pêxemberê Islamê Hz. Muhemmed de tê gotin ku her kesek ku îmamê dema xwe nas neke , di nezaniyê de dimire ,[35] ku di Zerdeştî de Suşiyante , di Bûsîzmeê de Karîşna , di Mesîhyetê de Mesîh , di Îslamê de Mehdî û di Yarsan de jî Zat nîşana wê yekê ne. Bi giştî di hemû olan de kesek weke îmamê zeman di dema qiyametê de derdikeve. Di pirtûka Datistan Dînîk de tê gotin ku Erd di destpêka avabûna xwe de bê mirov nebûye û nabe jî û Ehrîman jî agehdarî wê yekê nîne[36] û ji wê mijarê bê zanyariye.

Li ba kesekî mezin û kesekî asayî pênasekirina Demê tiştekî cudaye û li cem melyaketan jî ku bi xwe demê dizivirînin pênaseya demê tiştekî giran nîne. Bi wî awayî agehdiyê li ser hebûna û şiroveya xwe li ser erdê didin. Di gewahiyên Serencam de jî tê gotin ku dikarin biryaran li ser dahatû û pêşeroja we jî bidin. Herweha dikarin wan kesên ku nêrîna wan yeke di demên cuda de wan kom bikin ku weke mirovên heman serdemê jî tên dîtin weke ku Yarsan û rêzabên din û Hurufiye de tê dîtin.

Bi wî awayî dem li cem Yarsanan gelek girînge û di rastiyê de qiyamet li cem yarsan tê wateya rawestandina demê. Demekî din li ba Yarsan heye ku 5 hezar salan

carekî dubare dibe. Hevdodana sal li ba awazên erdê cudaye ji hevdodana wê li ba xwedawend ku di serencamê de tê gotin:-

*Ya şa ne lay to sed sal we satê  **  Esîrim nekey ew ser be satê*[37]

Ew Mînata ku di Avestayê de hatiye behiskirin di şahnameya Fîrdewsî de bi temamî hatiye behiskirin ku beşeka girîng ya çanda îraniyane û di hizra Yarsan de jî gelek girînge. Di rastiyê de kesekî Yarsan beriya ku Serencamê bixwîne , pêwîste carekê şahnameyê bixwîne. Girîngiya Şahnameyê jî wesa kiriye ku kud wê pirtûkê wergerînin ser zimanê kurdî. Yek ji kesayetiyên kurd ku Şahname wergerandiye ser zimanê kurdî mela Elmas Kendoleyî ye.  Piştre li Iraqê ji aliyê Herdewelê Kakeyî û li Îranê jî ji aliyê Îrec Behramî ve hatiye weşandin. Bi wî awayî tê xuyakirin ku Mîtên Avestayê , Şahname û Kelamên Serencamê nêzî hevdu ne. Lê ew yek nayê wê wateyê ku serencam li gorî Avestayê tevdigere , belku derdixe ku Mîtên Avestayî beşeka dîrok û hizr û baweriyên mirovane.

Her çîrokeka Mîtê behsa bingeha tiştekî û berdewamiya wî tiştî dike. Mît di pêkhatinê de , bi taybet mîtên ku behsa diyardeyan dikin. Di gel wan mîtên ku behsa

---

[35]h.b., r.607
[36] Qadirî,Teymur,tolo u xorub ê zertoşty gery,şabok,Tihran,1375,r,261
[37] Mîrça Elyade,Wer.Celal setary,çişmendazhay osture,Şabok,Tehran,1393,r,31

çawaniya çêbûna gerdûnê dikinç şobheyeka temam heye.[38] Mît li ba Yonaniyan weke çîrokek pîroz tê dÎtin û wesa fêm dikin ku mît çîrokek rastiye.

Lêkolerê Îtalî Pîtazonî li ser mîtolojiyê dibêje:- Mît Efsane nîne , Dîroke , dîrokek raste. Vegotina Mîtan erk û amancên olan bicih tîne. Tê wateya dewamkirina jiyanê û geşkirina jiyanê ye. Sedema diyarbûna Mîtan di metnên Yarsan de wê taybetmendiyê diselimîne. Ew jî nayê wateya bawerbûn bi candarên xeyalî û derewan. Lewre çîroka mît tê wateya rastiyê , lê derew tê wateye derketin ji rastiye.[39]

Bi wî awayî nirxê Mîtan di vegotinê de û bandora wê li ser olan derdikeve. Erkê mîtan eve ku wan rastiyan bibîr bîne ku di demên cuda de qewimîne daku mirov şîretan lê werbigirin û bihijin rastiyê. Bi wî awayî Mît wê yekê nîşan didin ku titên binirx di cîhanê de hene û tiştên pîroz û rûhanî ne.[40] Mînak çîroka Mîta Xilaqet ku di hemû olande

Wek hev hatiye behiskirin. Di serencamê de di dewreya Abidîn , benda 263 bi wî awayî tê behiskirin.

*Zewîw asiman siruşty kird ** Çetê kewtê diruşty kird*

*Ewsa meşîe we xak xelqan ** Daru berşy bo leqan*

*Maşîwy dahêna le deny ** Meşye ber xoşî ba pikîny*[41]

Çîrokên Mîtan taybetin bi xwediyên çîrokên lehengî an jî kesayetiyên pîroz , weke Siyaweş ku di Pîrdîwer de weke Elî Qelender tê nasîn û li Kerbelayê jî Hisên. Çi qas piştî Îsalmê , ol û cîhana mirovên Îranî hate guhertin jî , lê piraniya hizr û nêrînên kevin di derûnê wan de mane ku çîroka şehîdbûna Siyaweş jî yek ji wan baweriyane[42]ku , Çîrokeka qehremaniya aşûra û çûna Îmamê

Hisên ji bo Kerbelayê û şehîdbûna wî jî yek ji wan bûyerên dîroka Îslmê ye ku di hizra Yarsanan de jî pir bi nirxe.Di hizra Yarsan de îmamê Hisên Baba Yadîgare ku nûnertiya îrfan û kemal û lêbûrînê dike. Bi nêrîna Yarsan aqûbeta wî şehîdbûne û pêwîste şehîd bibe û bibe qurbanî. Kuştina Habîl bi destê Qabîl , şehîdbûna Hisên li Kerbelayê û Elî Qelender û kesên din , bi şehînbûna wan bûne sedema pêşketina hizra wan. Elî Qelender dibêje:-

---

[38]Tayêb,Tahiri,Mêju felsefey Serencam,Şabok,Tihran,1381,r608

[39]Mîrça Elyade,Wer.Celal setary,çişmendazhay osture,Şabok,Tehran,1393,r,144

[40]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r.609

[41]h.b., r.609

[42]Şhrox Mêskub,sug siyaweş,Xarezmi,Têhran,1386,r,81

*Ew teştê tela , ew teştê tela* *Eliye nan al yew teştê tela*

*Se donim çiîyen ew teştê tela* *Ewal siyaweş duyemîn yehya*

*Swyemîn hosîn pur şehenşa* *Kerden nexcîrim res monîra*[43]

Bi gotina nivîskarê *Dîroka Boxara* xelkê wî bajarî , di destpêka sala nû de ji bo Siyaweş (Şahnameya Firdews) dîk dikin qurbanî. Li Îran û hejmarek welatên din yên asiyayê dîk weke qurbaniyê Tavê tê serjêkirin ku ew yek jî girêdayî ola Mîhre.[44] Niha jî di nava Yarsan de dîk ji bo Siyaweş Baba Yadîgar û Elî Qelender tê qurbanî kirin. Herwesa Tav jî di hizra Yarsan de Baba Yadîgare ( Binêrin kelamê dewreya Baba Nawîs ,

benda 23)ç Pîr Binyamîn jî rosteme û erkê wî xebate û tehemûlkirina misîbetane. Pîr Sefer di kelama dewreya Barge Barge , benda 43 de dibêje:-

Ew kuy semengan,… ** Barigay şam lwa , ew koy semengan

*We fermanê şam xwacay yek rengan **Rostem ne ywrit pîr serhengan*

*Çenî tehmîne banuy çelengan **Cam yekrengî noşa ru çengan*

*Her ew came bê pak kerdiş jengan ** Rostem ne yurit binyamîn sengan*[45]

Beriya Rostem , Binyamîn Mezherê Qobad bûye û pişt re ji laşê Keykaws Kîyanî derketiye. Her zehmetî û xebatek bo ruhekê hatiye destnîşan kirin û her ruhek xwedî melyaketekê ye. Ew jî di her demekî de heman erk û çalakiyê bicih tînin û heman serbûriya ku hatiye serê kesê berê tê serê kesên nûha jî ku ruha kesê berê çûye nav laşê wî. Mîna eş û îşkenceya ku Îsa Binyamîn Tehemol kiriye.

Pîr binyamîn jî ji berzince derdikeve û koçber dibe û bi armanca gihiştina rastîyan û naskirina xwedê heft salan li ba hef kesan dimîne û sala heftan li ba kesekî heft salên din dimîne daku koçberî û sergerdaniya xwe bibîneû bigihije desthilatê ku bû sedema kuştina wî. Yan jî qedandina herdu pîyên wî ji aliyê dujminên wî û şiwantiya sultan Sehak di nav Bîşe de( Binêrin Serencamê , dewreya Berzince. Fireydûn kurê Aptîn ku di avestayê de tê behskirin ku bi al3ıkariya Kaweyê Hesinkar (Dawûd) digihije padişahiyê û bi kuştina Zehad heyfa bavê xwe hiltîne. Fireydûb di hizra Yarî de Şa Îbrahîme ku jiyan û serbûriya herduyan wek heve. Fireydûn di zarokatiya xwe de bi şîrê çêlekê mezin dibe , ji ber wê yekê jêre kurê çêlekê jî tê gotin. Şa Îbrahîm jî dema

[43]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610
[44]Can Rasil HînlizWergêr,Ehmed Tefzîly,Jalê Amuzigar,*Şinaxtê EsatîrÎran*,Çişmêh,Tihran,1368,r330
[45]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610

zaroktiyê bi şîrê bizinê mezin dibe û weke Bizin Siwar tê nasîn. Lihevçûna mîtên Avesta û kesayetiyên pîroz yên hizra Yarî pirin û li wir girîngiyê didin gotina Pîr Melewan ku yek ji heftê û du pîrane.

*Ne ew koy cemşîd,… ** Bargey şam westen ne ew koy cemşîd*

*Wêş bê menuçihir ça werew ewmîd ** Cemşîd zerdebam bê çamawaw werzîd*

*Çwar ten heft tenan şonşa pir zîd ** Qobad binyam wezîr û şahîd*

*Dawd bê kawe ostad we hedîd ** Fereydun roçyar defteriş temcîd*

*Şîde mostefa roxsariş çuîn şîd ** Remzibar zerîn gul dayey îrec wîd*

*Îrec zerdebam we tîx bê şehîd ** Selem we tur sipaş wêney wilig bîd*[46]

Ji bilî mîtan , bawerî û hizrên wekhev di navbera oala Zerdeşt û Yarsan de pirîn li vir emê dê behsa hinek ji wan bikin.

Yek ji adetên kevnarên Zerdeştî giringîdane bi Hinaran , ku di wê olê de yek ji fêkiyên bihiştê ye û di cen 3u merasîmên olî de bi taybet sîrmonaya dîlanê de hatiye bikaranîn[47] û di nava Yarsan de bi heman awayî tê bikaranîn. Hinar sembol û nîşana Baba Yadigare. Ji ber wê yekê Xaniya Sarê diya Baba Yadigar bi xwarina hinarekê ducanî dibe û Baba Yadigar tê dinê. Hinar li ba Yarsan bi tenê sembola baweriyê nîne. Belku di demên bihûrî de li ba gelên rojhilata navîn û Hindistanê û hejmarek welatên din weke sembola berfirehî û baweriyê hatiye nasîn.

Hinar nîşaneya xwedê , Hîlîn Dimmtrasris , Pirsfone û Hiraricunu bûye û wesa derdikeve ku sembola hêza seksê û hamîlebûnê ye. Li ba xaçperistan jî hinar sembola vegriyan û ebediyetê ye ku di wêneyên pîroz de hertim hinarek di destê Îsa de heye.

Dîsa jî Agir di herdu olan de pîroze. Di ola yarî de , agir mezherê Mistefa Daudane ku yek ji çar yarên sereke yên Sultan Sehak bûye. Di ola Zerdeştî de jî dema behsa agir tê kirin , weke kurê Ahûra Mezda tê binav kirin.Di Rîgîvda de bi wî awayî behsa agir tê kirin: Agir weke guliyê darê berê xwe dide esman.

Agînî (Xwediyê Agir) mîna rohaniyekî pispor di hembêza diya xwe de ku cihekî bêhn xweşe , rûniştiye...Hêza wî ji ya gayekî ku hezar qoçên wê hene zêdetire. (Binêrin Mandîlayê Pêncem , helbetsa yekem) û di helbetsa Şazdehan de jî bi vî awayî hatiye behiskirin:- Hêzeke zêde di tîrêjên ronahiyê de heye , pesna Agnî di nava kurdan de , rêzgirtine li agir di destpêka sala nû de ku yekem roja Newrozê dike. Newroz li ba

[46]h.b., r.611

kurdan cejnekî pir girînge. Agir li ba kurdên Yarsanî ji kurdên îslamî girîngtire û Yarsan agir li ser mezaran û li Cemxaneyan tê bikaranîn û li derdora wê kom dibin.

Têkiliya Çira bi Mîr Ehmed ve heye:

*Yar dîdekany mîr ehmed pîren ** Sahib çiraxe bewin bir dînen*[47]

Herwesa çêkirina şalan ji darê hinarê û girêdana pişta zarokan bi darê hinarê ku divê heftê û du girê be ku ew yek jî weke nîşanekê ye ji bo heftê û du Pîrên Yarsanan ku di Cemxaneyan de li hev kom dibin.

Qurbanîkirina Ga li ba Mîtrayan û li ba Yarsanan Mersume û di ola Zerdeştî de jî ji bo serketinê tê kirin. Yarsaniyên ku sewalên wan hene , pêwîste her sal di biharê de , sê rojan şîrê sewalan pêşkêş bikin bi vî awayî:-

Di destpêkê de şîr dikin mast û dew û rûnê wê jî bi arvan re tevlîhev dikin û jê nan çêdikin û pişt re pêşkêş dikin ku jêre dibêjin Sê Bere ku pêşkêşî xwedawendên baran û şînahiyê dikin û saleka pir baran û bereket dixwazin. Di Avestayê de jî xwedawend Anahîta ku xwedî û parêzvanê çem û avê ye pir girînge . Pîr Silêman jî di dewrana Berge Berge , benda 19an de dibêje:-

*Ne ew koy nahîd,... ** Bargey şam westen ne ew koy nahîd*

*Şam wêş dara bê ser çişmey omîd ** Çe ruş mewara pirşingi xorşîd*[48]

Di pirtûka Bondehiş de yekem derya Firax bi navê wî hatiye kirin û herweha çend deryayên din jî bi navê wî hene weke ( Îçest , Siwîr , Firizdan , Zerawend , Eswasit , Xosrew , Sidwîs û Orîş). Di nava Yarsan de jî gelek girîngî bi wî kesayetî hatiye dayîn ku weke Pîr Mûsa tê nasîn ku yek ji heft kesayetiyane û navê hejmarek çem û deryayan jî heye mînak:- Sîrwan , Nîl , Furat , Dîcle û navê hejmarek kaniyan weke Teşar , Xeslan , Anahîta û Zemzem.

Herwesa yek din ji pêdiviyên lidarxistina Cem , anîna du tasên avê ji bo Cemxanêye ku weke remzekê ye bo ava Xeslan û Anahîta tê temaşekirin û jêre dibêjin Çerîx. Ev du tasên avê bi vî awayî tê bikaranîn:- Pîştî xwendina dûaya Sihem ku dûaya sifreyê ye , xizmetkarê Cemxanê wan du avan tevlîhev dike û piştî gotina destpêk û

---

[47]Orşîdy,Cehangîr,Danişnamey Mezdîsna,Şabok,Tihran,1371,r37

[48]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610,612,613

dawiya Yar , di destpêkê de Seyîdê Cemxanê , her kesek qurtek av vedixwe û jêre şerbeta Cemxanê tê gotin ku hêza şîfayê ye.

Mijareke din jî pîrozkirina hejmarek çiyayane ku di ola Yarî û Zerdeştî de tê dîtin.

Di olsa Yarsan de navê heft çiyayê pîroz hene ku evin:- Şaho , Balamo , Serandîl , Şîndirwe , Dalaho , Bafte û Kêw. Di Avestayê de çiyayê herî pîroz elburze û Eborsîn jî li

Hindistanê ye. Herweha Qaf an î Kepîl , Oşdaştar Bûm , Ruşmend , Piştxwar , Rîwenid û Berfmend jî tên dîtin.

Çiyayê Qaf di ola Yarsan û Avestayê de weke çiyayekî efsaneyî tê nasîn. Di Avestayê de çiyayê herî bilinde û kes nikare bigihije cihê herî bilind yê çiya. Çiyayê Qaf cihê sîmorxe û beşeke ji çiyayê Elbûrz. Di Avestayê de navê Sîmorx weke Morxosîn tê ku tê wateya Teyrê Baz û jêre Warxen jî hatiye gotin û sembola serketiyê ye. Di hizra yarî de Pîr Mihemed Sîmorxe ku di dewreya Berge Berge benda 52an de dibêje:-

*Ew laney sîmur ** Bargey şam lwa ew laney sîmur*

*Sîmur rezbarî bê çenî zerde hur ** Zal destaniş awirid we her bûr*[49]

Wate: Sîmorx alîkarê Zal bavê Rostem bûye û di dema jidayikbûna Rostem li derdorê wî bûye.

Di çanda yarsan de , Xanima Remizbar mezhera Sîmorxe , Nîmet di kelama dewreya Baba Nawîs benda 53an de dibêje:-

*Xezan bê sîmorix na koy qaf dile ** Periş şefa bê pey zam û pile*[50]

Yek din ji teyrên ku di Avesta û serencamê de behsa wî hatiye kirin dikarin weke Torem were temaşe kirin. Di Avestayê weke Pirodrîş bi wateya Pêşbîn hatiye dîtin , di Avestayê d weke heykelê xwezayê tê nasîn ku bi vî awayî behsa wî tê kirin.

Zerdeşt ji Ahûra Mezda pirs kir:- Ey Ahûra Mezda , Ey hizra herî baş û paqij , kî nûnerê xwezaya paqij û bihêze , ew kes kiye ku guhdariya gotina xwedawend dike?

Ahûra Mazda got: Ew nûner Pirodrîşe , lewre ew teyr di berbanga sibê de gazî xelkê dike û dibêje:- xelkîno rabin , nimêja rastiyê bikin û nefretê li Dêwan bikin.

---

[49]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam*,Şabok,Tihran,1381,r.610,613,614
[50]h.b.,r.610,613,614

Di hizra Yarsan de Dîk weke Totem rêz lê tê girtin û tê qurbanîkirin. Her malek bi dirêjahiya salekê 8 caran dîkekî dike qurbanî ku hertim dîkek balixe û dikare dengê xwe bilind bike. Di wî barê de serencam dibêje:-

*Heram sere gaw helal sery er ** Erim xwrusa weytewer we exzer*

*Pa loqmey xwrus yaranim mo we sîr ** Dîde we xwrusim pa gaw cam niwîr*

*Ha peru baliş zera we zencîr ** Çey werbîm bîya ha çeny wayir*

*Mîriman ama pa biray emîr ** Çenî kele zer dem niyeniş tewfîr*

*Xwrusim neqda loqmey baqy wîr*[51]

Di wê gotinên Serencam de dîk û bizina kovî mêvandariya Baba Yadigar dikin , mînak yek hatine nasandin û amaje ye ji bo rûhên pak û dikarin serkeftî bin ji laşê dîk jî bo qurbanî bûn ji rêya Heq , ew teyr ji serdema Zolnûrî Qelender de mûcîze dike û bi tekîd ji ser heqaniyetê Zulnur dibe sedema serşoriyê dojminên wî. Ew bûyer ji kelamê Zulnur de bi wî awayî tê behskirin:

Zulnûr Qelender her tim ji alkiyê Waliyê wê demê ve rastî niheqî , girtin û gefxwarinê hatiye. Rojekê ku li Cemxanê dibe û bi hevalên xwe kombûne , Walî û artêşa wî bi ser wan de digirin û walî ji wî re dibêje an divê remz û rastiya rêbaza xwe eşkere bikî an jî dê hun werin kuştin. Zulnûr Qelender jî ji dîka ku hatiye serjêkirin û amadekirine ku bixwûn re dibêje" rabe û rastiya hizra min bêje , dîk jî radibe û bi dengek3ı bilind behsa rastiya Zulnûr dibêje. Di dema qonaxa Berzince jî behsa û behsa qurbaniya wî dikin ku bi çend navan tê behiskirin weke (Yoy , Keleşêr , Serwang û Exzer. Keywel dibêje: di serdema hikumeta Moxolan hinek ji karbidestan ku cêgirê xan bûn nawbangê wan Wang bû ku bi wateya Sultane.[52] Ji ber ku di kelemê Yarîde pir peyvên turkî hene mîna Çîçek , û hebûna Mexolan ji navçeyên ser bi ola Yarî dur niye , mebesit ji Serwanig , heman Sultan padîşahê teyrane e ku bang dide û dîk jî bi wateya teyrek dê ku ku serê wî dişibe sere şêr. Yek din ji teyrên ku di avestayê de bi başî navê wî derbas dibe , Bayeqoşe , di Avestayê de navê wî Eşwzwîşte û weke teyrekî pîroz hatiye nasîn. Di pirtûka Bondehîş te tê gotin ku beşek ji Avestayê zimanê Aşwzwşte ku dema ku ew teyr dixwîne , Dêw xwe vedişêrin. Sedema hebûna wan jî li cihên xerabe jî eve ku Dêw nekarin li wan cihan xwe veşêrin. Herwesa ew teyr nîşana gihiştin û hizr û bîre.

Di Serencamê de dewreya Baba Nawis Nîmer dibêje:

---

[51]h.b.,r.610,613,614

[52]Mowehêd,Mohemed Elî,*Sefernamihyê Êbnê Betûtêh*,Terhê No,Tihran,1378.r426

*Ez çenî ehmed ça xirawey xem  **  Biyanqoş bîman her du çenî he*[53]

Yek din ji olên ku li Kurdistanê derketiye ola Êzdiyane ku weke Şeytan perist , Tavperis , Yezîdê kurê muawiye û dasinî hatine nasandin.

Navê êzidî di zimanê Pehlewî de weke Yeztê hatiye binavkirin û Yezit navê kevnê wê bûye ku weke Yezdan jî hatiye gotin. Erebên Îslamî ku ji naveroka wê olê fêmnekirine peyv guhertine û kirine Yezît.

Seîd Aldeywecy nivîskarê ereb , dibêje ku çavkaniya îzedîsim Meinewiyete ku di qonaxa geşekirina Îslamê de , Îslamê bandorî lêkiriye û rengê Îslamê girtine. Ebdulrezaq Ebdolhosnînivîskarê ereb , dibêje Êzidiyan weke Zerdeştî binav dike ku pişt re musliman bûne. Piraniya pisporên kurdnasiyê kurdan weke Êzidî didin nasîn. Mesûd Mihemed nivîskarê kurid li ser bingeha peyva Îzed dibêje:- Bingeha wê peyvê Sansinkrîtî û Îraniye. Peyvên Yezne di Avestayê de û Yecete ya Sansikrîtî bi wateya perestinê tê. Ew peyv di farsî de bûye Yez û di kurdî de bûye Îzed û bi wî awayî tê wateya perestinê.[54]

Cemal Nebez jî dibêje- Bingeha peyvê Îraniye û kevne û peyva Îzed hema peyva Yezîte ku navê melyaketekê Zerdeştiyane ku Emşaspendane dibêje: Yezît di zimanê kurdî û farsî de guheriye û niha bi Yezdan tê xwandin. Bi nêrîna wî , Êzidî bi wateya perestina xwedê tê . Bingeha ola Êzidî ji olên Manî û Zerdeştî çêbûye. Bawerî bi xêr û şer , rêzgirtin li sewalan , sê rojan rojî girtin û baweriya bi Tenasox binegha sereke ya Êzidiyane. Du pirtûkên pîroz yên Êzidiyan hene (Cîlwe û Meshefa Reş). Ji civakê veşartîne. Weke bingeheke girîng dinêrîn pirtûka xwe. Di Meshefa reş de tê gotin ku xwedê beriya hertiştî Yaqotek sipî û teyrek b , navê Enxez avakiriye. Yaqota sipî hezara salan xiste ser pişta Enxez. Piştre di heft rojan de heft melyaket afirandin. Yekem melyaket jî îzraîle ku heman Tawusmeleke. Zatê Tawusmelek ji zatê xwedaye. Herwesa Şêx Odey Misafir û Tawusêmelek yekin. Piştî Tawusêmelek şeş melyaketên din hatine afirandin. Di ola Yarsan de jî heman tişt tê gotin. Ew yek jî tê xuyakirin ku Êzdî Yarî bûne û di dema şêx Hadî de bi sedemên cuda ji Yarsan dûr ketine. Îbnî Esîr di Terîxê Kemal de dibêje:- Di sala 2018ê de Cemaetekê ji xelkê Cîbal Kîfsan , Hemedan , Îsfîhan û Masbîhan ola Xorem qebûl kirin û pişt re li Hemedanê kombûn û baregeheka leşkerî avakirin.  Moitesem jî leşkerek bi ser wan de şand ku Îshaq Îbn Îbrahîm Mused fermandarê wê artêşê bû.  Şerek mezin li derdora Hemedan qewimî. Îshaq Şêst hezar kes ji wan kuşt û hinek ji wan reviyan. Di sala 219'ê koçî de cemaetekê ji Xorem dînan ku ji şer reviyabûn çûne Romê û koçberî Împratoryeta Tîwfîlî Konistantîn bûn.  Di wê demê

[53]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610,613,614

[54]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610,613,617

de kesên koçber li erdorê Kerkûk û mûsil û bakûrê Iraqê bicih bûn û pişt re êzedîsim ava kirin. Di metneka Sûranî de ku dîroka wê vediger bo sedsala şeşê deö behsa liv û

Tevgerekê de li bajarê Kirix , Bêt Silûk Kerkûka niha dike ku Mezdekiyan ava kirine. Behiskirina wê mijarê jî weke peywendiya Mezdek û Meinewiyetê tê nasîn[55] Hanîs Yuaxîm KilîmKaît di pirtûka Honera manoyî de dibêje:- sêyemîn lîjneya Mîsyona Meinewî bi serperiştiya AbdulEbzexiya di nav xaçperistên Kerkûkê peywendîdare[56].

Di pirtûka *Elmilel we'n-Nihel* de jî hatiye gotin ku Xorem Dînanin li navçeya Şarezûrê bicih bûne[57], Di wan salan de jî ku sedsala şeşê bûye ji aliyê Balûl Mahî ola Yarsan geşekiriye û dikarin bêjin di destpêka sedsala şeşê de şênîyên wê navçeyê hemû Yarsan bûne.

---

[55]Loskaya,Pîgo,N,Wer,Ênayet Olah Riza,*Şêrhayê Îran Der Rûzgarê Partiyan Û Sasaniyan*,Şabok,Tihran,1387,r397

[56]Hanis Yuaxîm Kilîm Kaît,Wer.Dr,Ebdolqasim Êsmaîl Pur,*Honerê Manoy,*Osturêh,Tehran,1384,r,38

[57]Mohemed Bin Ebdolkerîm Şehristany,*Elmilel U Elnehil,*Beyrut,Beyrut,1972,r 198

### 1.2. Yarsan-Kakey-Ehlê heq-Elî Îlahî

Li gorî cih û navçeyan , di dîrokê de çend navên cuda li bawermendên Yarsan hatiyekirin .mînak" Kakeyî , Ehlê Heq , Elî Îlahî , Qelxanî û Tifengçî" , lê di rastiyê de bi tenê çar navên wan hene , navên din navên navçeyên wan in.

**Yarsan:** Di Bingehê de ev nav Yarên Sane , lê kin kirine û bûye Yarsan.

1-Merdox , Sîsil Con Îdmoniz û Hadî Behmenî dibêjin ku qiralên Dewletên Sefewî ji Sultan Sehak re San gotine û îmandarên Sultan Sehaq jî weke rêzlêgirtinê jê re San Sehak gotine û navê îmandaran jî bûye Yarsan , wate Yarên San.

2- Hinek kes jî dibêjin peyva San ji peyva Şah ya Farsî hatiye yan jî ji Şêxê Erebî hatiye , pişt re bi dirêjahiya demê hatiye guhertin û bûye San.

Mamoste Mihemed Emîn Hewramî di pirtûka *Dîroka Hewaramanê* de dibêje"peyva San ji peyva Satrap ya Madî hatiye ku tê wateya (Hakîmê navçeyê , Mezinê navçeyê , Axayê navçeyi , Fermandarê navçeyê yan jî Karbidestê navçeyê"[58]

**Kakeyî:** Çend nêrînên cuda li ser peyva Kakeyî heye:

1- Dibêjin ku Şêx Mûsa û Şêx Îsayê Berzince ku herdu kurên Baba Elîyê Hemedanî bûne , piştî ku ji warê xwe koç dikin û diçin gundê Berzince , xwestine ku mizgefta Berzince restore bikin. Wê demê kurê Şêx Îsa ku San Sehake ku wê demê genc bûye li ber destê wan kar kiriye. Di dema kar de darek kin di destê wan de hebûye û Şêx îsa ji Şêx Mûsa re gotiye Kake kaş bike û bi wî awayî dar dirêj bûye. Hinek jî dibêjin San Sehak dema ku dîtiye bavê wî bi emrekî mezin mijûlî kar bûye û darê destê wî jî kin bû , çûye ser dîwar û ji birê xwe yê mezin re gotiye keko kaş bike , piştre dar bi xwe dirêj bûye û dilê bavê wî xweş bûye û bi wê sedemê jî ji alîgirên ola wan re gotinê (Kake yan Kako).[59]

2- Hinek kes jî dibêjin ku peywendiya Yarsan bi hevre zêde başe û her kes li ser baweriya wan bûye , weke birayê xwe hesibandine û lewre peyva kake yanî bira li hember hevdu bikaranîne.[60]

**Ehlê Heq:**Li gorî nêrîna wan hemû bîr û bawerî bidawî tên bi tenê baweriya wan nebe û baweriya wan nemire , ji ber ku mafdarin û gihiştine rastiya xwedaperistiyê û dibêjin kesayetiyên weke (Balûlî Mayî , Hisên Kurê Mensûrê Helac , Baba Tahirê

---

[58]Rostem,Eyûb,*Yarsan*,Melbendê Rewşenbîrîyê Hewreman,Hewlêr,2006,r.27,28,29

[59]h.b., r.27,28,29

[60]h.b., r.27,28,29

Hemedanî û Xwace Hafizê Şîrazî) û gelek kesayetiyên din ku tije ji hezkirina xwedê bûne , li ser ola wan bûne.[61]

**Elî Îlahî:**Elî Îlahî dibêjin ku xwedê mîna rih diçe nav laşê mirovan û dibêjin ku rihê xwedê ji laşê Îmamê Elî Kurê Ebu Talîbe û ji bo selimandina wê yekê jî mirov dikare helbesta (Sirî Mego) wate Gotinê Veşartî weke mînak nîşan bide:

*Le siry qodret haziry mewcud*

*Aftab sê newbet mekero sicûd*

*Qebaley mego , baveren veder*

*Tehqîq bizanen , her eîne heyder*

*We des ewen heyat û  memat*

*Aşkar mebo siry laheyat*

*Kelam kerid temam padişay ebrar*

*Ve girdy merdan , ve ehid û  îqrar*[62]

Kesên li ser rêbaza Elî Îlahî ne dibêjin "Îmamê Elî wefat nekiriye û rihê wî ji bo esman bilind bûye û çûye nav rojê de û heya ew emir neke roj naçike".[63]

[61]h.b., r.27,28,29
[62]h.b., r.27,28,29
[63]h.b., r.27,28,29

### 1.3. Felsefeya Yarsan

Emê li vê derê li ser çend bingeh û prensîbên felsefe û exlaqê Yarsantiyê bisekinin û binerin ka nêrna wan li gerdûn û li exlaq çiye. Belê lazime di vê mebestê de em pirtûkên pîroz yên wek Serencamê esas bigirin.

Bi rastî di Serencamê de behiskirina remz û nîşaneyan , yek ji bingehên zimanê gotarnivîsiyê ye ku tê wateya şirovekirina nûnertiya xwe.

Di rastiyê de rezm û nîşane tê wateya parastina metna xwe û rastî û hebûna wan tiştan temsîl dike ku li gorî hebûna xwe rastiyeke û hebûnê objektîv dike.

Zimanê gotarî di serencamê de , wênekariyeke rasteqîne daku mîntalyeta mirovahiyê zelal bike û baldikşîne ser mijarên derûnî û bi wateyeke din rastiya tiştên veşartî bi bi rêya remz û nîşaneyan ji me re şirove dike.

Di Serencamê de hebûnên ku hatine behiskirin , bi awayekî ebedî bi hemû wan tiştên ku remz û nîşaneyên veşartî yên cîhan û afirandinê ye , peywendiyîdare ku kesên derbarê wan tiştên veşartî de agehdariya wan nebe , ji bo wan tu wateyekê nade. Di rastiyê de ew hebûn neynikeke daku balbikşînin ser wan tiştên ku nayên dîtin. Bi nêrîna Serencam , awayekî lihevcûnane ku bi zimanê gotarî û nîşane hatine behiskirin û hemû tiştên ku di wê çarçoveyê de hatine behiskirin rasteqînin û dibe çavkaniyek ji bo xwendevanên rasteqîneyên xwe. Bi wê sedemê jî kesê ku wan remz û nîşaneyan liberçav negire metna Serencamê nayê fêmkirin. Di encamê de derdikeve holê ku Pirtûka Serencam bi remz û nîşaneyan zanista îrfanî û nihêniyên veşartî ji bo bawermendan zelal dike û wan di qalibekî remzî de nîşan dide û mirovan ber bi deryayekê dibe ku destpêka hejarî û gera mirovane daku bigihije rastiye. Yarsan di çarçoveya mirovahiyê de , tu carî xwe weke şêweyekî hizra zagonî nabîne daku azadiya xwe ji dest nede û naxwaze bibe dîlê hizrekê. Şêweya xebata Yarsan bo dîtina rêyekê ye daku desthilata xwe bi temamî li ser zagonan bicih bike. Di rastiyê de bikaranîna zaqon û yasayan bi awayekî moraliye û bi wê rêyê , gav ji bo gihiştin bo armanca xwe davêje.

Nivîskarê rûsiyê Korkonf di wê mijarê de dibêje:- Yasa gefxwarine li hember berjewendiyan û exlaq jî girîngîdane li hember berjewendiyan. Nepejirandina nebaşiyê di nava civaka Yarsan de pêdiviyeke bo avakirina peywendî û lihevnêzîkbûne. Ev peywendî jî weke pêdivîyekê di nava takên Yarsan de derketiye holê ku taybetmendiyên rewşên taybet yên weke cudahiya ziman û irf û edetan jî bandorî li ser wan nekiriye.

Berûvajo ola îslamê ku wan kesan weke dijber û nepaqij dizanin ku Şêx Emîr jî bi wî rengî dibêje

*Mêrdê azade rages berid ew ser ** Mêrdê na azad we yary ew we der*[64]

Ji cihekê din da dibêje:

*Eger ayîn wêt we xas mezanî  ** We olê kes bed nimewanî*[65]

Bingeha baweriya Yarî , rêz li mirovahiyê girtine û mirov dikare , xwedê nasîn û mirovên xwedayî ku bingeha hiza wê olê ye weke mînak nîşan bide.

*Des we dilî wêt bikere şere **  Her karê bede ane mekere*[66]

Şêx emîr dibêje:

*Her kes des we dil çeneş yar niyen **  Ne dukanî yar xewerdar niyen*[67]

Bawe Şemîs derbarê peywedniya mirovahiyê di gel ola Yarî de bi wî awayî şirove dike:-

*Yaranit ew hem naçan to himete ** Zalim newanê ew ray zilete*[68]

Ji cihekê din da dibêje:

*Her ke ne cem de bûnîş kidrete **  We kelemê heq neboş subete*

*Ew we hamqewliş  nenyo hormete ** Pala ro xwaran neboş mobete*

*Beşiş bor to neboy qodrete ** Birejiş we renig  jare û  mafeqe*[69]

Wate: Yar , hertim û di her rewşekê de , hizra nerast qebûl neke , bila tiştê nerast li ba we tunebe û peyva goman li ba we bê wate be , qonaxên dijwar derbas bike , bigehe qonaxekî ku rastî bi ser bikeve ji bo wê rastiyê jî bixebite.

Baba Nawis dibêje:

Ew yek mewîndê xeyanetê çem çe yaney yektir mebodê bê zem

Wate:Veşartina rastiya ola me , erka hemû yarekî ye û negotina remz û razan me ji ixanetê dûr dixîne.

---

[64] Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610,613,669

[65] h.b.,r.610,613,669

[66] Kelemê Dewreya Barge Barge,Benda15

[67] Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610,613,669

[68] Serencam,Dîvanê Baaba Nawis,Benda 57

[69] Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610,613,669

Pîr Necmedînê parisî jî dibêje:

*Cewzişan we desten serçişmey nîlê ** Yarî nekeran we fendu fîlê*[70]

Ev nêrîn jî nîşan dide ku pêwîste mirov nebaşiyê bi başiyê bersiv bide daku mirov derûna xwe perwerde bike û bigihije asteke bilind ya exlaqî , bi awayekî ku nebaşiyê bi başiyê û başiyê jî bi ronahiyê bersiv bide.

Li ser wê mijarê Şêx Emîn dibêje:

*Ew mewaço derid to baçe giyan ** Perê to sude perê ew ziyan*[71]

Helac Mîna ku weke nîşana yekbûnê tê nasîn dibêje:

Baş bizanin ku xwedê xwîna min ji bo we helal kiriye , min bikujin daku hun heqê xwe bidest bixin û ez jî bigihijim tubeyê. Li vê Cîhanê ji bo muslimanan ji kuştina min baştir tiştek tune ye.

Bi kurtasî mirov dikare bêje , Mirovahî û mirovperwerî , bingeha sereke ya ola Yarsane. Ev hizir di sedsala çar û pêncê ya koçî de hatiye avakirin û di dema Sultan Sehak de pir pêşketiye.

Sultan Sehak di derbarê vê mijarê de dibêje:

*Pey tuylê hezar direxit paçmê ** pey heq mewry tixim du dême*[72]

Herwesa Baba Teymûrê Banyaranî jî dibêje:

*Yaran mer ewsa teymur dilşad bo ** Azadî alem dadresy dad bo*[73]

Di wê olê de , hizra mirovperwerî û rêzgirtin li mirovan tê wateya exlaqek baş û gihiştin bi mertebeyeke bilind ya exlaqê mirovahiyê.

Di ola Yarî de Exlaq amûreke daku mirov bigihije asta heri bilind ya mirovperweryê , yekîtî û ji hevdu hezkirina nav bawermendên ola Yarsan jî nîşaneke ji bo rastiya vê gotinê. Ew yek jî mîraseke ku ji ola Mîraîsim ji bo me bicih maye. Di ola yarsan de çi kesek bigihije mertebeya şeşemîn ku jê re Mîhr Pûyayî tê gotin , êdî xwe weke kesek ji hiç neteweyekê nahesibîne û hest bi wê yekê dike ku peywendiya wî bi

[70]Serencam,Dewreya Barge Barge,Bend62

[71]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r610,613,670

[72]Dîwanê Abidîn,Benda,114

[73]Dîwanê Teymûrê Banyaranî,Destnivîs

Hemû mirovên cîhanê re heye û her derekî weke welatê xwe dibîne.[74] Bi vî awayî Yarsanek li gorî felsefeya donadin , di laşê xwe de û li welatê ku lê dijî , endamê neteweyek din be û di nava laşek û neteweyek û li welatekî din bijî û ji laşê berê xelkê cihekî din be.

Xelîfe Demyar derbarê wê hizrê de dibêje

*Ne cem ew zanoy yektir bidan hêz ** Ne pey baqy to bikeran axêz*[75]

Baba Nawis jî dibêje:

*We edeb we cem binîşdê bê xem ** Pey yek bikerdê desbary we hem*[76]

Bi wî awayî di ola Yarsan de bi tenê Cem cihek nîne ji bo kombûna Yaran , belku semboleke oliye ku hizra yekbûna yar û yaran têde tê dîtin û perde li ser çavên bawermendan hildigire û wan digehîne astekî ku sîmaya Yar di sûretê Yaran de dibînin û hizra ( Mirovê Xwedayî) li wir nîşan dide.

Pîr Ezîz Hodanî dibêje:

*We dîdarê yek bîmşan bişoran ** Mewlam medw kam bo dîde daran*[77]

Şêx Emîr dibêje:

*Min ke semedim ne çihrey yaren ** Ce aman liwan kawem çi Karen*[78]

Abiding dibêje:

*Mêrdan pişty biraî ,miwe be mu beste ** Dest û bîmyan be cemaly yektiry şoste*[79]

Herwesa Cem bi tenê cihek ji bo bicihanîna hizrên olî nine , belku bawerdarên wê olê di dema ku di mala cem de lihev kom dibin , nîqaşan derbarê çareserkirina pirsgirêkên cûda yên navxwe û derve dikin.[80] Bi wî awayî tevî nirxên olî , mala Cem li cem civakê jî pir girînge û cihê yekîtî û yekgirtina bawermendane.

Pî Binyamîn derbarê wê mijarê dibêje:

---

[74]Ehmedê Hamî,*Bexê Mihir,*Şabok,Tihran,1355,r88
[75]Dîwanê Baba Nawis,Benda54
[76]Dîwanê Baba Nawis,Benda54
[77]Kelamê Dewreya Barge Barge,Benda70
[78]Tayêb,Tahiri,Mêju felsefey Serencam,Şabok,Tihran,1381,r671
[79]Dîwanê Abidîn,Benda95
[80]Mînorisky,Sê Gogtarê Thqîqy Der Ayînê Ehlê Heq,Seha,Tihran,1378,r44

*Pulî ham dly , pulî ham dlî ** Bêdê binîşmê , pulî ham dlî*

*Oley zêlan biderîm cilê ** Çe cem hasil mo girdy muskily*[81]

Bawermendên ola Yarsan Yek xwedayî ( Wehdetiyet) di pir baweriyê (Kisret) de dibînin. Li gorî baweriya wan nûra xwedê di her tiştekî de heye , di heywan û xwezayê de jî heye. Mînak , tav di ola Yarî de pir pîroze.

Pîr Remizdar derbarê yekbûn û pir bawerî (Tiksir) re dibêje:

*Hezar yek xoda hezar yek pîren * xoda yekêwen pîr her yek pîren*[82]

Şêx Emîr jî dibêje:

*Her yar bê yawer binîşo we tak ** Yary bê yawer zu mebo helak*[83]

Bingeha baweriya dûrbûn ji Tek ku di ola Yarî de berbiçave , di sedsala heftem ya koçî de bi armanca parastina civaka Yarî û dûrketin ji xwe bi mezin zanî li hember bawermendan ji aliyê Sultan Sehak ve hatiye bicih kirin.

Sultan Sehak dibêje:

*Arim pey xidmet niya çey deme ** Ezîş yuwenan çey yarî reme*[84]

Sedema tekîdkirin li ser wê nêrînê eve ku pêwîste taken civakê werin parastin û xwe jî li hember hevdu mezin nekin. Herwesa baweriya Yarsan bi neqediyanê tê ku yek ji xalên girînge û sedema wê jî eve ku mirov timî nû bibe , pêş bikeve û paşve gav neavêje. Di rastiyê de ew hizir li ser bingeha xwe rizgarkirin ji hizrên xorafî û paşketî hatiye avakirin. Hêz û desthilat dikare bibe sedemek ku tak ji rêbazê dûr bikeve û xwe mezintir bibîne û xwe ji bîr bike , bi wê baweriyê jî tak tê kontrolkirin û nahêle ji rê derkeve û di çarçoveyeka mirovahiyê de dimîne. Bi wê sedemê ger mirov xwe control neke wê berjewendiyên xwe li ser civakê bibîne û hizra xwe bi ser civakê re biçespîne ew yek jî weke mezintirin û tirsinaktirîn dujminê Yar û Yarsan tê zanîn.

Sultan Sehak li ser rastiya tak dibêje:

*Zor beriz bê w kolift udu çinary ** lazime deybirin  ew be mişary*[85]

---

[81]Dewreya Qewiltas,Benda8.
[82]Serencam,Kelamê Dewreya Heften,Benda 22
[83]Tayêb,Tahiri,Mêju felsefey Serencam,Şabok,Tihran,1381,r672
[84]h.b.,r.672
[85]Serencam,Dîwanê Abidîn,Benda130

Yek din ji taybetmendiyên ola Yarî eve ku mirov dikare şert û mercên wê olê bicih bîne an jî bi wateyeke din li gorî wê olê tevbigere an jî tevnegere. Di wê olê de tê bawerkirin ku pêşketina olê bi zorê nabe û pêwîste her kes bi razîbûn û bi xweşî û zanatî olê qebûl bike.

Derbarê wê mijarê de Baba Nawîs dibêje:

*Ragew radary we zor neranan ** Yary nekeran pa qehr û qaran*[86]

Şêx Emîr dibêje:

*Yary ceneten azad nedaro ** Kesy we kesy kary nedaro*[87]

Pîr Ehmed dibêje:

*Yaran nekeran yary we zury ** Xasen xolaman rejyan çe nury*[88]

Nêrîna (Ser Sêportêgî) wate qurbanî kirin û xwe tevandin li hember rastiyê , ji bo her takekî Yarî pêwîstiyeke oliya girînge. Pêwîste hemû yarî wê yekê pêk bînin. Li gorî wê yekê pêwîst baweriya her Yarekî bi Pîr û Delîlek hebe. Bi wî awayî tevahiya Yar , weke zîncîrekî bi hev ve tên girêdan. Takek Yarî xwedî kîjan pile û payeyek be , pêwîste Pîr û Delîlek wî hebe. Mînak Sultan Sehak jî weke adetek Yarî , payeyên rêbaza Ser Sêportêgî bicih anîye.

Şêx Emîr derbarê peywendiya Pîr û Murîdan dibêje:

*Pîr û taliby perwanew şemen ** Desy yek bosan xake w pay hemen*[89]

Sultan Sehak jî dibêje:

*Be kelam nerim ken sery asnîny ** Bo mîtan bêjin wekw ya yasînê*[90]

Pîr Rostem dibêje:

*Yarî we kelam cay gift û guwen ** Weşa pa kese we yarîşxuwen*[91]

---

[86] Dîwanê Baba Nawis,Benda36

[87] Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r673

[88] h.b., r.673

[89] h.b., r.673

[90] Dîwanê Abidîn,Benda138

[91] Kelamê Dewreya Barge Barge,Benda72

### 1.4. Çand û Edetên Yarsan

Yarsan jî weke cûreyek din ji pêkhateya neteweya kurdan , çanda xwe bi başî parastine û ew yek jî bi rêya ola xwe kirine. Di mijara helal û heramiyê de , her çi qas jî gelek lêkolînên biyanî yên taybet jî hatibe kirin û gelek gotinên nerewa jî li hember Yarsan hatine bikaranîn jî , lê heman tiştên ku li cem mezheba Şî'eya Îslamê heramin , li cem Yarsan jî heramin. Mirov dikare bêje , ji Şî'eyan zêdetir jî , Yarsan di hinek mijaran de hişiktirim. Mînak " Gotin û xwarinên ku li cem Yarsan heramin , bi tenê girêdayî kelama serencamê nîne , belku her tiştê ku bandoreka nerênî li ser Ruh û hizra mirovan bike , hemarme û divê Yarsan xwe jê dûr bigirin. Şêx Emîr derbarê wê mijarê de dibêje:

*Zaîl kerê ruh pey mêrid heramin*[92]

Ev beyta Şêx Emîr hemû wan tiştan heram dike ku dibin sedema cezakirin , ezyetdan û serşorî ji bo takek Yarsaniyan. Têkiliya vê gotinê bi take kesan ve heye , bi awayekî ku hinek caran mirov bi derewek biçûk dil û derûnê xwe nebaş dike û ew yek jî li cem yarsan herame.

Di Ola Yarsan de , jin ji bilî taybetmendiyên fizîkî , wekhevin û ferq û cudahî dinavbera wan de tuneye. Ew taybetmendî jî di dema parvekirina mîrata malbatê , pêkanîna jiyana hevjîninê û ji hev veqetiyane biawayekî berçav tê xuyakirin. Elbet di nava Yarsan de hinek kes hene ku bi awayekî nizimtir li jinan dinêrin û mafê jinan sînordar dikin. Mehmûd Efendî Bayezîdî di derbarê pile û payeya jinan di nava civaka kurdî de dibêje: Jin ji mêran nerazînîne , jin û keç serbestin , xwe venaşêrin û weke jinên Fransayê bi temamî serbestin.[93] Di derbarê wê mijarê de Mînorisky dibêje: Bêgoman di nava kurdan de jin xwedî kesayetiyek girînge. Hinek caran zarok bi navê dayikên wan tên bang kirin.[94] Li ser wê bingehê jî mirov dikare bêje jin li cem Yarsan xwedî taybetmendiyekê ye. Mirov dikare xwîşka Mensûrê Helac weke mînak di nava jinên Yarsan de nîşan bideku dibêjin" Jineka pirxweşik û rind bû ku xwe weke mêr binav dikir , hatinûçûna Bexdayê dikir , nîvê rûyê xwe vedişêrî û nîvêdin li derve bû. Mêrek jê re dibêje tu çima rûyê xwe bi temamî venaşêrî? Ew jî dibêje , tu mêrêk nîşan min bide daku rûyê xwe bi temamî veşêrim.[95]

Sultan Sehak jî li ser wekheviya jin û mêran dibêje:

*Kinaçêw korê Tewfîrşan niyen kinaçew korê*

*Beş Sultanen ezel hewery ** Xatune dayrak êy beşiş xiry*

---

[92]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r744
[93]Mehmud Efendy Bayzîdy,*Adab u Rosumê KUrdha,*1368,Kitabxanihyê Merkezy,Tehran,1368,r85
[94]Mînorisky,*Kurd*,Şabok,Tehran,1973,r76
[95]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381, r745, 746

*Poşak yary ew balaş biry ** Biya we dayan puran hory*

*Her kesy baçw kinaçê û  kurê ** Meweziş we dem mewday keîbry*[96]

Di ola Yarsan de jin weke bingeha hebûnê tê temaşekirin. Hebûnek ku sedema lêkolînêye û ew yek jî rê dide ku di ola Yarsan de jin we Remzbar bê bang kirin.

Telaq(Ji hevdu veqetyan)di nêrîna Yarî de li gorî 3 şertan dibe. Îxanet û şikandina soz û peymana navbera jin û mêran. Mirina jin an mêr. Çênebûna zarokan ji aliyê herdu aliyan ve. Nebaşiya rewşa debara mêr ku wê demê jin dikare veqete û bi yek din re bizewice. Pir jinî ji li cem Yarsan nayê pejirandin û nabe jinek an mêrek Yarî bi kesek din ji olek din r bizewice û ew yek jî tê wateya derketin ji kerwanê Yaran. Lê belê eşkereye ku ola yarsan weke piroseseke baş tê zanîn û şîret li ciwanan tê kirin ku bizewicin.

Zewac û mehrkirin di nava bawermendên ola Yarsan de li gorî rê û resmeke taybet tê kirin. Di dema mehirkirina du kesan de dûayên taybet tên xwendin ku di Serencamê de hene û çend xalên giringê têde ye weke çawaniya tevgeriyana jin û mêran. Ew dûa jî di demekî de tê xwandin ku  keçik li pişt perdeyekî  ye û Pîrek wê dûayê dixwîne.

Yek din ji rê û resmên berçav yên civaka Yarsan  dûaya biratiyê ye ku bandoreka wê dûayê pir girînge bo yekgirtina civak û bawermendên ola yarsan.

Yek din ji adetên pir girîng û pîroz jî pêkanîn û tevlîbûna di civînên mala Cem de ye.

Pêwîste kesên ku di civîna mala Cem de amade dibin , laşê wan û dilê wan paqij be , ji ber ku payeyeke herî giring û pîroz jî di nava ola Yarsan de paqijî ye.

Bawerdarên ku tevlî civînên mala Cem dibin pêwîste qurbaniyê bidin û Sersîpurdeya plê be. Herweha divê simbêlên xwe kin neke , bi malbatek Seyîd re nezewicîbe û şûtik girê bide û kilawek taybet serê xwe deyne. Dema derbasî mala Cem dibin divê xwe bitewîne û ji aliyê rastê ve destê wan kesên maç bikin ku di mala Cem de rûniştine û li ser herdu çokan li cihê xwe rûnin.

Pîr Binyamîn dibêje:

*Emir xwacaman biwan gerden lar **  Du koney zanu bigirdê qerar*

*Hem ser hem kemer biwesan we zar **  Çi zêl binalan çi perwerdigar*[97]

---

[96]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r745, 746

Di ola yarsan de ji bo sifreya giştî pêwîste niyetek an jî qurbaniyek were kirin ku çend awayên niyet û qurbanî heye ku evin:-

1-Xizmet ku di salekê de heyşt caran hatiye ferz kirin û bi wî awayî pêwîste berûşek birinc û çareke kîloyek rûnê kurdî , dîkek û berûşek nan were pêşkêşkirin û niyet jî were gotin.

2-Niyet ku pêwîste nebat , mêwîj , şîlan , lîmo , hingiv , xorme , hinar , tirî , bîyok , zeytûn , badem , findiq , pirteqal , sêva zer ya sor werin pêşkêş kirin.

3- Şukir kirin weke sipasî qedirnîşandan bo ku bigihijin hêviyên xwe.

4- pêşkêşkirina tiştên weke kondir , şekir , badem , xwê , nan , birinc , rûn.

5- Pêşkêşkirina wan tiştên ku weke qurbanî tên hesibandin weke masî , gûz , hinar.

6- Tiştên ku weke qurbanî tên qebûl kirin evin:- ga , hiştir , pez , pez kovî ku pêwîste nêr bin û çi kêmasiyek di wan de nebe û nexweş nebin. Pêwîste emrê (temenê) dîk ji şeş mehan kêmtir û yê heywanên din jî ji salekê kêmtir be.

Qurbanîkirin bi vî awayî dibe:- Seyîdek kamil , kêra xwe bi dûayek taybet pîroz dike û serê qurbanî jê dike û endamên ku heram kirine cûda dike û li cihekî vedişêre. Mêjiyê qurbanî jî dixin nav perçe qumaşek sipî û di dawiya mala Cem de di nav axê de vedişêrin. Xizmetkarê mala Cem jî avê tîne û destê kesên nav Cemxanê de dişwe û pişt re sufreyê datîne û dûayan dixwîne û qurbanî yan murada xwe pîroz dikin. Lê belê mirov divê ji bîr neke dûayên Yarsan li gorî ziman û navçeyên ku têde dijîn hinek cudahiyan wan heye .

Yek ji irf û adetên din yên Yarî , şikandina gûz û sersipordebûne ku bi wateya teslîm bûn li hember çareseriya ku hatiye danan tê. Malbatek yarsanî ku zarokê wan çêdibe , pêwîste sîrmoniyaya sersêportêgî bicih bîne , daku zarokê wan jî tevlî yarsan bibe. Pêwîstiyên rê û resma sîmoniyê jî evin:-

Anîna Pîr û Delîl daku bê zanîn malbat û bavê zarok sersipordene.

Kitek gûza sax

Perçe qumaşek sipî ku pehnî û dirêjahiya wê kêmtir ji metreyekê be.

Niyaz ku hinek nebate.

---

[97]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r746, 747

Qurbaniyek kedî ku piranî dikek balixe

Hinek pereyê wî welatî

Sikeya mihemedî ku li ba Pîr hey

Kêrek ji bo birîn û kûrkirina serê gûz

Defter ji bo xwandina dûaya gûzê û birina wê ji bo cihê sîrmoniya , weke nîşanekê ji bo deftera Pîr Mûsa

Şîrînahiya Remizbar[98]

Piştî amadekirina wan tiştan , bawermend û delîl li mala Cem kom dibin û eger ji ber her sedemekî kesek neyê divê nûnerê wî biçe Cemxanê û piştre li hev kom dibin û bavê zarok li ber derî rûdinê û eger temenê zarok kêmtir ji 40 rojan be wekîlekî ji bo wî hildibijêrin ku sîmoniya bicih bîne paşan pîr dûayê gûzê dixwîne ku bi wî cureyî û ji valahiyê navê van kesan dibêje:

Hezret Xawendgar , Şehsiwarê Pirdîwer , Sultan Salar , Cewiz ser..... ke bi xwe yan jî wekîlê ew.....ji cem de hazîre bi şahidiyê cem û cemnişîn , zemîn û asîman , lyl û nehar , lewih û qelem , eriş û kursî , Pîr Ezel Hezretê Binyamîn , Pîr Texit û Pêşwayê Batinî , Pîr Îrşad û Zahîr , Delîlê Ezelî yarê Dawûd , Kew Siwar wekîlê dawûd , Desitgîrê Batiniş , Delîl Zahîriş...... bigehe wekîlê zahîr........ hazîr ji cem bi şert û îqrarê yaran ji merno ji qewil û bihên yaran ji şindirwê , ji wî cemê tîx li ba keîbir û zoleqar , boşqab bi niyetê sacnar , cewîz bi niyetê binyamîn , sîke bi niyetê dawûd , kelam û biyazê yarî bi niyetê pîr mûsa , girde bi îşqê remizbar , qurbanî bi yadê ehmed ehmed nazdar we cihê serê yar , nebat bi niyabetê tavê ji peyrewê ol ûşerit û îqrarê heqîqet , qible pirdîwer , xwedê Sultan sehak , ji rîzê xanidan...... ho ewel û axîr yar.[99]

### 1.5. Bingeha Ola Yarsan

Tiştekî eşkereye ku her olek li ser erdê hebe bingeha xwe ji hinek nêrînan werdigire weke ( avabûna cîhanê , ruh , îlahiyet û mirov û peywendiya wê bi xwedê re û Yarsan jî di derbara wan mijaran de xwedî nêrînên cuda ne. Ev mijar û hejmarek mijarên din jî di Tekist û pirtûkên wan de hatine weşandin û behiskirin.

#### 1.5.1. Nêrîna Wan liÇawaniya Avabûna Cîhanê

Yarsanî dibêjin di destpêkê de tu tiştek tunebûye , (Mewla , Îmamê Elî) di nava deryayê de bûye û di nava deryayê de derketiye û cîhan çêkiriye û navê xwe kiriye

[98]Tayêb,Tahiri,*Mêju felsefey Serencam,*Şabok,Tihran,1381,r751, 752
[99]h.b., r.r751, 752

(Xwedawend) û erş çêkiriye û 72 hezar salan li kêleka deryayê bi tenê bûye , piştre Cibraîl çêkiriye daku pêre bide û pistîne. Piştre melyaketên din yên weke , (Îzraîl , Mîkaîl û Îsrafîl) çêkirine , dema xwestiye mirovan çêbike fermandaye melyaketan , axê ji wî re bînin , Îzraîl ax aniye û kiriye hevîr û qalibên ji cûreya laşê Mewla Elîçêkiriye û xwedawend ji laşê Mewla Elî xwe derxistiye holê û melyaketan jî xwe li hember wî tevandine ku ev helbest jî nîşana wê nêrînê ye:-

*Hefit duney beyan bowaçan pêtan*

*Tehqîq bizanan melum bo lêtan*

*Ewsa ne lew by , ne ariya by*

*Ne eriş by ne feriş , cîhan derya by*

*Ve dor ber ama , cîhan kerid mehya*

*Navê vêş niya , ve xavenigar*

*Eriş û qoriş û feriş , ewsa da qerar*

*Heftad hezar sal tak û tenya ferid*

*Ne ruy delyawe çogan bazy kerid*

*Ne xakî bîsat saza cîbraîl*

*Ta bî ve hemraz xaliqî celîl*

*Evel îcad kerid çwar melek her çwar*

*Asiman zemîn ewsa da qerar*[100]

*Wate:-*

*Heft don dê werin daku ji we re bêjin*

*Ji rastiyê agehdar bin û ji we re eşkere be*

*Ne Lewih hebû ne jî ariya jî hebû*

*Asiman û erd tunebî , cîhan hemû derya bû*

*Mewla ji deryayê derket*

---

[100]Rostem,Eyûb,*Yarsan*,Melbendê Rewşenbîrîyê Hewreman,Hewlêr,2006,r81

*Mercan derket û cihan çêkir*

*Navê xwe kir xwedawend*

*Erş û qorş û ferş çêkir*

*Heftê hezar salan bi tenê ma*

*Li ser deryayê lîstika çogan dikir*

*Cibraîl ji axê çêkir*

*Daku bi tenê nebe*

*Pişt re çar melyaket çêkirin*

*Pişt re esman û erd çêkir*

### 1.5.2. Nêrîna Wan liJiyanê

Bi nêrîna Yarsanan bi dirêjahiya jiyana mirovan , xwedê heft caran diçe nav laşê miorvan û hercarek jî melyaket bi wî re ne , hemû demekî heman firîştene , lê her car navê wan tê guhertin , bi awayekî ruh nayê guhertin bi tenê laş tê guhertin û mînak:- melyaket wê demê van navan werdigirn

Di dewreya jiyan de(Melek amîn)

Di dewreya xawendigar de(Hezretê Cobreîl)

Di dewreya hezretê(Elî kurê Ebî talin) de(Selmanê Farisî)

Di dewreya(Balul mahî)de(Bav lorey lorîstani)

Di dewreya(Bava Serheng)de(Bave Qeyserê Hewramî)

Di dewreya(Şaxoşîn) de(Kakareday)

Di dewreya (San Sehak)de(Pîr Binyamîn-Pîr Xidrê Şaho)[101]

Li ser wî mijarê li ba Yarsanan (Hazretê Mohemed)yekek ji wan melyaketan bûye ku ligel(Elî kurê Ebî Talîb)de hatiye.[102]

---

[101]Rostem,Eyûb,*Yarsan*,Melbendê Rewşenbîrîyê Hewreman,Hewlêr,2006,r82
[102]h.b., r.82

### 1.5.3. Donandin

Di baweriya Yarsan de dema mirov dimire ruh ji laş cuda dibe , her ruhek hezar û yek laş diguherîne , pişt re diçe cîhana (Cawîdanîn- Cîhana nemirî) û ji wê re dibêjin (Donadona ruhê) û li cem wan çar cûreyên ruhê hene ku evin:- (Nesix , ji mirov ji bo mirov) , (Mesix , ji bo nav laşê candaran) , (Resix , ji bo nan giyah) , (Fesix , ji bo nav candarên weke mîna mar û dupişik). Dibêjin mirin weke Werdekekî ye ku xwe di nava avê de niqo dike û li cihekî din serê xwe derdixîne ku baweriya wan û Hindoyan wek heve. Çend sirûd û helbest jî derbarê Donadinê heye , mînak Şaxoşan dibêje:-

*Mamam celalê kakam rengîne*

*Don we don amam çine we çîne*

*Ha êsta yorit û namim xoşîne*

*Her kes bişnasom pakiş mew kîne*[103]

Wate:- Navê diya min (Celale) û navê birê min (Rengîne) , ruhê min di nav çend laşan de guheriye û niha jî di nav vî laşî de me û navê min Şaxoşîne , her kesek jî min bi rastî nas bike tu kîn û nefret didilê wî de namîne.

### 1.5.4. Gerdîleya Xweda

Di baweriya Yarsan de her mirovek xwedî gerdîleyeka xwedaye , ew gerdîle jî di nava mirovên oldar û qenc de zêde û geş dibin û di nava mirovên nebaş de jî jinav diçin. Ji ber wê yekê ye ku Donandina ruh di her laşekî de cudaye û eger kesek oldar û qenc be ruhê wî diçe nav laşê kesekî baştir û eger jî kesek nebaş be ruhê wî wê biçe nav laşekî de ku hertim nexweşiyê dibîne. Ji ber wê yekê ye ku dibêjin ruh di nava hezar û yek laşan de digere. Di pirtoka Serencam de tê gotin ku hezar û yek laş tê wateya jiyana hertimî. Mînak , (Bawa Qeyserê Hewramy) dibêje:

*Gonay bê şimar gonay bê şimar*

*Qeysere nanê gonay bê şimar*

*Gewrem serhenga yurtşen hezar*

*Çenî hezare biyam we şabad*[104]

wate:

---

[103]h.b., r.82

[104]Rostem,Eyûb,*Yarsan*,Melbendê Rewşenbîrîyê Hewreman,Hewlêr,2006,r84

Navê min Qeysere û pir gunehên min hene ku nayên hejmardin , (Bawa Serhenig) mezinê mine û ruhê wî aniha di laşê hezarê de ye , ruhê min jî bi wî re diçe dinyayê nemirî yê.

### 1.5.5. Rôjî û Nimêj

Yarsan di salekê de 3 rojan rojiyê digirin û pişt re dikin cejn , xwarina cejinê jî taybete (Goştê dîkê kelandî , Birinc û Şîrînahî). Xwarina cejnê li ba Yarsanan heman xwarine ku (San Sehak) piştê serketina xwe bi ser artêşa (Çîçek) xwariye , (Leşkirên Çîçek-leşkirê birayên wî bûn ku di şikeftekê de êrîşî wî kirine û xwestine wî bikujin ku ew leşker li ba Yarsanan weke leşkerê kofar hatiye binav kirin.

Ew jî mînakek ji wê baweriyê:-

*Ney çilew zimsan ney çilew zimsan*

*Dawud roçeşan ney çilew zimsan*

*Niyetşan ney çarde mangê bo îhsan*

*Ce hevdew mangê gîrya çep destan*[105]

Li ser nimîjkirinê jî Yarsan nimêjê nakin û dibêjin: Me niyazîn nek nemazî. Wate , em dûa û laweyan dikin ne ku nimêjan.[106]

### 1.5.6. Cem

Cem peyveke Avestayî ye ku tê wateya kombûnê , li Şarezûr û Hewraman jî bi wê wateyê tê bikaranîn , mînak dibêjin hemû cemin , wate hemû kombûne. Cem li ba Yarsan pir pîroze û bi armanca bicihanîna erkên olî li hev kom dibin û cem girê didin. Cem ku bi wateya cihê kombûnê yan kombûn bi xwe tê di nava pirtûk û şîretên yarsan de cihekî pir girîng dibîne. Mînak di dema telqîna miriyan de jî behsa mala Cem tê kirin bi vî rengî:-

*Qîbley yarane qîbley yarane*

*Cem kebey şerîf qîblay yarane*

*Cem xezeb bexşan rehmet varane*

*Cem yorit kirdar niyaz darane*

---

[105]h.b., r.84
[106]h.b., r.84

*Cem yenî mescîd yary yaranen*

*Cem helî moşkîl  metlebdirane*[107]

*Wate:*

*Qiblêhyê yarane qiblêhyê yarane*

*Cem ku mîna kebê pîroze , qibleya yaran e*

*Cem cihê başî û tijeye ji rehmet*

*Cem cihê bi cihanîna hêvîdarane*

*Cem mizgeft û cihê yarane*

*Cem cihê çareseriya pirsgirêkane*

Herweha di helbesta telqîna miriyan de ev tişt jî tê gotin:

*Penageş heybet cem rasanen*

*Cem mekanî heq ragey xasanen*

*Wate:*

*Cem li pişta kesên rast e*

*Cem cihê heq û cihê kesên başe*[108]

(Sultan Sehakê Berzencî)li ser (Cem)gotiye , cihê yarên paqije , her kesek li cem li ba Sultan be di roja axiretê de yek ji yarên herî başe. (Sultan dibêje):

*Her kes ne cem da ne bîro erkan*

*We rasit bigêro damanê Sultan*

*Ane heqîqet mêrid yariyen*

*Ce rojê hisaw we diyarîyen*[109]

[107] h.b., r.85
[108] h.b., r.85-86
[109] h.b., r.85-86

*Wate:*

*Her kes ku di cem de erkan ji bîr neke*

*Bi rastî guhdarî erk û şîretên Sultan be*

*Ew kes mêrê rastiyê ye*

*Di roja hîsabê de wê serbilind be*

Yekem (Cem) li ba Yarsanan cemêk bûye ku (SultanSehak) li Perdîwer çê kiriye , bi baweriye hemû Yarsanan jî her cemek wekî heman cema (SultanSehak)e.

#### 1.5.7. Qurbanî

Ji bo rizgarbûn ji êş û nexweşiyan û bidestanîna berhemên baş , sewalek ku emrê wî ji şeş mehan kêmtir nebe û sax û tendrûst be bi dilek paqij dikin qurbanî ku di mala Cem de tê çêkirin. Mînak helbestek li ser heye ku dibêje:-

*Dostan qurbanî dostan qurbanî*

*Biwaçe adab ayey qurbanî*

*Temam teyar keîm cemî Sultanî*

*Qewil rozy ezel şahî merdanî*[110]

*Wate:*

*Hevalên me qurbanî bikin*

*helbesta qurbaniyê bibêjin*

*Heya ku Cema Sultan kamîl be*

*Soz roja axîretê Sultan agehdarê me ye*

#### 1.5.8. Simbêlberdan

Zilamên Yarî simbêlên xwe dirêj dikin û çend nêrînek li ser wê yekê hene mînak:

Hinek kes dibêjin ew sê derwêşên ku di şikefta (Newê) Sultan parastine û li hember artêşa (Çîçek)şer kirine ,rîh , simbêl û porê wan dirêj bûye , dibêjin ew derwêş ji dinyayê veşartî ji bo alîkariya (Sultan Sehak) hatine.

---

[110]h.b., r.86

Hineka din dibêjin:Di dema Sefewiya de hîn bûne , lewra Yarsan alîkarê Sefewiyan bûne û simbêlên (Şah Êsmaîlê Sefewî) dirêj bûye.

(Girid liviskî)ji li ser wê mijarê dibêje: Dema ku payxember(s)wefat kiriye (Elî kurê Ebû Talîb) ew şuşt û av di nav navika wî de kom bûye û (Elî) xwestiye ku wê avê vexwe , rîh û simbêlên wî şil bûne û pêştê wê rîh ûsimbêlên xwe dirêj kiriye. Baweriya Qizilbaşan jî bi wê gotinê heye û wesa difikrin ku her kitek ji rih û simbêlên wî melyaketekê xwe pê ve kiriye.[111]

### 1.5.9. Sersipardin

Çêkirina peywendiya navbera kesekî Yarî û du pêşengên olî ye. Ew peywendî du beşin. Yek Pîr û yek jî Delîle. Mînak: San Sehak , Pîr Binyamîn û Xidrê Şaho û delîl jî weke Dawûd ji xwe re qebûl kiriye. Rê û resma sersipardin bi vî awayî ye:- Dîkek ku emrê wî ji şeş mehan kemtir nebe , nîv berûş birinc , hinek runê sewalan bi niyetê San Sehak , Gûzek bi niyetê Pîr Binyamîn , du perdaxên mazin av bi niyetê ava kewser , lempeyek bi niyetê Dawûd , kêr bi niyetê Mustefa Dewdanî , Şîranî bi niyetê Şah Îbrahîm , Lîreyek bi niyetê Seîd Muhemedê Mezin Siwar. Dîk û  birinc çê dikin ji cem xane de Pîr û  Ddelîl jî amade dibin û ser sipardin bi cî dînin. Wê demê zewac di navbera jinên malbata Pîr û bawermend de namîne û weke kurê xwe lêdinêre . San Sehak jî bi awayekî pir girîng behsa wê pirosesê dike ku eve:-

*Gavê bê gavan bê gavê gavê*

*Ta ser nesparîn kerde ve lavê*

*Her serê ne lewh ew huzurî cem*

*Ne swcde ve desit xalîfe xadem*

*Bê şik ew sere ve tomar niyen*

*Ne rojî hîsab ve şomar niyen*

*Tomar pîr musa qelem baqîyen*[112]

*Wate:*

*Heya yar ser sîporde nebin mîna gayê bê gawan in*

*Heya yar ser sîporde nebin aram nabin*

---

[111]h.b., r.86
[112]h.b., r.87

*Her Yarsanek naçe nav(Cem)*

*U ji aliyê xalîfe ve xadem de nabe*

*Bê goman naw ew kes tomar nabe*

*Di rojê hîsab ji Yarsanan nayêt hîsab kirin*

*Navê wî di deftera Pîr Musa ku her dem baqiye nayê nivîsandin*

### 1.5.10. Parastina tiştên veşartî di nava olê de

Bi giştî pêwîste bawermendên Yarî tiştên veşartiyên xwe eşkere nekin , ew jî sedemeke ku nabe biçûktirin tiştên nava ola xwe ji kesî re bêjin. Li ser negotina tiştên veşartî Sultan Sehak dibêje:

*Raz nekeran faş raz nekeran faş*

*Hana ey yaran raz nekeran faş*

*Ê waçe we remiz waçen perê taş*

*Neka Serencam pixte bin ne daş*[113]

*Wate:*

*Tiştên veşartî belav nekin*

*Agehdar bin yaran , sirên xwe biparêzin*

*Pêwîste hîkmetê ji hemû yarên xwe re bêjin*

*Daku di paşerojê de di nava agir de neşewitin*

### 1.5.11. Dema Razanê

Her bawermendek pêwîste di dema razanê de eger tiştên nebaş kiribe tobeyê bike û bibêje:

*Ewelim yar axirim yar îşaretê pîr padîşa*

*Ewelim yar axirim yar Dawud ko siwar*

[113]h.b., r.88

### 1.5.12. Pênc Rêberên Olî Yên Mezin Yên Yarsan

Gelek rêberên olî yên Yarsan hene , lê pênc ji wan pir mezinin û bi nêrîna Yarsan ruhê Xwedê di nava wan de bicih bûye. Wan kesayetiyan bandoreke zêde li ser ola Yarsan di demên cuda de kirine ku navê wan jîevin:-

1- Balulî May-Balul Mahî

2- Bawa Serhengê Dewdanî

3- Şaxoşînê Lorîstanî - Mobarek Şa

4- Bawe Nusî Caf - Bawe Nausî Sergetey

5- San Sehakê Berzenceî - Sultan Îshaqê Berzincî

Li vir em dê behsa dîroka jiyan û kar û xebat û berhemên wan kesayetiyan bikin.,

### 1.5.13. Balûlî May

Di pirtoka pîroza Serencam de tê gotin ku kesê yekem ku ola Yarsan belav kiriye , Emîr Kurê Leheb bûye û di navenda sedsala duyê ya koçî de hatiye dinê. Di jiyana xwe de hertim hewla bidestxistina zanist û îrfanyetê daye û pişt re xebitiye daku olekê biafirîne ku taybetmendiyên olên din jî di nav de cih bigire û bo wê armancê jî derbasî herêma Hewraman bûye. Fêm kiriye ku li Hewramanê hemhizrên wî pirin û dikare li wê herêmê kar û xebatên xwe bi başî birêve bibe. Pişt re bi armanca berdewamkirina xwendina xwe bi hejmarek hevalên xwe re çûye Bexdayê. Li Bexdayê li ba Îmam Ceferê Sadiq xwandiye. Di civîn û kombûnan de Balûl May hertim behsa zanista xwe ya îrfanî kiriye û ji ber wê sedemê jî aliyê Harûn Reşîd ve zimanê wî hatiye birîn. Herweha bi sûça ji rê derketin û Zendîqê fermana kuştina wî hatiye dayîn. Îmam Ceferê Sadiq jî şîret li wî kirine ku rola dînekî bilîze daku neyê kuştin. Bi alîkariya wî Îmamî kariye ji Bexdayê derkeve û derbasî herêma Hewraman bibe. Pişt re derbasî Kirmanşanê bûye û li wir dest bi belavkirina ola xwe kiriye û pir kes jî li dora wî kom bûne.[114] Pile û payeya wî kesayetî li ba Yarsanan pir mezine ku helbestvan û arifê mezinê Yarsan Derwêş Newroz Soranî dibêje:

*Balul zatêwen zaty yekane*

*Amiyan maçan balul dêwane*

*Kê dî dêwane tewer dana bo?*

[114]h.b., r.44-45

*Merge w nemeydan gerdûn zana bo*[115]

*Wate:*

*Balul yek zate*

*Herçend ku xelkê nezan jê re dibêjin Balulê dîn*

*Kê dîtiye dînek ev qas zana be*

*Di meydana gerdûnê de kê dînek ev qas zana dîtiye*

Hejmareka zêde ya murîdên wî hebûne ku yên heri berbiçav evin:-

Bawe Lorey Loristanî , Bawe Recebê Loristanî , Bawê Hatem , Bawe Nicumê Loristanî.[116]Ev kes Arif , helbestvan , tembûrjen bûne û di helbestên xwe gelek caran behsa ola Yarsan kirine mînak Nawerlorey Loristanî ku di Cemekê de li cem Bulbul May rûniştiye kêfxweşiya xwe bi vî awayî nîşan dide:

*We hefitînewe we heftînewe*

*Cemêma niyan we heftînewe*

*Şikarêm awrid ne kemînewe*

*Behlul gewrema we emînewe*[117]

### 1.5.14. Bawe Serhengê Dewdanî

Li gorî vê helbesta jêr mirov dikare bêje ku Bawe Serheng li derdora çiyayê Şaho hatiye dine:

*We seney sêsed bîst û  çiwar hîcry*

*Hatif namê ew ce şaho çiry*[118]

*Wate:*

*Di sala sêsed û bîst û çarê hiczrî de*

---

[115]h.b., r.44-45
[116]h.b., r.44-45
[117]h.b., r.44-45
[118]h.b., r.46-47

*Li çiyayê Şaho xwezayê navê wî geş kir*

Ew kesayetî destpêkê derwêş bûye û bi armanca belavkirina olê pir xebat kiriye mînak:-

*Serheng dewdan serheng dewdan*

*Ez ke namêmen serheng dewdan*

*Çeny êrmanan megêlim ne herdan*

*Mekoşim pey ol kordan*[119]

*Wate:*

*Serhang Dawdan ,....*

*Navê min ku serheng Dawdane*

*Bi hevalên xwe re li herderî digerim*

*Ji bo zîndî kirina ola kurdan xebat dikîn*

Di wê helbestê de mirov fêm dike ku berê olên kurdan herdu olên Mîtraîzim û Zerdeştî bûye. Xebata Bawe Serheng û murîdên wî ji bo geşkirina ola Yarsan bûye û rastî gelek astengî û zehmetiyan hatine ku Bawe Serheng dibêje:-

*Pey amantan pey amantan*

*Girid amade ban pey amantan*

*Ez melhem minyo ne zamantan*

*Meresim we heq îmamantan*[120]

*Wate:*

*Ji bo rehetî û  aramiya xwe*

*Hemû amade bin bo parastina xwe*

*Ez bi we re me û birînên we derman dikim*

*Tola rêberên we distînim*

[119]h.b., r.46-47
[120]h.b., r.46-47

Di helbesteke din de Behsa heft kesayetiyên ola Yarsan kiriye ku di dema San Sehak Berzincî de weke kesayetiyên Cawîdan û pîroz hatine binavkirin. Di ola Yarsan de heft kesayetî ku weke Heft Ten tên binavkirin , kesayetiyên gelek pîrozin û dikarin hemû demê xwe di nava laşên kesên din de nîşan bidin. Mînak ev jî helbesta Heft kesayetiyane:-

*Heftem ser xêlen heftem ser xêlen*

*Ce asîman da heftem ser xêlen*

*Her yek we rengê ne geşit û gêlen*

*Her yek pey karê awarew wêlen*[121]

*Wate:*

*Heft kesên min hene*

*Ew hefit kes li esmanin*

*Her kesek ji wan bi awayekî digere*

*Her kes ji wan xwedî kar û erkeke*

Bawe Serheng kariye gelek kes û murîdan li derdora xwe kom bike û wan kesan jî dest bi pêşxistina ola Yarsan daye û alîkar bûne û murdiyên berbiçav yên wî jî evin:- (Bawe Qeyserê Hewramî, Bawe Serincê Kelatî , Bawe Gerçikê Hewramî , DayeTewrêzê Hewramî).

Di dema Bawe Serheng de rola jinan jî gelek girîng bû mînak:

1- Rola jinên di pêşxistin û geşepêdana ola Yarsan di nava civakê de di dema Bawe Serheng de destpê kir. Daye Tewrêza Hewramî yek ji wan jinane ku murîdeka wî bûye û helbest û arif û tembûrvan jî bûye. Wê jina mezin roleka berbiçav di nava Yarsan de lîstiye. Di qonaxên cuda de gelek jinên din jî derketine û mijûlî tembûrvanî , helbestvanî û îrfanyetê bûne ku jinên herî berbiçav jî Daye Xezanî Sergetî , Rîhan Xanima Loristanî , Lîza Xanima Caf û Xanim Diyaraka Rezberbûne.[122]Daye Tewrêza

[121]h.b., r.47
[122]h.b., r.47

Hewramî di destpêka sedsala Çarê ya koçî de hatiye dinê û di salên navîn yên wê sedsalê de jiyana xwe ji dest daye.[123]Ev jî mînakeke helbesta wê ye derbarê mala Cem:-

*Cem pey rasanen cem pey rasanen*

*Yaran yaweran cem pey rasanen*

*Her kes nêweke kero asanen*

*Cem pey roşiny zêl xasanen*[124]

*Wate:*

*Cem bo kesên başe*

*Ey Yar û bawermendên me Cem ji bo kesên başe*

*Her kes bixwaze tiştekî baş bike bila were mala Cem*

*Ji ber ku dilê mirovan gelek ronî dike*

2- Navê hejmarek yarên Bawe Serheng di pirtûkên pîroz yên Yarsan de hatine behiskirin û dibe jîpaşnavên wan bin weke (Rûtaf , Qelem , Xûnkar , Newa , Rom , Sebûre). Hinek kes jî di wê baweriyêde ne ku paşnavên wan kesan hatine behiskirin daku neyên naskirin. Xelkê Hewraman bi giştî û bi taybet xelkê gundê Tewêle heya niha jî ji Bawe Serheng re dibêjin Bawe Serhengê Xezayî. Heya niha jî usa dihizirin ku ew kesayetî ji bo ola Îslamê xebitiye , lê ew hizir şaşe û Bawe Serheng di helbestên xwe de wesa nabêje. Bawe Serheng di sedsala çarê ya koçî de li gundê Tewêle wefatkiriye û tirba wî jî li wire û xelkê navçeya Hewraman tirba wî weke tirbekî pîroz dibin û hertimserdan dikin.[125]

#### 1.5.15. Şaxoşînê Loristanî – Mobarek Şa

Kurê Celale Xanima keça Mîrza Amanê Hakimê Loristanê ye. Di sala 406'ê koçî de li Loristanê hatiye dinê.[126]Ev jî weke Îsa Pêxember bê bav hatiye dinê.[127] Celale xanim jî weke Hezareta Miryem lihember wan gotina derketiye ku bêrêzî pê kirine. Mînak:-

*Kake reya siwary dna*

---

[123]h.b., r.47
[124]h.b., r.47
[125]h.b., r.47
[126]h.b., r.49
[127]h.b., r.49

*Yê hokmê ama ce hefit asmana*

*Xelkê loristan be zoliş mizana*[128]

*Wate*

*Ey hevalan*

*Bi fermaneka asimanî ducanî bûye*

*Lê belê xelkê Loristan ji wê re dibêjin heramzadeh*

Mobarek Şa bi zarokatiya xwe dibe xwediyê paşnavê Şaxoşîn. Li bajarê Hemedanê xwendina xwe qedandiye. Di 23 saliyê de ruhê xwedê derbasî laşê wî bûye û bûye rêberê ola Yarsan.[129]Hejmarek kesên mezin li ser ola Yarsan perwerde kiriye weke:-(Baba Tahîrê Hemedanî , Baba Feqê Loristanî , Baba Bozorgê Loristanî , Pîr ŞaliyarêHewramî , Kake Reda , Hindole , Xobyar , Heyder , Qazy Nebî Sergetî , Pîr Xidir , Lîza XanimaCaf , Rîhan Xanim). Mînak:-

*Min ce terîqet awim bê zelal*

*We namê xoşîn amam we ruy kar*

*Diwîsit sal ney wer nedun mewlam*

*Amam we bîsat we şîrîn kelan*[129]

*Wate:*

*Ez di terîqet de mîna avê zelalim*

*Bi navê xoşîn hatime dinê*

*Dused sal berê di laşê mewla da bûm*

*Bi şîrîn kelamî û  bê pirsgirêk hatim*

Weke me berê jî got Pîr Şalyarê Hewramî murîdê mezinê Şaxoşîn bûye. Hinek çavkanî dibêjin 3 Pîr Şalyar û hinek jî dibêjin 2 Pîr Şalyar hebûne. Pîr Şalyar di emrê Şaxoşîn de bûye. Pîr Şalyarê yekem ku weke Pîr Şalyarê Zerdeştî jî Tê nasîn xwedî

---

[128]h.b., r.49
[129]h.b., r.49

pirtûka pîroza MeirÎfet e.Şaxoşîn û hejmarek hevalên xwe di sala 467'ê koçî de ji bo avjeniyê diçin ser çemê Qamasîp û dema diçe nav avê û êdî dernakeve.[130]

### 1.5.16. Bawe Nausî Caf – Bawe Nausî Sergetî

Gelek nêrînên cuda li ser jiyana wî hene ku di pirtûka pîroza Serencam de tê gotin:- Bawe Nausî Caf disedsala pêncem ya koçî de jiyan kiriye. Wî dev ji xwendinê berdewaye û dest bi gerê kiriye. Li pir cihan geriyaye û gelek gotiyên girîng kirine. Xelkê wê demê gotinên wî fêm nekirine û weke (Dîn) bangî wîkirine. Burhanê Heq di pirtûka xwe de dibêje" Bawe Nawîs ji eşîra Cafe û di sedsala pêncem û şeşema koçî de jiyan kiriye. Nûra xwedê di nav laşê wî de hebûye û hewla geşkirina ola Yarsan daye. Di pirtûka dîroka kurdan berga yekemîn de tê gotin ku Bawe Nausî Caf di sala 447'ê koçî de hatiye dinê. Bi zarokî dest bi xwendinê kiriye û piştre bi armanca komkirina zanistê li hemû navçeyên Kurdistanê geriyaye.Felsefeya olî û zanistên cûr bi cûr xwendiye û piştre çûye navçeya xwe û daxwaz ji xelkê kiriye ola wî qebûl bikin.[131] Bawe Naus helbestvan , arif û tembûrvan bûye. Hejmarek helbest û yarên wî di pirtûka Serencam de tên dîtin. Yek ji wan helbestan Dewreya Bawe Nause ku behsa koka xwe dike û dibêje:-

*Namêm bilew şoretin naus*

*Babom ehmeden sahib caw kaus*

*Pêkanim we ser cuqey per taus*

*Zati a siwarenan çeny keykaus*[132]

*Wate:*

*Navê min(Bile)ye û paşnava min jî naus*

*Bavê min Ehmede ku xwedî cih û navê xweye*

*Perê tawusê li ber serê mine*

*Ez û keîkaus jî ji yek malbatîn*

Bi wê helbestê derdikeve holê ku navê wî Îbrahîmê kurê Ehmed e. Çi qas çavkaniyên dîrokî weke Bawe Nausê Caf wî didin naskirin jî , lê ew di helbesta xwe de wê yekê bi nerast nîşan dide. Bawe Nausê Caf piraniya emerê xwe li gund derbas kiriye û tirba wî jî di nava gundê wî de ye. Gelek murîdên Bawe Naus hebûnê lê dujminên wî jî

---

[130]h.b., r.50
[131]h.b., r.50-51
[132]h.b., r.50-51

gelek bûne ku gelek xebitîne daku pêşketinên wî asteng bikin ku di derbarê wêmijarê de dibêje:-

*Ez nausenan cey berze mawa*

*Asyawim niyawe cey taşê kawa*

*Her kes neharo bela niyawa*

*Ferda mewîny roşyan siyawa*[133]

*Wate:*

*Ez li wî cihê bilind Nausî me*

*Di nava keviranda min aşê xwedaperistiyê avakiriye*

*Her kesek genimê xwe tê de nehêre*

*Wê di paşerojê de rû reş bibe*

Hinek kesên ku di destpêkê de gelek dijminahiya wî kirine , pişt re bûne dilsoztirîn Yarên wî ku yek ji wan Daye Xezana Sergetî bûye ku di helbesta xwe de Daye Xezan dibêje:-

*Tîry wêt kefo dem û  digana*

*Merdet zînde kerid ce goristana*

*Yarit gilew dan ce wer ewana*

*Cay xwa ywen heniş nîşana*[134]

*Wate:*

*Tîrek ji bo min şandî*

*Mirî ji goristan zîndî kiriye*

*Yara xwe di nava cahîlyetê de deranî*

*Wê demê min zanî ku ronahiya xweda li ba teye*

---

[133]h.b., r.51-52
[134]h.b., r.51-52

Bi wî awayî (Daye Xezan) bi eşkereyî ji me ra dibêje: beriya ku biçe ser ola Bawe Naus miriya nava goristanê bûye.

### 1.5.17. San Sehakê Berzincî – Sultan Îshakê Berzincî

San Sehak kurêŞêx Îsa yê Berzincî ye û diya wî Dayrak Xatûn bûye.[135]Derbarê dîroka jiyana wî de gelek nêrînên cuda hene. Di pirtûka Serencan de tê gotin ku di sala 528'ê koçî de hatiye dinê û di sala 628ê koçî de wefat kiriye. Di kurteya Serencam de hatiye gotin ku di sala 605'ê koçî de hatiye dinê , lê salawefata wî nehatiye nivîsandin. Di pirtûka Kake Reday de tê gotin ku di sala 445ê koçî de jidayik bûye û di sala 558ê koçî de wefat kiriye.[136] Di serencama Heqîqet de jî tê gotin ku di 612ê koçî de hatiye dinê û di 912ê koçî de wefat kiriye. Di destpê de li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye , pişt re li cem Mela Elyasê Şarezûrî xwendiye. Pişt re ji bo xwandina Fiqhê Îslamê çûye xwandingeha Nîzamiyeya Bexgayê. Pişt re çûye Şamê û li wir izna melatiyê wergirtiye. Pişt re çûye hecê û vegeriyaye navçeya xwe. Di 29 saliya xwe de çûye navçeya Hewraman. Li Pîrdewer nêzî Dewdan bicih bûye.[137]Bi wî awayî qonaxeke din ya rê û rêzazên Yarsan pêş ketiye ku bi vî awayî ye.

1- Tiştên veşartî yên olê hînê xelkê kiriye

2- Yar û bawermendên ola xwe kiriye 15 gurop û ji bo her guropekê erkek taybet destnîşan kiriye ku ev 15 gurop evin :(Hefit Ten , Heftê Wane , Heft Xelîfe , Çil ten , Heftê û du Pîr , Yarên Qeweltas , Hefit Xadem , Heft Heftewane , Çil Tenan , notûneh pîrên Şaho , Şestûşeş Xilamê Kemer Zêrîn , Hezarûyek Bende û Xwace Wêne , Bêwen Bende , Beywer Hezar Bende).

Lidarxistina Cem û gûz şikandin. Gûz şikandin irf û adetek kevne li ba Yarsan û gelekî pîroze.

4- Diyarkirina sê rojan weke rojî gritin û diyarkirina rê û resma cejnê.

5- Diyarkirina sirûdên olî û lêxistina tembûr di dema xwendina sirûdan de , xwendina helbestan û rê û resmên olî weke Telqîna Miriyan , Xwe Şûştin , Qurbanî.

6- San Sehak Berzincî gelek navdar bûye û hejmareka zêde ya mele û zanayên olî bûne murîdên wî , ew yek jî bû sedem ku gelek meleyên navdar derbasî ola Yarsan

---

[135]h.b., r.53-56-57
[136]h.b., r.53-56-57
[137]h.b., r.53-56-57

bibin weke ( Mele ElyasêŞarezûrî , Mele Şokrulla , Mele Sûre , Mele Xefûr , Mele Nesûr û Mele Qudûr).

### 1.6. Pirtuka Pîroza Yarsan

Ji wan pirtuk û dest nivîsên ku li sed salên bûrî ji navçeya Hewraman maye wisa der dikeve ku ji destpêka Îslamê ve ev navçe zêdetir ji her cihekî din yê Îran ê gelê aqil û rewşenbîr hebûne. Pirtuka xezane yan jî encam , mînakekî berçave ku ji fikrên gel û fikirmendên wê demê û mirov dikare bibêje ku lêkolîna li ser wan pirtuk hizir û derûnê kamilkiriye. Di encam de bi wateya axîr û aqîbetê tê bikaranîn û ew hemû mitun têda heye ku Sultan Îshaq (798-675 ) û yarên wî ji qernê heştê Hicrî nivîsîne û mitun evin:

sirud , niyayiş , edêye , adab û risumê mezhebî û meslekî û qurbanî û nezir û niyaz piranî hemiyên beşan derix kirine û kilamên bijan ji bo gel gotine. Sirudên destpêkê yên deh hece yî , heşt hece yî , şeş hece yî ne û bi diyalektê goran gotine ku yek ji diyalektê here kevnê kurdî ye û ji zemenê bûrîde ji ev diyalêkt gotine fehluyat û ji zimanê ( Bastanî , Avêstaî , Parisî ye bastan , Sansikritî , Pehlewî , Farsî ) ya niha jî gelê Hewreman bi vê diyalektîkê dipeyvin.

Ev partuk ku girîng tirîn û diheman demêde pirtûka herî pîroz ya Yarsan ( Ehlê Heq ) e ku li ser esasên cûrbeûr yan jî derketina ruh ji ceste hatiy e nivîsandin ku dibêje ev cîhan heqîqet a dinyayê ya dine û gelê vê cîhanê siha cîhana dinin û ruh jî bi cîhana din ve eleqedare û ev tiştên ku em ji vê dinyay ê fêr dibin jî heqiqeta xwe de bîr anîna ew tiştên ku me di demên borî de dizanin ji ber wê jî ruh ji cîhana din meftbûye û laşê mirov jî weke perdeyeke ku ji ser olê ku nahêle nûr derkeve û ev perde bi riyazetê nefs û seyr û sîluk ê menevî diçe û namîne , ji ber vî mirov divê her dem di seyr û sîluk û riyazetê da be heya ku kemalê meqsudê wî hasîl be. kelamê xezan e bi wateya kelam ê fiyozatê îlahîye , lewra xezane bi wateya genc ê mal yan ji cihek dê ku ev mal yan ji tiştên biha têde tên veşartin. Pirtûkê kelamê xezane şeş beş e navê wan beşan ji :barge barge , dewrey heftwane , glim we kol , dewrey çihil ten , dewrey abidîn , xurde Serencam , nivîsîn ji qernê heştema hîcrî hatiye nivîsîn û navrok jiîbadetê xwedê û tekalîfê mirov ji nav ol de behs dike.

Yekem beşa pirtûka barge barge ye ku heftêûdu pîr ji serdema heştemîn ya hîcrî ye ku bi diyalêktê Hewramî nivîsîne û diheman demêde heftê û dû beşe û beşa herî girîng ya kelamê xezane yan encame ku ji dema bûrîde morşîd û pîrên Ehlê Heq van beşan di merasîmên olî û civînan de dixwînin û hazirin jî dubare dikin. Peyva heftêdu di nav Yarsanan de pîroze weke kemera ku pîrên Ehlê Heq li nava xwe girê didin heftêdu taye. Piranî navroka pirtûkê îrfanî û felsefî ye û ev jî encama lêhurbunên rewşenbîr û

motîfekirên vî zemenîne  ku ji serdema heftemîn û heştemîn ya hîcrî de jiyan  kirine û wisa diyar dibe ku alîgirê felsefeya Îşraq bûne , felsefeya ku Şehabedînê Sohrewerdî (587_549 ) hîcrî di devreya Îslamî de li ser vê axaftina heman felsefeya Eflatun (347-430 )Qemerî gotiye û aliyê pîr û Sîluk û Mûcahîdet bû ye.[138]

### 1.7. Mûzîka Yarsan

Yek ji payeyên resen ya ola Yarsan mûzîke û tu  merasimekê olî bi rêve naçe ku mûzîk têde nebe û amûa  tembûrê jî li gel wan  piroze , li gurî fikrê wan pêş xolqandêna yekem mirov tembûr hebû ye  û bi tembûr ruh çuye nav cesteya yekem mirov.[139] " dinav mûzîka yarêsanan de ji bo her rudaneka mezhebî yan jî eqîdetî rengekî melodi yê taybet heye ku ji bo vê buyerê tê berhev kirin. Weke  meqama (Baba Nawsy ) , şehid bûna Elî Qelender  - Husêyn ku zikre ke ji mersiye yê şehadeta wî tê gotin , ( Seherî) ji bo na derketina tavê û hişyar bûn , (Fanî fanî ) ji boku dema çun bo tirb û naştina mirî… Mûzîka  hemasî ku wateyeke reng bi  reng ya wî hene ,  wekw şer kirin û dest pêka wê , sulih , muşacîre...  weke meqama (Qetar ) ku dibêje xwe hazir bikin ji bo rû bi rû bûnê . (Swar swar ) recez xanî û arayêşê cengî  û tehsîn kirin e . (Cengera ) hereke ji bo ali yê ceng  şerh dike . ( Pêş ya Şah ) ku bi  pêşwaziya kesê mezin çune .   mûxîka  henaya  ku mijara wê :Hîcran ,  Evîn dariye . Mûzîka  Îrfanî weke meqamê (Paterz ) ku pêşkeş kirina wê nefesa mirov amade dike ji bo şur û mestyê. Mûzîka  civakî , ku em dikarin bibêjin ew jî mijareke mûzîka  Îrfanî ye , ji ber wê Ola Yarsanî pir boha dide kevn bûn û civak  ji ber wê mûzîka bi vî rengî   li gel Yarsanan cenbeya dînî û Îrfani ya wê heye . weke  meqama (bariye ) ku dema koç kirinê tê berhev kirin .

Mûzîk li gel Ehlê Heq sê beşe :

1- Kelam ku ji heftê û du rengan  zêdetire û bi tenê li **cemxane** tê pêşkêş kirin , û meqam û zikir ji li xwe digr e.

2- Meqamên meclisî ku mûzîka  wê hemasî , xenayî ,Îrfanî û civakî ye kû ligel meqamê hore yeke. Ev meqamana li berçav girtin nêzîkbunên menevî ji dervea cêm xane jî tê îcra kirin ku:1- Xane mîrî  2- Saru xanî  3- Seherî  4- Qetar 5- Cilo şahî  6- Cengera  7-Gul û Xar  8- Gele Verde  9-Sema  10- Baye baye  11-Swar swar  12- Mecnunî  13- Hicranî  14- Elah weysî  15- Bariye  16- Tene mîrî  17-Pawmurî  18- Pateriz  19- Du wala , ji xwe digre.

3- Mûzîka mecazî ku ahengên îrfanî ji li xwe digre.

---

[138]Siddîq Sefîzade  (borekey), *Nameyê Serencam ya Kelamê Xezanê*,Hîrmend,Tehran,1375, r.11,12,13
[139]Namîq Hewramî, *Peyrewakanî Yarsan Le Kirmancî Seruda*, Hewlêr,Hewlêr, 2013,  r.20

Di nav pirtûka pîroz a Yarsan de (Serencam ) pir li ser saz û awaz axafti ye . Şaxoşin girupek bi nave nohsed nohsed hebû ye û hemiyê van mûzîkane zanibûne. û di nav grupa sultan ishaq jî heft sazbend û heft saz zan û kilam bêj jî hebûne . Di nav pirtûka Serencam ê de navê zêdetir ji şêst core saz hati ye ku hemi yên navçe ya kurdistanê ne. bi vi awayiye :

1- Tenbûr 2- Ûd 3- Rebab 4- Qitar 5- Zurna 6- Naqus 7- Mukeş (Kemançe ) 8-Tar 9- Sentur 10- Çeng 11- Ney 12- Dol (dehol ) 13- Dokme 14- Nefîr 15- Biluil 16- Şeîpur 17- Qamqur 18- Qanun 19- Şutan 20- Zimar 21- Şimşal 22- Mohre 23- Tepil 24- Def 25- Sonqoreh 26- Qirna (qerenî) 27- Sur jin 28- Cebar 29- Ququ 30- Semtur 31-Kureng 32- Zil 33- Bûrik 34- Demar 35- Pureng 36- Dumbek 37- Mwsîqar 38- Çeqwane 39- Awaz 40- Qîjek 41- Sitar 42- Qupoz 43- Tas 44- Kerna 45- Duzeleh 46- Du tepleh 47- Tutek 48- Zeng 49- Şax nefir 50-Rud 51-Baleban 52- Kinareh 53- Sefîr 54- Daîreh 55- Mizmar 56- Gaw dowem 57- Çexaneh 58- Çar par 59- Tiryal 60- Kos 61- Şaneh 62- Erxenun 63- Gireh 64- Qemtur 65- Reqaz. Ku ev jî îhtiram ji bo hûner û ruhê mezinê mirove nave vê Olê nîşan dide ."[140]

### 1.8. Pîroziyên Yarsan

Pîroziyên ehlê heq pênc tiştin. ev Pîroziyêne pênc dane evin :

1- Biya bes yanî (Sac ê Narî ) û ( Pirdîvery ) biya bes li ba ehlê heq du wateya ev heye :

Sac Nar peyveka Farisî û wate yên cor bi cor ên ev heye؛

Mîna :Tabêh ) bi wateya parçe asîneka pehin û daîrey ku dixen ser

ocax û nanê nazik dipejin û peyvê nar ku erebî ye û bi wateya agîr e,

û wateya van bi hevre ( Sac Nar ) elêbelê li ba

ehlê heq bi wateya runahî ya tevê dihê û dixazin bibêjin ku aleme

menevî û cihê bê deng ji nihêrtina van mîna runahiya tavê ye û

şubhandine bi runahiya tev ê.

1- Gotin ê Serencam bi wateya gotinê mezinên ehlê heq yê mîna şah xoşîn û sultan îshaq ku bi zimanê kurdî yê hewramî ye.

[140]Teyîp Tahîri,*Tarîx we Felsefihyê Serencam*,Aras,Erbîl,2009,r 754,755

2- Cem û cem xane yan jî cêm û cêm xaneh ku bi wate ya cihê kombûna peyravan û meslek ê ehlê heq tê , ji bo îbadet û xwendina duayê taybet bi xwe.

3- Wan tiştan ku ji cêm xane mîna nezir û yasayê ehlê heq bi dua dixwînin û paşan mesref dibe adabeka taybetiya ev heye.

Mîna ev gotinê sultan îshaq:

*Şewqim ziyawe , şewqim ziyawe*

*Ey cemu yaran şewqim zyawe*

*Ez enqam kiyast beywe ça kawe*

*Bidero dûay nezir û paktawe*

*Wimiş ne cemda mekerî cela*

*Rohta xwacam bêwe ser sela*[141]

Wate:

Çar ten ji yekem ji ber ku ji (Kanî Gwîz ) ji (Şaho ) kombûn , nav bi vî core ye (Rotaf yan ji Rohtaf ku binyamîn e , Keşkol Dawud e , Atosa yan ji Hatef remizbar e Qelem jî Mostefay e).

Rohtaf got çi li gel ve heye verin em cem çê bikin , her yek ji van tiştek hebû ( Rotaf şîranî , keşkol enar , Atusa badam , Qelem beru ) tiştên xwe tevlê hev kirin û rohtaf (BSinyamîn ) ev dûayê bi ser tiştan xwend :

*Têkel bikermê , têkel bikermê*

*Her çwar niyazma têkel bikermê*

*We sozê esrîn dûaş bidermê*

*Pelamar we cem rasan biwermê*

Wate:

Verin em her çar kes bi hevre tiştên xwe tevlihev bikîn û bi yek dilî û hêsirên çavên xwe dûa bi ser de bixwînîn û bikevîn nav cemê rasan.

[141]Hesen Ruhanînijad,*Moqedesat Ehl Heq,* Kovara Nûr,Tihranr,1387,r186, 187

Ji cimde seyd heye ku ev re dibêjin ser cim û paşan xelîf e û xadem û cêm nişîn hey e û tembûr jen û kilam xwên jî hene.

Di nav cem de xelîfe ji bo çareser kirina arîşe û ji merasîma nav nan û ser sipardinê de îşê ev digehore û eger ji cimek de seyîd li vê derê nebû xelîfe îşên wî bi rêve dibe û îşê cem jî dike.

Ehd û mîsaq û beyet ku , şert û mîsq jî dibêjin.[142]

### 1.9. Yarsan ji Nivîs û Çavkaniyên Cuda

**Yekem:**Di encam de , ev pirtûk , pirtûka pîroz ya Yarsaniyan e ,(Kelam-Kelamê Xezane) jî dibêjin û şeş beşe , yan jî em dikarin bibêjin ku şeş pirtûkên bi vî navî hene :

**1-Barge barge:**amadekarê vê beşa ji pirtûka pîroz ew kesin:

San Sehakê Berzencî , Pîr Binyamîn , Sey Mîr Ehmed , Sey Mistefa , Sey Ebolwefa , Sey Şehabidîn , Sey Hebîb şa , Hacî Baveysî) , herweha jî her yek ji rêber û arîfên mezin û pêşengên sedeya heştemîn ya koçîyê Yarsan , ku hemu gelên navçeyên cuda yên kurdistanê bûne , û hejmarek jî ji derveyê kurdistanê hatine Hewreman , û bûne pêşengên wî olê heya ku gihîştine pileya(Pîr)û çûne nav **bazneya**(72)pîr , ji wan :Pîr Mîkaylê Dewdany , Pîr Nalî Mordînî , Pîr Şemsê Elemdar , Pîr Roknedîn , Pîr Simaîlê Sîstanî , Pîr Qabîlê Semerqendî , Pîr Tahirê Êsfehanî , Pîr Kemalê Mamolanî , Pîr Rastguyê Qeredaxî , Pîr Teqî Şahoy , Pîr Heyderê Loristany , Pîr Nere Balamoy , Pîr Ehmedê Loristany , Pîr Tacdînê Faris , pîr Hoseynê Kaşanî , Pîr Mehmudê Bexdayî , Pîr Ewilezîzyê Besraî , Pîr Îbrahîmê Caf , Pîr Silêmanê Erdelanî , Pîr Xaliq Erdebîlî , Pîr Mensûrê Şuştery , Pîr Îsayê Şeqaqy , Pîr Heyder Kel Meydany , Pîr Malîkê Goran , Pîr Nasirê Bextiyarî , Pîr Îsayê Pisakanî , Pîr Xelîlê Mûslî , Pîr Ceferê Kurdistanî , Pîr Hemzeyê Bîrî Şay , Pîr Hoseynê Esemolî , Pîr Elyasê Moryasî , Pîr Feyruzê Hindî , Pîr Eyazê Mexribî , Pîr Niga Dartanî , Pîr Qemer Seraw Qomaşî , Pîr Temasibyê Kirmanî , Pîr Teymurê Hewremanî , Pîr Rehmetê Bembeî , Pîr Qobadê Dêwane , Pîr Kazimê Kengawerî , Pîr Danyalê Dalehoyî , Pîr Seferê Qelacê , Pîr Mûsayê Miyaneyî , Pîr Sure Hîndoleyî , Pîr Sadiqê Mazenderanî , Pîr Nemetê Tewerdar , Pîr Dilawerê Dereşîşî , Pîr Heyatê Maçînî , Pîr Qanunê Şamyî , Pîr Hatemê Hemedanî , Pîr Mohemedê Şehrezûrî , Pîr Nadirê Hewramî , Pîr Îsmaîlê Golanî , Pîr Nazdarê Şîrazî , Pîr Nerîmanê Şahoyî , Pîr Teyarê Xorasanî , Pîr Înwanê Kebeyî , Pîr Ehmedê Gencey , Pîr Ehmedê Bersay , Pîr Nadir Qere Papay , Pîr Mamlê Maydeşty , Pîr Şaliyarê Hewramî , Pîr Mehmudê Loristanî , Pîr Necmedînê farsî , pîr Neqî tukanî , pîr Haşimê rejweyî , pîr mêrdî Hordînî , pîr Baba Xeybê Hawarî , Pîr Fetalê Sehneyî , Pîr Ezîzê Hiwane , Pîr Rostemê Sw.

[142] Hesen Ruhanînijad,*Moqedesat Ehl Heq,* Kovara Nûr,Tihranr,1387,r186, 187

**Dewreya Heftwane-Hewtewane:** Ew beş ji Serencam birîtîye ji sirudê deh hicay , ji aliyê hejmarek ji rêber û pîranê Yarsan , ji wan:(San Sehakê Berzency , Pîr Binyamîn , Xelîfe Ezîzê Silêmany , Xelîfe Mohemed , Xelîfe Şaşa , Xelîfe Şehabedîn , Xelîfe Bapîr , Xelîfe Emîr , Xelîfe Cebar , Daudê Koswar , Pîr Musayê Defterdar , Xatû Remizbar , Şa Êbrahîmê Eywet , Melek Geyar , Yar Zerdebam-Bawa Yadigar , Sey Mîr Ehmed , Sey Baweysy , Sey Hebîb Şa , Sey Mistefa , Sey Ebûlwefa)û ji sedeyên heftem û heştemê koçy honrane.

**Gilîm we Kol:**metneke meîrîfîyê sedeya heştemê koçîye ji aliyê , (San Sehakê Berzincy , Pîr Binyamîn , Daudê Koswar , Sey Mîr Ehmed , Sey Mistefa , Sey Mihemedy Şehrezury , Sey Ebolwefa , Sey Şehabedîn , Sey Hebîb Şa , Hacy Baweysy)hatiye honandin.

**Dewreya Çilten :**Sirudin ew beş jî ji aliyê rêber û arîfên mezinê Yarsan ji sedeya heştemê koçy hetine honandin , wan kesan :(San Sehakê Berzency , Pîr Binyamîn , Daudê Koswar , Pîr Musayê Defterdar , Remizbar , Mistefa Dewdany , Yar Zerdeban-Bawa Yadigar , Rocyar-Şa Êbrahîmê Eywet) , hejmarek ji arîfanê Yarsan ku xelkê hewreman bûne û pirany naz navê wan niwîsayemîna :(Qanûn , Seyad , Lamy , Pêşenig , Ewrenig , Xezawy , Şimşal , Seyqal , Ezazîl , Îdrak , Xonçê , Mesty , Xazy , Werdy , Nîşan , Cerga , Seqa , Bîa , Merzy , Tewar , Seraf , Sirûr , Reztab , Qendîl , Şemîl , Tofîq , Herîr).

**Devreya Abidînê Caf-Abidînê Başçaweş:**ev beş birîtiye ji(31)benid , û mijarê olî , çendîn piris û bersiv ji ser corê berhem anîn ji ew serdem , çêbûna civak , hoz û navên wan :(Lor , Lek , Lolo , Caf , Goran)bi helbest axvîne , axaftin jî li ser jiyana pîroz ya (Hûm) ku kurdên (Sûm) dibêjin , navê bajarê(Hormozgan)jî heye.

**Hurahiya encamê -kortasiya encamê:**Di vê beşê de behs li hindek bingehên , baveriyên dînî hatiye kirin , ji wan :(Sersipardin , Cem û Cemxane , Rojû , Qorbanî kirin , Zewac , Nav nanê zarok , Xwe şuştin , Mirî Şoştin , Nizayê mirî oştin...) bi cureyê helbest û sirudên dînî ye.

Temamiyên beşên destpêkê bi zimanê(Hewramî-Goran) hatiye nivîsandin , tenê(Dibistana Abidînê Caf) bi rengê axaftinên cafên zozan û binara navçeya şehrezur hatiye nivîsandin , bi vî rengî axaftin jî piranî li çavkaniyan de bi (Hewramî ya Cafî) bi nav kirine , xwendina destpêkê jî erkê rêberên dînî yên Yarsan e û wî kesî re dibêjin (Kelamxivan).

# 2. ZIMANÛ ERDNÎGARÎ

## 2.1. Ziman

Ziman nasnameya miletane û bi têkelbûna neteveyên cuda , di ziman de jî gohertin pêktên.[143]"Ziman deskevtê civakê ye û civak ziman ava dike , ku kesên di nav civakê de wek amûrekî peyvendiyê bikarin nêrînên xwe ligel yek parvebikin û biaxavin.

Ev deskevtê cîvakî (Ziman) di nav her civakekê de cuda ye.

Dû hezar sal berî mîladê neteweyên Hînd û Ewropayê berê xwe didin çiyayên Zagrosê û bandora xwe li ser niştecihên wê derê kirine û ziman û şaristaniyeta wan gohertine.

Têkelbûna zimanê şênî , ango niştecihên Zagrosê li gel ziman û olê xelkê koç kirî bi hev re zimanekî nû li gel xwe derxistiye hole , û mirov dikare bêje ku ev zimanê nû zimanê avêstayî ye ku Zerdeştiyan bikar aniye , pê axaftine û çanda xwe bi lêv kirine.

Ji ber ku êdî zimanê Avêstayî , buye zimanê nû yê xelkên niştecîhê Zagrosê , û paşê jî navê vî zimanî hatiye guhertin û weke zimanê Medî hatiye binav kirin. Zimanê Pehlevî ku di Wêjeya dînî ya Zerdeştî bi vî zimanî hatiye nivîsandin û gelek pirtûkênvan jî hebûne ku di nava tarîtiya tarîxê de winda bune.[144]

Di dema hukumeta Sasaniyan de ev ziman , weke zimanê fermî yê dewleta Pehlevîyan hatiye binavkirin , û mirov dikare bibêje ku ew zimanê Kurdî yê wê demê bûye. Melekolşoerayê Beher jî dibêje ku zimanê Kurdî şaxeyek ji zimanê Farsîye ku paşmayê zimanê Medî ye.[145]

Zimanê (Pehlewî _ Hewramî ) de ev zaravana hene: Hewramiya Text , Jaweroyî , Lihonî , Zaza , Bacelanî , Maço Maço , Gehwareyê Kevin , Bêwencî , Qelay. Bi vî awayî ku Kurdên Jawero , Hewramana Text , Newsud û Pawe di nav Îranê da û Kurdên Tewêle û Biyare di nav Kurdistana Iraq û Kurdên Diyar Bekir , Bîngol , El Ezîz , Adiyaman , Sîverek , Tûncelî(Dersim) , Erzîncan , Qolp , Hine Piran , Çermîk , Sirok û Kakeyên Xaneqîn û Kerkuk û Şebek ji Mûslê bi vî zaravayî diaxavin. Di zimanê Hewramî de nêr û mê cudaye , weku îşaret ji bo mê (Ade) û ji bo nêr (Ad ) û zêdetir ji axaftinê derdikeve.

---

[143]Namîq Hewramî, *Peyrewakanî Yarsan Le Kirmancî Seruda*, Hewlêr, Hewlêr, 2013, r.24
[144]h.b., r.24
[145]h.b., r.24

Yekemîn gotin ku bi nezim di zimanê Kurdî de hatiye nivîsandin ji aliyê neteweyên Yarsan bi zimanê (Pehlewî - Hewramî ) hatiye tomar kirin.

Yekem car ji aliyê Behlul Mahî û yarên wî ji navçeya(Hewraman ) hatiye tomar kirin , Paşê jî Şah Xoşîn ê Loristanî , Baba Nawus Sergety … , û Hemu kesayetên Yarsan ku bi dirêjahiya dîroka Yarsan hatine , gotinê xwe bi zimanê Kurdî û zaravayê Hewramî nivîsandin e.

Bi vî awayî pirtûka pîroz ya Ehlê heq ***Encamên destpêkê*** bi zaravayê Hewramî hetiye nivîsandin."

### 2.2. Erdnîgara Yarsan

Yarsan ku nijada wan Aryayî ye ji peravên Hînd û Ewrupî ne kû ji demeke nediyar çend hezar sal pêş mîladê hatine Kurdistan ê.

Hindek ji lêkolînvan dibêjin ku bi xwe ji rojhelata deryaya Baltîkin koçî Zagrosê kirine.[146]

Niha jî erdnîgariya wan bi vî rengiye :

*a- Li Îranê*

-- Kirmanşah: **Piranî Ehlê heq dinava Îranê de di nav bajarê Kirmanşahê de dijîn. Gondên derdora kirmanşah ê jî evin:**

**Gondê Gerban (Navbera Kirmanşah û Hersîn ) , gondên aliyê (Osman Wend )û (San Rostem) û hindek jî gondên aliyê( Mahî Deşt) û gondên aliyê bilewar ( Navbera Kirmanşah û Kamyaran) navên wan :Miyan Derbend , Bala Derbend , Post Derbend..**

**__ Êslamabadê Xerb:**Derdora wê weke Soran Eliya Wesfeli , Çongor (Simîn wend , Celîl wend ) , sed û sî û pênc gondê kozran ku sedû şêstû pênc ê wan Ehlê heqin.

**__ Kirindê Xerb:**Derdora av yekên dên ji navenda Ehlê heqe , sed û bîst gondê aliyê dihêstana Gehware , gondê navdarê kirênd , herîr , Sermil , Sorxe lize , Gehware , Biyame , Birund , Qele Zencir , Girdkan kure , Gura Cub , tut şamî ne. Dibêjin sedû pêncî hezar kes Ehlê heq li bajarê kirind hene , gondên bêwenij Panzdeh gondin û hemi jî Ehlê heqin.

---

[146] Siddîq Sefîzade (borekey), *Nameyê Serencam ya Kelamê Xezanê*, r.11,12,13

__ **Serpol Zehaw:**Zêdetir ji sedî bistê gelê Serpol Ehlê heqin û bîst û sê gondê derdorê jî Ehlê heqin. Ji gondên derdor re mirov dikare vana bîne ziman (Pês pês , Reşîd ebas , Dol elyas , Celalvend siflî , Belwan , Qere bolax) û gond ê derdora Dihêstan (Bizmir abad) e gondên derdora bajêr deh kîlometir ji bajêr durin , lêbelê gondê (Dihêstan ê bizmir abad) an jî (pişt teng) zêdetr ji çil kilumêtir ji bajêr durin.

__ **Qesrê Şîrîn :**Zêdetir ji sedî dehê gelê Qesra Şirin Ehlê heqin.

__ **Sehne ûDînever :**Sedî pênciyê gel Ehlê heqin û piranî gondê derorê jî weke , Kengaver û Esedabad .

__ **Lorîstan:**Ji derdora Loristanê jî Ehlê Heq hene û piranî gondin , yek ji wan Gondê (Biluran) e ku li ser rêya Îslam abadê xerbe .

__ Pol doxter , Humeyê girab û gondên derdora Nûr abad hindek ji cihên wê Ehlê Heqin.

__ **Azerbaycanê Şerqî:**Ji bexşê ( Îlixçi ) ji aliyê tebrizê li wê derê jî Ehlê Heq hene û bi lêkolînkirina van re dibêjin Goran ku ji dema boriye ji aliyê (Kirênd ê xerb ) koç kirine û hatine.

__ **Derdora Tehran û şimal:** Di nava Tehran û Rudhin , Kelar Deşt , Şîmal û Piranî Heşt Gird Ehlê Heq hene.

__ **Zencan û Hemedan:**Ji Esed Abad ê Hemedan û derdora Awec ku navbera Hemedan û Zencan ê ye Ehlê Heq hene.

b- Li Derveyê Îranê

__ Başurê Kurdîstan **:Helebce , Xaneqîn , Kerkuk , Musil , Bexdad , Hewlêr Ehlê Heq hene.**

__ **Turkiye:** Dersim , Sîvas , Samsun Ehlê Heq hene.

__ **Sûriye:**Dinav Sûriyê jî pir hene û ji wan re dibêjin Elewî û Elîolahî piranî jî li rojhilat û rojavayê Sûriyê dijîn.

__ **Efxanîstan:**Ji Rojhelatê Efxanistan û aliyên din jî Ehlê Heq hene û bi ( Elîolahî ) û (Îsmaîlêye ) têne naskirin û rêberê wan jî Seyd Mensurê Nadirî ye.

**__ Tacîkistan û Cimhuriyên Asyaya naven:**Li Tacîkêstanê jî , li aliyên ( Pamper , Kafer nêhan , Bedexşan ) hene û bi (Êsmaîlî ) tên naskirin.[147]

### 2.3. Cihên Pîrozê Yarsaniyan

**Perdîwer:**Nêzî gondê(Dewdan)e , girîngtirîn cihê pîroze li gel Yarsanane , lewra hem qîbleya wane û hem jî cihê nîşte cih bûna (San Sehakê Berzencî)bûye , dema ku ew zat ji (Berzence)ve berbi Hewreman ve koç kiriye , li (Perdîwer)rawastaye û li wêderê jî ji xwe re (Mal û Cem xane)ava kiriye û yaranê wî li dora wî kom bûne , ji hinek sirud de bi(Bajarê Perdîwer)nav anîne.

*Ve watey mêrdan xirqey nur enw*

*Awim teşaren qîblem perdîwer*[148]

*Wate :*

*Bi gotinên rêber û Pîrên Yarsan*

*Ava min ji teşar e û qîbleya min jî(Perdîwer)e.*

**Hawar :**Ew gond ji Hewramanê Lihone penahgehê Yarsanan bûye û li ba Yarsanan pir pîroze, ji 800 sal berê cihê Yarsanan bûye , derdora wê gondê şaxên(Şênirwê , Rûtawa , Mekoy Maxe)hene û kaniyên(Wêşey , Kanî Dirêj , Kanî Wez gêl , Kanî Goyje Gelwezan , Kanî Baxçey Cany)ji avê wan kaniyan ji bo vexarênê mirovên wê derê , ajal , û zîndî kirina baxan sud jê verdigrin , (San Sehak Berzencî)ji (Dawud ko siwar)gotiye ku biçe ji bo hawar.

*Dawud vo hawar dawud vo hawar*

*Dawud hewalen bilo hewraman*[149]

*wate :*

*Dawud vo dawud biçe ji bo hawar*

*Dawud emre ku biçî ji bo hawar*

**Şênirwê:**Beşeke ku ji rojhelatê bajarê Helebce ye , ji deftera Yarsan de bi(Şindirwê)binav kirine , ku ji nivîsên pîroz ê (Yarsan) de dema ku (Xatu Celalê dayika Şaxoşîn) , bi emrê bavê wê birayên wê , wê dibin ku bikujin , (Kake Reday)ji

---

[147]Qobadî, Êsmaîl,*Tehqîqî Pîramunê Firqiyê Ehlê Heq,*Kovara Kelamê Êslamî,Hejmara 14, r.1374

[148]Rostem,Eyûb,*Yarsan,*Melbendê Rewşenbîrîyê Hewreman,Hewlêr,2006,r,152

[149]h.b., r.152

(Şênirwê)de hêviyê ji dê bûna (Şaxoşîn) bûye û li wêderê hevdu dibînin û (Xatu Celalê)vê gotinê dibêje :

*Kake reya siwary dana*

*Ye hokmê ama ce hawit asimana*

*Xelkî loristan be zoliş mizana*[150]

*Wate :*

*Kako reya siwar karê dana*

*Emrê ji hefit asiman hat û hamîle bûm*

*Aniha xelkê Loristan wê re dibêjin heramzade*

**Teşar :**Teşar gondeke ku ji Hewramanê Lihon û ser bi qezaya (Pawe)ye pîroziya(Teşar)li gel Yarsanan ewe ku Bave yadigar(Kany Xeslan)li wê derê kolandiye , û ew av , weke ava kewserê ya yariyane.

*Ve nazy eyvet melekey teyar*

*Kerdim şostişu ve abî teşar*

*Pak û tahêr biwêt ewel axir yar*[151]

*wate :*

*Bi navê Cobreîl ku li ba xwedê naza te heye*

*Xwe şoştim bi ava teşar*

*Ji ser ta bi pa paqij bûm , ewl û axêr yar e.*

**Serget :**Yek ji gondê kevin ya Hewremanê Lihon e , ew ser bi nahiyeya (Biyare) ye , (Serget)cihê jiyan ê her kam ji(Bawa Nawusy Sergety , Daye Xezany Sergety , Qazy Neby Sergety)bûye.(Bawa Nawus)yek ji pênc rêberê mezên yê Yarsan e , û(Daye Xezan û Qazy Neby)jî arif û şaîrên mezin ê Yarsan bûne.

*Keftim ew serget keftim ew serget*

*Kem kem nezdîk bîm keftim ew serget*

[150]h.b., r.154-156
[151]h.b., r.154-156

*Çun meîlê heq bê wey newîm hîlak*

*We hokmy nawis şîre by we tak*[152]

*Wate :*

*Ketime naw serget,...*

*Kem kem nêz bûm heya ketime(Serget)*

*Xwestê xweda bû hîç mandî nebûm*

*Bi hokma(Nawis)şîre bi tenê ma*

**Mordîn :**Gondekî pir xweşike û li ser sînurê qezaya Helebceye û dikeve ser bilindahiya (Zêya Sîrwan) , ew gond cihê jiyan kirina (Pîr Naly Mordînî)ye , ku li wî gondî de Bircek heye bi navê(Birca Mordîn) , hem gond û hem jî Birc , li gel Yarsanan pîroze.ji şîreka(Pîr Naly Mordînî)her yek ji(Pîr Binyamîn û Pîr Alî)jiserpîleûpayeyadînîzoran digrin(Pîr Binyamîn) , (Pîr Alî)bi zewî dide.

*Ewe mordîne ewe mordîne*

*Bargey şam westen ewe mordîne*

*Sir ha we sîney binyamînewe*

*Pîr û pîr alî yey yek dênewe*[153]

*Wate:*

*Ewe mordîne,...*

*(San Sehakê Berzencî)ji mordîne*

*Serê pîr alî ji ser singê pîr binyamîn e*

*Her do pîr yek yek vedigerin*

**Qelay Sîman:**ew Birc li ser çiyayekî bilinde û li pişt gondê(Sîman)ê rojhilatê kurdistanê ye û li beranberî her dû gondê(Mordîn)û(Çinar Kokoy) ye , hin kes dibêjin ku ew Birca , Birca Aşuriyane û ji serdema hikûmranîya(Semîras)de hatiye çêkirin , Birca Sîman dinav helbestên (Yarsan) de bi pîrozî binav kirine , (Pîr Xalîqê Erdebîlî)dibêje :

---

[152]h.b., r.156-157

[153]h.b., r.156-157

*Wisit ew koy sîman wisit ew koy sîman*

*Bargey(şam)liwa wisit ew koy sîman*

*Dermany derdim daroy hekîman*

*Ragey yarîyen we dîde we gyan*

*Êdî ber heqen be wermê îman*[154]

*Wate :*

*Çu ji bo qelayê sîman*

*(San Sehakê Berzencî)çu ji bo qelayê sîman*

*Îlac û çaresera min li ba yariyan e*

*Yarî ku runahîyê dil û dideye*

*Ew dîn dînê heqe*

**Tepe Sur-Tepy Sefa :**gireke li Şehrezur , nêzî wê dû gond bi navên(Tepê Sefay jor , tepê sefayê jêr)hene , ku ew cihana li gel Yarsanan pir pîroze.

*Dawud tepe so dadwud tepe so*

*Dawudê rewhber perê tepe so*

*Pîr rostemy bar beyowe reco*

*Bizanmê sawam çe şarê maço*[155]

Wate :ji wî şirê de yekek ji kurên(San Sehakê Berzencî)ji fermanê bavê xwe bi cî nenîye û çuye ji bo (Tepe So) , san sehakê berzencî jî ji (Dawuid)re dibêje biçê û kurê ew bîne heya ku bizanbe daxaziya ew çiye.

**Gonid bajêra Tewile :** Ev gonid bajêrê yek ji gond bajêrê kevn yê Hewramana Lihone , mezarê(Bawa Serhengê Dewdany)li wê ku yek ji(pênc rêberê mezinê Yarsane) , dû mezarê din jî liwurin ku li gel Yarsanan pîrozin(Baba Eskender) , (Pîrê Cewîz Sor).

**Kelî dawud-dukanî dawud :**Cihuwarekî kevne û mîhrabeyeka mîtrayî têda heye , ku ji başurê rojhilate(Serpêlê zehaw)e , liwur peykerê mirovekî ji kivir çê bûye

[154]h.b., r.157-158-159
[155]h.b., r.157-158-159

heya ku dû pelê xorma bi desit girtiye û ji doxa nîzayê , bi gotinê çavkaniyên dîrokî ku dibêjin ew der ji serdema medan maye û mezarê(Dawud Ko Siwar-dawudê delîl)li wêderê ye.

**Taşy Horîn :**pîroziya(Kevirê Horîn)ji bo wê ye ku (Şaxoşînê Loristany-Mobarek şa)Dema ku malavyî ji dinyayê kiriye , tapoyek jêr w îkevrî vedişêre , her kes ji qonaxeka din wê tapoye derxe ewê xodê (Şaxoşîn)e , lêbelê ji cismeka din de.

*Ew taşê horîn ew taşê horîn*

*Bargey şam wisten ew taşê horîn*

*Pîry qebaleş niya we serîn*

*Her kes ber awerid ewen xoşîn*[156]

**Mery Newê-Şikefta Newê :**Newê yek ji gondê kevn yê Şehrezure û cih û warên dîrokî têde pirin weke :(qele , sicin , kureya nên çê kirin) , xelkê wê deverê û ew Eser bi (Qeleya Zohak , Sicnê Zohak)nas dikin , û Esarê çendîn(Aşê Av)hene ku heya naha jî mane , û xelkê Newê dibêjin ji serdema kevin de(99)aşê av ji Newê hebûne , û ew şikefit li gel yariyan pir pîroze , ji ber ku(San sehakê Berzencî)û yaranê wî dema ku leşkerê n(Çîçek)li du wan ketine ew zat û yaranê wî sê roj xwe dinav şikefitê de vedişêrin.

*Ew mery newê ew mery newê*

*Bargey şam wisten ew mery Newê*[157]

*wate :*

*Şikeftê newê,...*

*(San Sehak)ji şikeftê Newê ye*

**Ehmed birinde :**Gondeke ku ji sînurê(Warmawa) , mezarek li wî gondî heye bi navê(Ehmed birinde) ku li gel (Yarsanan)pîroze , lawra bi destura(Şaxoşîn-Mobarek şa)çuye wêderê û ji serdema(San Sehakê Berzincî) , bi navê(Dawud Kosiwar)jiyaye.

**Dereşîş :**Gondeke ser bi qezaya Helebce , ji helbest û sirûdên Yarsan de nav anîne , yek ji (72)pîr jî bi navê(Pîr Dilawer)xelkê wî gonidê bûye.

*Zolal dereşîş zolal dereşîş*

---

[156]h.b., r.159-160
[157]h.b., r.159-160

*Yadigarê min zolal dereşîş*[158]

*Wate :*

*Dereşîş mîna avê zelale*

*Ew avê zelal , yadigarê dereşîşe*

**Tirba Şêx Reş :**Ew tirb nêzî gondê(Şeşky dumale-Şeşky hacy sa)li navçeya Şehrezur û li gel Yarsanan pir pîroze , yarî dibêjin(Şêx Reş)ji serdema(San Sehakê Berzincî)de ji cesteya(Şa Êbrahîmê eywet)da bûye.

**Mîrê sor :**Gondeke li Şehrezurê ye , ku ew gond bi navê(Sey Ehmedy mîr sûry kurê San Sehakê berzincî)ye , ku yak ji bazneye(Heftewane-Hewtewane)bûye.

**Kakey cawir :**tirbeke pîroz ya Yarsanane û navbera her dû gondê (Hawar û Palaniyaw)yê de ye.

**Tirba bawa yadigar :**Ew cihê ku ew tirba lê heye , li hin çavkaniyan weke gondê(Serane) , ji hineka din bi(Ban zerde)binav kirine.

**Şehrezur :**Bi giştî li gel Yarsanan pîroze û di baweriya wan de dinyayê nemrîyê wan Şehrezure , pîr teymur hewramî dibêje :

*Ew şarezury ew şarezury*

*Bargey şam wisten ew şarezury*

*Mêrdan cem biwan girid we ru sury*

*Bigindê we şon pîr we sebûry*

*Ha heftewanen şemi we qendury*

*Sikey qedîmen wala mendury*[159]

*Wate :*

*Ewe şehrezure,...*

*Bargeha Sultan ji şehrizure*

*Yaran hemî bi ser bilindî kon dibin*

[158]h.b., r.160-161
[159]h.b., r.160-161

*Bi sebûry bi du pîr dikevin*

*Hefte wane jî dibin mom*

**Dizawer :**gondeka hewremanê Lihone ji rojhelatê Tewêleye , Tirba(Şêx Şehabidînê izawery)lewdere , ku li ba Yarsanan pir pîroze , ew gonid cihê jiyanê(Bazneya Çil Ten)bûye.

*Hami lif mêrdan azîzmen binyam*

*(Dizawer)manen rîşe gird xolam*

*Binyamîn ane rojeş kerden lam*

*Çemey zolalen mey kerden ne cam*[160]

## 3. HELBEST Û WÊJEYA YARSAN Bİ GİŞTÎ

Helbestên ola Yarsanî wekî her wêjeya oliyên din bi dirêjahiya dîrokê çêbûye û paşê kom kirine , hin caran jî xwediyê wan nehatiye nasîn , lê belê bi xwe helbestên xwe dixine ba kirdigar , firîşte û mêrên mezinê xwe , ji bo we ji her cihekê re helbest peyda kirine , yan jî komelek ji helbestên helbestvaneke kevin bi ser de anîne , bi navê navçe , rojgar , xwedê helbestvan nav nayne. Bi komelek ji dest nivîsên helbestvan bi xwe re dibêjin defter , bi helbestê bixwe jî(Kelam)dibêjin , hin car jî bi navê qonaxê(Dewreya)kirdigar , yan jî firîşteya wê qonaxê nav anîne , mîna(Dewreya Şaxoşîn)yenî wan helbestên ku ji rojgarên jiyanê şaxoşîn hatine honandin , ji aliyê xwe yan jî yaranên wan. rastî ji ser Yarsan ewe ku bîr û baweriya xwe ji felsefeya olên kevin ê rojhelat mîtraîzm , Zerdeştî ûHînduyî vergirtine.

Di ola xwe de teqlîd(ji dê bûna îsa)kirin e , wekî ku li ser wê baveriyê ne ku Şa xoşîn û Sultan Sehak ji do kiç ji dê bûne , peywendiyê wan bi dîya xwe mîna Îsa ûMeryem e. gelek xwe rewiştê wan heye bi taybet ji kon bûna nan xwarina wan ji (Cemxane)dişibe(Axîr nên xwarin)a îsa ligel yaranê xwe. hejmareka pir ji neteweya kurd ji ser wî olî bûn , zimanê fermî yê wî olê zimanê kurdî bû , ji ber ewe wek her neteweyeka xwedî zimanê resenê xwe , wêjeya taybet bi ola xwe bi zimanê netewî peyda bû. navê pêşewayên ola Yarsan Kurdî bû(lory , gorany , kirmancî) , heft kirdigarên wan hemiyan kurdê Kurdistan ûLorîstan bûn , beder ji(Elî kurê Ebutalîb).

---

[160]h.b., r.162

### 3.1. Qonaxên Helbestên Yarsan

Pîremêrên Yarsanan xwediyê bîr û bawerî û xwendevan bûn , bi zimanê Kurdî difikirîn û di axaftin , bîr û boçûn û felsefeya ola xwe bi helbestan dedixistin , ji çarçoveya helbestên mîlî , folklorî dernediket , û ew çarçove bi kar dianîn. ji bo diyarkirina hest û nestê derûna xwe û desturê ola xwe. bê goman kalên Yarsan bi berhemên xwe dibin helbest û navê xwe û berhemên xwe dikevin nav dîroka wêjeya netewî.

1- Edebiyata ola Yarsan ji sedsalên(10-12m)e , ew berhemên edebî-olî ji wan defter û namane de hatine parastin , ku bi navê(Dewreya Balul) , (Dewreya Baba Serheng) , (Dewreya Şaxoşîn) , (Dewreya Baba Nawis) , tomar kirine , nûsxeyê wan ji pirtûkê(Serencam)de niwîsandine. Yarsanan li ser wê baweriyê ne ku ji dewreya îslamê de , ji sedsala dûyem a hîcrî balulê dana(806m)wefat kiriye , yekemîn kes bûye ku ola Yarsan ji hewraman nu kiriye.

2- Edebiyata ola Yarsan ji sedsalên(13-15)e , girîngtirîn dewreya nû kirina ola Yarsan ji aliyê(Sultan Sehakê Berzencî).pirtûkê serekiyê wê ol(Serencam)e û nivîskarê ew Sultan Sehak e. wan helbestên ku Sultan Sehak û yaranê wî honandine hûnereka serkeftîye û lûtkeya wêjeya ola Yarsan e. ji dewreya jiyana Sultan Sehak gelek pirtûkên din jî hatin nivîsîn , mîna(Defterê Pirdîwerî)ku navê dinê wî(Deftera Dîvana Mezin)e , (Defterê Sawa) , (Defterê Ramyar) , (Defterê Zolal zolal) , (Defterê Gewahiya Xolaman) , (Defterê Şindirwê) , (Defterê Abidînê Caf) , ...

3- Wêjeya ola Yarsan di sedsalên(16 heta destpêka sedsala 20)e , ew qonax dubare kirina bîr û boçunên Sultan Sehake , Tevgera helbestên ola yarsan heya destpêka sedsala bîstem berdewam bû , berhemên girîng ên wan , ew dewre , kelam û dîvane :

(Dewreya Ateş Begî) , (Dewreya Baba Celîl) , (Dewreya Çihil Ten) , (Dewreya Heyderî-Siyêd birake) , (Dewreya Heyas) , (Dewreya Heftwane) , (Kelamê Elmas Xan) , (Dîwanê Derwîş Qûlî Kirindî) , (Dîwanê Zolfeqar) , (Dîwanê Seyid Yequbê Mahîdeştî) , (Dîwana Şa Teymûrê Baniyaranî) , (Dîwana Qasid) , (Kelama Şêx Emîr) , (Kelama Newroz).

#### 3.1.1. Qonaxa Yekem a Helbestên Ola Yarsan

Ew qonax navê hinek ji pîrên Yarsan û berhemên helbestî yên wan helbestvanên pîroz e ku bi destpêka wêjeya olî yê mezin ji dîroka wêjeyî ya kurdî tê hisab kirin.

- Baba Serhengê Dewdanî

Baba serheng kurê Îbrahîmê dewdanîye , ji herêma dewdan , ji navçeya şaxê şahoyê hewremanê lihon ji aliyê jêr bajarê sine ji sala(324h , 935m)hatiye dinya. Sala ji dayîk bûna wî bi vê helbestê hatiye tomar kirin :

*We seney sêsed bîst û çiwar hîcrî*

*Hatîf namê ew ce şaho çirî*[161]

Piştê salanê sedeya çeharemê hîcrî(398h , 1007m)wefat dike û ji gondê tewêla spartine axê , piranî jiyanê xwe ji hewreman bûye. hinek dû beytîyên baba serheng û yaranê wî ji(Defterê dewreya Baba Serheng)hatiye parastin. Ew ku bala mirov dikêşe berhemên dewreya baba serheng hemu bi coreya dû beytiye , û her çar niv dêr helbest li ser yek qafiyene.

*Pey amanitan , pey amanitan*

*Grid amade ban , pey amanitan*

*Ez melhem menye we zamanitan*

*Meresim we heq îmamanitan*[162]

*Wate :ji bo parastina xwe,...*

*Ji bo parastina xwe hemî hazir bin*

*Ez dibim merhema zamê we*

*Bi xwe toleya rêberên we distînim*

Ev helbest wê rastiyê ji me re derdixe ku wê serdemê de gelek hizrên cor bi cor beramber bi ol ji nav îslamê de peyda bûye , ji ber ku dijayetî bi tenê nav desthilata xelîfeya Ebasî nebû ku peyrewê şerîet bû belkî desthilatê jî dijayetî dikir , û pir dijayetiyê ola kevin jî dikirin , ji bona wê em dikarîn bibêjîn ku dema ku baba serheng ew helbest aniye pir dijayetî navbera xelîfeya Ebasî û xelkên şehrezur û hewreman hebûye , û ola Yarsan jî di wê navçe de pir bi hêz bûye.

**- Pîr Şaliyar**

Pîr Şaliyar(Pîr Şehriyar)navê wî xodadad ê kurê camaspe , bi pîrê şaliyarê hewraman navbang der kiriye. yek ji pîr û mezin û peyrewê olî Yarsan e. ji yek ji dest nivîsê Serencam û pirtukê(Dewreya Şaxoşîn)nivîsiye ku , ji dawiya salanê sedsala

---

[161]Xeznedar,Marif ,*Mêjuy Edeby Kurdî,*Aras,Erbîl,2010,r260
[162]h.b., r.260

çarem ê hîcrî(397h/1006m)ji hewreman hatiye cîhanê. ji serdema ciwantiyê çuye ji bo lorîstan li ba şaxoşîn , sih sal li gel wî maye , piştre bi xwesteka şaxoşîn vegeriye ji bo hewreman û mijulê bilav kirina bîr û baveriya Yarsan bûye. zanayeka mezin bûye ji zanistên danay , kelam , mentiq. Di dawiya salên sedsela pêncem a hicrî(492h/1098m)wefat kiriye. pirtuk wî bi navê (Marîfeto Pîr Şaliyar)ku tejiye ji nesîhet û anay , li ba xelkê Hewreman pir pîroze û nîşanî kes naden.[163] ji çavkaniyeka wêjeyî ya Yarsan dû beyît bi navê Pîr Şaliyar hatiye tomar kirin ku , helbestvan di helbesta xwe da bas ji şewitandinê dike mîna bingehê tîrêj û  hewayeka Zerdeştî di helbesta wî de der dikeve :

*Ew ahir xane , ew ahir xane*

*Bargey şam westen , ew ahir xane*

*Zerdeşteş kiyasit , pery fermane*

*Bergwzîdeş kerid , ne ruy zemane*[164]

*Wate :*

*Ew agir xaneye(ateş kede)*

*Melbenid û  bargeha şahê mine*

*Zerdeştê key xesrew xwedî ferman e*

*Helbijarde û  bi teniye ji her serdemek de*

Di vê helbestê û helbestên din ê Pîr Şaliyar de bi aşkera şeklê pêş musilmanêtiyê diyare , peyvên erebî û  lêksîkon(Tebîr)ê musilmaniyê bi ser wî de bi bandor nebûye. Ev jî belgeyeke dine ku ola îslam direng ji navçeya hewraman bilav bûye. Di nav xelkê de diyare ku hewreman heta sedsala yazdem jî hêj li ser olên kevin ê pêş îslamê bûne , ji ber ku Pîr Şaliyar Pîştî Sedsala yazdem bûye ji bona wê jî dibêjin ku(Marifeto Pîrşaliyar)ji qoran kevin tire. ji pirtûkê(Marîfeto Pîrşaliyar)dana , felsef , penid , nesîhet ji nav qalibê dûbeytiyê wî de diyare. ji aliyê kêş ve de sîlabîye ,  rawestan ji nawendiye wekî helbestên diyalêktîkê goran ,  ji aliyê qafiyewe hemiyên nîv dêr ji ser yek qafiyene , risteyên ew kurt û  tonid û pir watene. pîr şaliyar di pirtûka xwe de piştî her dû beytek  , wê beytê dubare dike :

*Goşit ce watey , pîr şaliyar bo*

[163]h.b., r.263
[164]h.b., r.263

*Hoşit ce kiyastey , zanay sîmyar bo*[165]

*Wate :*

*Gwêt le witey pîr şaliyar be*

*Hişê te li ba şulên zerdeştê zana be*

Ew şîrên pîr şaliyar ku heya niha ji destê mene , ji pirtûkê(Dewreya Şaxoşîn)wergirtine.

*Yaran ce rîwas , yaran ce rîwas*

*Padişam peyda by , ce daney rîwas*

*Meşye w meşyane , ber aman ce was*

*Perê azmay , mêrdane rewas*[166]

*Wate :*

*Ey yaran ji rîwas,...*

*Padeşeha min , ji daneya rîwas peyda bû*

*Adem û hewa ji daneya genim hatine*

*Heya ku wan kesan ku ji giyah çêbûne azmu biken*

*Helbest:*

*Werwêwe waro , werwa werêne*

*Werêsa biryo , çiwar serêne*

*Kergê siyawe , hêleş çermêne*

*Hoşlê miryone , diwe berêne*[167]

*Wate :*

*Berfek dibare , befrê beriya xwe ditewîne*

---

[165]h.b., r.264-265
[166]h.b., r.264-265
[167]h.b., r.265-266

*Gorîs ku qedya , çehar ser ji ew peyda dibe*

*Mirîşkê reş  hêka ew sipîye*

*Goze ku şikya do dirgeh ê ew çê dibin*

*Helbest :*

*Daran giyan daren , cerig û  dil bergen*

*Gahê pir bergen , gahê bê bergen*

*Kerge ce hêlên , hêlê ce kergen*

*Riwas ce riwas , wergê ce wergen*[168]

*Wate :*

*Canê daran jî heye , cerig û  dilê wan bergê wane*

*Hin caran bergê wan heye , hin caran jî nîne*

*Mirîşik ji hêk e , û hêk jî ji mirîşike*

*Rovî ji rovîye , gur jî ji gure*

Ew cure  wêjeya netewî ,  hinek ji wan bûn bi gotinê pêşiyan di nav xelkêde , her çawa be ew core jî dahînan ji wêjeya  Sofîzm nêzîke.

**- Şa Xoşîn**

Navê wî yê pîroz Şa ye , nas navê wî Baba Xoşîn e. li sala (406h/1014m) li Lorîstan ji dayîk bûye. Serdema zarokatiya xwe li Lorîstanê  bûye , piştre des bi xwendinê kiriye , piştre ji bo demekî çuye  Hemedanê. Di temenê 22 salî de , dema ku li ser kêwa yafte ji Xorem Abada  Loristanê li gel xwedê monacat kiriye nurê xwedê peyda bûye û çûye cismê wî û bûye  rêberê Yarsanan.ew bûyer  jî mîna bûyera Musa û kêwa ture. li sala (467h/1074m) li geşteka kirmaşan nêzê Hersîn wefat kiriye.Şa Xoşîn di serdema gencî de du beytî dana , li ser avaza tenbûrê li cem xanê de ji aliyê Yaran û peyrewkaran  awaz gotine , helbestên Şa Xoşîn û yaran û peyrewkarên wî kom kirine û

bi navê (Dewreya Şaxoşîn) bi nav kirine. Helbestên Şaxoşîn li çarçuveya îdeolojiya  ola yarsan dernakeve.[169] mînak :

[168]h.b., r.265-266
[169]h.b., r.266-268-269-270

*Yarsan wera ,Yarsan wera*

*Way heq rasîyen ,biranan wera*

*Pakî û  rastî unêweky û  reda*

*Qedem we qedem,ta we menzilga*[170]

*Wate :*

*Ey Yarsanan werine ser rê*

*Rêya heq rasity û dirustiye*

*Hemî divê li rêya rast biçin*

*Gav bi gav heya digehêjine menzilgeh*

Şaxoşîn di wê sirûdê de Yarsan bi oleke rast û rastî dizane û ew rê mirov digehîne  bextevarî  û  serkeftinê , û dibêje ku divê  gav bi gav gotinên olê  bi cîh bînîn.

*Heyderê nazar , heyderê nazar*

*Ez çenî tomen ,heyderê nazar*

*Perê qebale ,mekere înkar*

*Liza kaweroş bigîre qerar*[171]

*Wate :*

*Ey heyderê nazdar û mîhreban*

*Her tiştê heyderê nazdar ji bo min*

*Razên Yarsanan înkar neke*

Liza xanim wê razê  ji wê re dîne û  dibêje

Helbestvan ji wê du beytiyê de li gel hezretê Alî diaxave û dixaze bizanbe ku ew jî neqşa xwedawende.

*Ez çenî tomen , şehriyar bê gerid*

[170]h.b., r.266-268-269-270
[171]h.b., r.266-268-269-270

*Qelay kengawer , ane bê we gerid*

*Dor netay derya , êmey berwarerid*

*Namekey meşye , êmey berid ew ferid*[172]

*Wate :*

*Ey pîr şaliyarê pak*

*Anha qeleya kengawer wêran û pir xobare*

*Ji ew roj ku dor ji derya peyda bû*

*Em jî bi navê adem hetîn ji bo ew gîty*

Helbestvan li wur behsa du buyeran dike , yekem Birca kengawere ku birîtî bû ji bircê, koşk û maleke kevn , parêzgehek têda hebû ku mezin tirîn parêzgeha gîtî bû. Dûyem dor jî , ku yekemîn çê bûyê xwedêye , dora spî ku li wêderê (Hebûn) çê bû. Şaxoşîn di wan dubeytan de li gel Pîr Şaliyar diaxive û dibêje :ey Pîr Şaliyarê pak , Birca Kengawer tirs xistiye dilê gel , bi fermana xwedê hatroxandin , li wê roja ku Gewherê pak çê bû , Adem peyda bû û em jî piştî wî hatin.

*Ey mey bêgerid , ey mey bê gerid*

*Rastîm da we to ey mey bê gerid*

*Rastîm da we to şertim reda berid*

*Namy meşyane êmey berid we ferid*[173]

*Wate :*

*Ey mey kiça pak*

*Ez rastiyê ji te re dibêjim ey mey kiça pak*

*Ez rastiyê ji te re dibêjim û soz jî didim bi reda*

*Hewa em ji dora derya der anî*

[172] h.b., r.266-268-269-270
[173] h.b., r.266-268-269-270

Şa Xoşîn li wê du beytê de li gel xatu mey kiça xwe diaxave , dibêje rasityê ji te re dibêjim û soz jî didim kako reza ku ji rastiyê dernekevim , bi navê meşyane(Hewa) li dora derya derketine.

**- Baba Nawusê Caf**

Navê wî Îbrahîme û bavê wî Ehmed , li gel Yarsanan bi Baba Nawusê Caf hatiye nasîn , yek ji pîrên mezinê Yarsan û çaremîn edgarê xwedêye li ser rûyê erdê , bi gotinê kake rezayî li sala (447h/1084m) li gondê sergeta Hewremana Lihon hatiye dinê , li pirtûka Serencam de hatiye ku baba nawusê caf di destpêka jiyana xwe de xwendiye , paşê dev ji xwendinê berdaye û xwe bi piratîkî mijûlê derwîşî û Sofîzmê kiriye û (Bile Dîn) binav ûdeng bûye , li sala(557h/1161m)li Hewreman vefat kiriye. Hinek du beytî ji baba news maye ku ji pirtûka(Dewreya Baba Nawus) hatiye tomar kirin , mijara wan piranî , nesîhet , penid , gotinê pêşiyan , zanistî û danayî ye.[174]

*Ce wêma ce wêm , ce wêma ce wêm*

*Derd û dermanim , ce wêma ce wêm*

*Liwam we milew desit berdim wenêm*

*Dîm tîry baran keften ew dilîm*[175]

*Wate :*

*Li nav min daye,...*

*Derd û dermanê min li nav min daye*

*Çume ser şaxek û desit xwe birdim ji bo dara nîm*

*Dîtim ku gole baran dibim*

Li wê du beytiyê de baba nawis jî tobe kirinê diaxive , wisa derdixe ku mirov gonehê xwe dizane , divê xwe pak bike , ji bo na wê diçe sar şaxek û destê xwe dirêj î darê dike (nêm)êbêhin xweş , xwedayê mezin wê golê baran dike û dilê wê birîndar dike , bi wî rengî wî ji goneh paqîj dike.

*Ce bê yawery , ce bê yawery*

*Xerîk mendenan , ce bê yawery*

---

[174]h.b., r.271

[175]h.b., r.273

*To wêt bişnasa û biker dawery*

*Îtir çon bawer , we merig mawery*[176]

*Wate :*

*Ji bê yary û meşuqy*

*Ji bê yarî digerim û sergerdanim*

*Tu xwe nas bike û rasityê binase*

*Êdî çawa bawerî bi Ehrîmen dînî û nas dikî*

Şaîr pir rindû sade dibêje,kesek ku xwe nas bike,çawa bavery bi xira dîne.

*Ce seraw serê , ceban û mahy*

*Çenî kolder û gom kerde rahî*

*Şîrîn bîn we mêhman , yek şan we şahê*

*Ferqman nabê ne ruy textgahê*[177]

*Wate :*

*Ji cihê bilenid û şaxek ku bargeha xwedaye*

*Riya xwe li abîd winda kirin*

*Çûne mêvandariya Sultan û şahek*

*Hîç codahiyek navbera me de nebû*

Baba nawis piranî li helbestên xwe de mijulê ezman û cihê bilinde , ew jî ji ber wê ye ku xwe bi canê afirîner **kirdigar** dizane. Her kesekî ku li rasityê bigere bê goman digehêje baregeha Sultan û şa û bi gîştî Yarsanan û ji nav gewhera yekane ditewe(Yekyetiya Bûn).

*Cezaw û sery , ce ko we deşty*

*Ce dily baxy , wêney beheşty*

*Cem bîm megêlyam , pey bext neşty*

[176]h.b., r.274
[177]h.b., r.275

*Ta bîm we hamdem zîwa serişty*[178]

*Wate :*

*Li jorê li çiya û zozan*

*li nav şînahiya beheşit*

*Cemşîd bûm tuşê bextiyary bûm*

*Heya ku bûme hemdemê rind sîriştek*

Li wur helbestvan îşaret li destana Cemşîdê Cem dike , çawa cemşîd bi kiçê genim rengê şahê zabolistan şad bû , baba Nawus jî bi xweşikî û xwezaya şad nu.

### 3.1.2. Qonaxa Duyem a Helbestên Yarsan

Ew qonax berdewam kirina qonaxê yekeme ku şaîrê mezin Şa Xoşîn bû. Ji wî dewrede edebê olî ji pîştir zêdetir pere senid , bi tenê ji roxsar de nebû , belkî ji aliyê navrok jî nimuneya honereka mezin bû.serdesteya şaîranê ew dewre Sultan Sehak bû , qonax jî hemane ji sedeya yazdehem ta sedeya hevdehem.

#### - San Sehakê Berzincî/Sultan Îshaq

Sultan Sehak , kurê şêx îsa , kurê baba Elî yê Hemedanîye , ji navenda duyemîn a sedsala sêzdehemîn (671h/1272m) li gondê berzince ji dayîk buye. Dayka wî xatû dayraka remizbar kiça husên begê cafe. Sultan sehak nujen kirê ola Yarsane , ew ol (Dewreya Îslamî) li balulê danye dest pê kirin , ji nêhrndinên wan balul ew ol anîye kurdistanê û li navçeyên kirmaşan û xaneqîn belav kiriye. ew ol li sedsala sêzdemîn a mesîhiyan belav bu û ji nav çu , û Sultan sehak dîsa rêk xist ,Yarsanan bi çaremîn afirînerê li ser ruyê erdê dizanin **edgar ê kirdigar**.Sultan Sehak li serdema ciwantiya xwe de bi xwendinê re mijul bûye , bi taybet jî di zanista dînî **dnay** , felsefe û wêje yê de serkeftî bûye. ji ber ku birayên wî pir bûne , pişta wefata bavê wî nexweşî di navbera wan de çê bû ye , ji ber wê berzence bi cêh dihêle û diçe gondê şêxan li Hewreman , piştre diçe gondê pirdîwer nêzê şêxan û li wê derê jiyan kiriye . û li navçeyên hewreman û şehrezûr û ciwan ro û çiyayê dalaho û ew henû navçeyên ku diyalogên **diyalêktê** goran hebûye desit bi belav kirina bîr û baweriyên Yarsan kiriye . Sultan sehak ji bo belav kirina ola Yarsan bi piraktî hefit malbat çê kir û her malbat rêxistinek **rêkxerek** bû ye , peywendîyên navbera wan armancên ola Yarsan çê kirine. Malbat jî evin :(Şa Êbrahîmî , Yadigarî , Xamûşî , Elî qelenderî , Mîrê sûrî , Mistefayê , Hacî baveysî). Di sedsalên (17heya19m) çar malbatên din bi navên :(Zenûrî , Ateş begî ,

---

[178]h.b., r.275

Şa heyasî , baba heyderî) çêbûn. Sultan sehak dewreke wî ya mezin hebu ji bo çê kirina barê ola yarsan , ji bo na wî mebest pir kêmasî çê kir û tiştên nu jî xiste nav wê olê mîna girîngî dan bi (Niyaz xane) û (Cem xane). ji sala 13 û 16 m rêxstinên Sultan sehak ji lûtkeya geşe kirinan de bûn. Kalê mezin yê Yarsan ji sed salî zêdetir jiyan kiri ye , li pirdîwer li sala(791h/1388m)wefat kiriye û merqeda wî li wêderê ye. piranî berhemên wêjeyên Sultan sehak ji nameyên (Serencam) de tomar kirine.[179]Yek ji helbestên herî girîng yên wî zat(Bê gawan gawê) ji pirtûka Serencam de çeremîn sirûde.

*Bê gawan gawê , bê gawan gawê*

*Gawê bê gawan , bê gawan gawê*

*Ta ser nesparin , kerde we lawê,*

*Ta heq neşnasin , dur negşit bavê*[180]

Sirûda sêyema Serencam axaftin di navbera Sultan Sehak û Pîr Mîkaîl e.(sirûd bi kamilî ji deftera Serencam).

*Pîre mîkaîl , dewdany mawa*

*Çeny şêx sehak , ker pey dewa*

*Mar kerid we qamçy , siwar bê we şêr*

*Şêriş mêrana we xwazy delêr*

*Siwar by we şêr , rana we hey hey*

*Ta res we leb sîrwany bê pey*

*Awaziş kerid hey şêxy sehak*

*Qebûlim niyen , to ney mawa xak*

*Qebûlim niyen , to ne pirdîwer*

*Bisazy yane , binmany honer*

*Ew roje yar dawîd mesaza dîwar*

*Şah wat we dawîd siwar bo dîwar*

---

[179]h.b., r.276
[180]h.b., r.277

*Biço we rawe , bê xof bê endîş*

*Bizan mîkaîl , aman perê çêş*[181]

*Wate:*

*Pîr mîkaîl ji gondê dewdan ku melbenda wî ye*

*Li gel şêx sehak axaftin*

*Mar kire qamçyê destê xwe û siwarê piştê şêr bû*

*Bi wêrekî bangî şêr kir*

*Siwarê şêr bû bi hey hey kirin*

*Heya gehişte qeraxê zêya sîrwan*

*Gazî kir û got ho şêx sehak*

*Razî nînie ku li wur bimênî*

*Qebûl nakim tu ji pirdîwer*

*Xanî çê bikî û huner nemaî bikî*

*Ew roj dawud dîwar çê dikir*

*Şah(Sultan sehak)bi dawud got siwarê dîwar be*

*Biçe bi rê de bê tiris*

*Bizanbe mîkaîl çima hatîye*

Sultan Sehak diyar tirîn û binavbang tirîn kesê yarisn bû ji dewreya nû de , yenî dewreya piştî îslamê , diyare ku yekemîn wêneya kirdigar ji cismê(Elî)de bû , bi wî rengî jî civaka kurdî de piştî Elî , Sultan Sehak binavbangtirîn sirra wê olê ye.

Berhem û nivîs û berhev kirinên Sultan sehak desturên binçîneyên ola Yarsan e , di aliyekî de peywendîyên civakî yên Yarsanan çê dike , ji aliyekî dinve jî bîr û baweriyên olî ava dike. Sultan xwe bi metiryalên(Zat) , û can(Nûr , Pertew) dizane , cismê hefit kes û nura hewtewane hemî ji cewherê binçîney ye ku(yek)e:

*Wesil û pêwena*

---

[181]h.b., r.279-280

*Ha zat û nurim , wesil û pêwena*

*Newîrma hefywan , zatim hefit tena*

*Zat û nur ce yek , çeşme wêm hena*[182]

*Wate:*

*Peywend bûn û bi yek gihîştin*

*Min zat û nurim her du pêkve*

*Nûr heftewaneye zat hewit tene*

*Zat û nur jî yek çavkanîne*

Di helbesteke din de Sultan sehak li ser bîr û baweriyên cûr be cûr diaxive , li gel wî hêza kirdigar yeke , lê belê cihê xwe li laşên cuda de dibîne û ji serdemq Adem heya niha jî gelek laşan xwe nîşan daye:

*Tasîke nebo , coz nîyen qibûl*

*Her le bawe ayem , ta axir resul*

*Don we donamaymê , osul we osûl*

*Rah yary heqen , pey yaran qibûl*[183]

*Wate:*

*Eger navik nebe cewîz ji tone*

*Ji baba adem heya axîr peyxember*

*Bi du hew hatîn bi rêk û pêkî*

*Rêya heq pişta me ye , ji aliyê yaran ve hatiye qebûl kirin*

Di helbesteke din de behsa wê dike ku canê Elî hetiye laşê wî de :

*Xolaman waye , xolaman waye*

*Pey rojî baqy , niyanman waye*

---

[182]h.b., r.284
[183]h.b., r.285

*Recaw rezaw remiz , neşo we zaye*

*Asimana morxa , zemîna haye*

*Sitarey mezyo , ne camey xorşîd*

*Pîşşany heyder , cay bîm we omîd*

*Her du cifit we hem , wêney madew ner*

*Madiş binyamîn , neriş qenber*

*Desturê aman , perê girdîşan*

*Şokr û fikir û zîkir , we xwacay wêşan*[184]

*Wate:*

*Mensûbeya me wisane*

*Daxaziya me ewe heya roja qiyamet*

*Rîca û rezamendî û remiz bi firo neçe*

*Ji asîman de çun û ji zemîn de runîştin*

*Sitêrka run di laşê rojê daye*

*Cîlweya heyder cihê hîvîye*

*Her du bûn bi yek mîna nêr û mê*

*Mê binyamîne nêrjî qenber e*

*Fermanek ji bo hemiyan hatiye*

*Şokir û fikir û zîkir ji bo morşîdan e*

Di helbesteke din de Sultan Sehak behsa çil kes , yanî çil per û dawud dike :

*Naz reway yaran*

*Hosêny şehîd , naz reway yaran*

*Tohfey ecuz renig , tebrêz şaran*

[184] h.b., r.285

*Qerînit nîya , hewar hewaran*

*Dawud ser qetar , çilten çilane*

*Şefeq kêş subih ke bû nîşane*

*Sobih û  ro rengin , cew ray dêwane*

*Hewalen baro , pîrwey mekane*[185]

*Wate:*

*Naz kirin şayêsteya yaran e*

*Hosênê şehîhd , naz kirin şayêsteya yaran e*

*Nextîney zemîn bjarê tebrîz e*

*Mina te li tu derê  nîne*

*Dawud pîş ketiye , çil kes jî li nav avêne*

*Şeweqê sibahî rê nîşan derê wan e*

*Sibahî û  rojhelat rengê rind ji xwe der dixen*

*Kalê mezin diçe ji bo wê derê*

Di helbesteke din de Sultan sehak, behsa hewtewane dike , di rastî de hewtewane hewit yarê Sultanin ku alîkarê ew bûn ji bo birêv birina alîyê canîyê ola Yarsan , hewtewane ev kesin:(Seîd Mohemedê Gewre Siwar , Seyîd Ebolwefa , Seyîd Baveysy , Mîr Sûr , Seyîd Mistefa , Şêx Şehabidîn , Seyîd Hebîb Şa).

*A dergaw perde*

*Xolaman nîgayker ,wêl keran herde*

*Ce siry qodret , ce rengîm kerde*

*Biyay sacy nar eygam awerde*

*Xolaman wêl newan , ê seraw perde*

*Saznam hefit nur , cam bê gerde*

[185] h.b., r.286

*Ce ezel mêrdan , ser pêş siperde*

*Ew der û  perde*

*Xolaman dîqet biken li wê derî û perde*

*Bila menzere peyda bin belkî ji şaxê rê winda bikin*

*Min sacê awir ji we anîme*

*Bila xolaman ji wê derê perakende nebin*

*Çê kirina hefit nur mîna oleyeka bê gerde*

*Ji ezelwe biryar ji ser dane*[186]

Wate :

Cem xane û niyaz xane wekî baregeh û parêzheha yarsanane , û dewreke mezin dibîne li bi cîh anîna desturên piratîkiyên wê olê , Sultan sehak di jiyana xwe de pir girîngî daye  kombûna olî , li ser wê mijarê dibêje:

*Êbrahîm yekta*

*Ce hefit û  heften , to meny yekta*

*Yekta kes nîyen , we wêmen aga*

*Eîne arimay , ezely bîya*

*Destê cem ce min , qodretiş bîya*

*Rence dil newy , wêm kerdim eyga*

*Cem qîblega , yaranim bîyan*

*Xase xolaman , ne comle eşyan*

*Her kes ne cem de , ne pîr û  erkan*

*We rasit bigêro , damanê Sultan*

*Ane heqîqet , mîr , dîyarîyen*

*Ce rojî hîsaw , ay we diyarîyen*[187]

---

[186]h.b., r.278

*Wate:*

*Êbrahîmê tek û tenê*

*Ji hefît û hefît ten tu bi yektayî maî*

*Tu kesek yekta nîne ez agehdarim*

*Ewe destureka ezelîye*

*Destê cemxane ji bo min ji qodreta wê bû*

*Dilê te nerence min bi xwe ew biryare dame*

*Cemxane qîbleye , yaran werin*

*di nav hemîyan xolaman(Yaran)werin*

*Her kes ji cemxane ji kal û mezin*

*Bi rastî damanê Sultan bigrin*

*Heqîqet ewe , mêrê mezin diyare*

*Ji rojê hîsab de bêtir diyare*

### 3.2. Helbestên Yarsan di Roxsar de

Wêjeya olî ya Goran de bi helbestên deh heceyî hatiye honandin , ji Îrana kevin de jî raîc bûye. Di zimanê pehlewî de jî asarên (Mîrate) manevî , Eşkanî , sasanî , Zerdeştî , helbestên heceyî hene. ji lêkolîna(Kirîstin sin)zanayê danîmarkî , ji beşeke bendihşin ku li ser jiyana zarokatiya keyqobad û pênc misre e , helbestên heşt heceyî hene , ji lêkolîna zanayê firansevî (Binunîsit) , pirtûka darê asurîk jî menzum e û di nav wê de kiteyên pênc heceyî , şeş heceyî , heft heceyî , heşt heceyî , neh heceyî , deh heceyî , yazdeh heceyî , hene û dibêje ew pirtûk menzum e ku li dema Sasaniyan de hem zêde bûye û hem risteyên wê hatine guhertin. ji lêkolîna(Ostad pûr davud) Îştiha û gatha menzumin lê wezna wan cudaye , ji gatha helbest yazdeh , û diwazdeh , çarde , Şanzde , nuzde , hecane , wezna helbest piranî ji Îştiha heşt heceyî e û ji nav wan de helbestên deh û diwazdeh heceyî jî hene. bi wî rengî jî zimanê avêstayî , pehlewî û piranî jî diyaloktên mehelî helbestên deh heceyî hebûye. diyalokên kurdî ku diyalokên kevnê Îranê tênhesibandin , helbestên deh heceyî beşeke mezin ya êw wêjeyê ye û hemuyî menzume , destanên evînî û rezmîyê Îran , mîna :Şahname , xisrew û şîrîn , şîrîn û ferhad , nadir name , Behram û golendam ,...bi diyalogên hewramî û diyalogên din yê

[187]h.b., r.288

Kurdî honandine yan jî terceme kirine , hemî deh heceyî û du misrein , her misre jî du cozê pênc heceyî ne û ewqif(Sekinyan) piştî heceya pêncem eynî ji navenda her du misre e. lêkoler û nivîskarên kevin helbestên ku ji aliyê hejmara hece hatine honandin(Fehlûyat)dibêjin.(Şemis ê qeys ê razî) ji pirtûka (Elme ecem fy meayêr eşar elecem)ku ji destpêka sedsala heftema hîcrî nivîsiye dibêje :

Xweştirîn wezin fehluyat e ku bi diyalokên hewramî ye. nameya Serencam jî bi weznê deh heceyî hatiye honandin û ji nêhrandna ehlê heq bi menzîleya wehî ye , û ji nêhrandinê wan telîmatê wê kamil û fermanên wî divê her kesekî ehlê heq peyrewî jî bike û wan kelaman wezîfe , şul her kas ji her dem bi her cure ji her paye û ji her dewre ji jiyan , zaroktî , ciwantî , pîrî , mirin , diyar dike û her ehlê heqek divê ji dema hatine dinê heya dema mirin ji telîmat û fermanên Serencam peyrewî bike û li gel xeyrî heq nebêje û mîna razek ji singê xwe bihêle.[188]

### 3.3. Helbestên Yarsan di Navrok de

Helbestên sedsala dûyem heya pêncemîn koçî ji bo jûr , piranî peyrewê rêbazên Yarsanin , û ew helbestvan jî du destene :

1-Neyarê rêber û peyrewanê yarîne.

2-Peyrewê rêber û yaranê yarîne.

Helbestên sedsala duyem yê koçî heya sedsala heştem yê koçî piranî rêber û peyrewanê yarîne ku piranî helbstên wan xwe dana nasîn e û ji rêya xwe nasyê ji hev peyrewî kirine , û ji hinek wate û navroka de alîkarê hav bûne. ji sedsala heştem yê koçî heya sedsala sêzdemîn piranî helbestên helbestvanên kurd mijarê wan( Xweza , Dildarî , Şer , Çîrok , Efsane , Xoda nasy , Derwîşî )ye. hokarê wê jî bandora nîştimaniyeke xweşik , bîr û baverê olî yê bi hêz , civak , bi vî rengî nepejirandine **neperjane** ku li ser tiştên din biaxvin , û dema ku yek ji wan sitayşê xwezayê dikir , ewên din jî pêşwazya ji sitayiş û wesif wî kesî dikirin. ji mijarê(Derwîşy û xoda nasîn)we ku diçune nav xaneqa û mizgefit , tijî dibûn , û ji wî barê de helbestan dihonin , û her derwîş yan jî helbestvan li serê pîr xwe digot û sitaîş dikir , ewên din jî pêşwazy ji sitayêşa wî dikirin , piranya wan honrawane ku li ser mijarê xwedê nasînê bi rengê dubeytîne.

Desteya duyem , piranî sitayêşê rêberên desteya yekem ku yarî nekirine û ji derxistina sitayiş ecibandine , cureyek ji xweşik bûn bi kar anîne ku kêm kes cuda ji xwe ji wateya wî xweşikî gehiştiye. her wsa jî piranî navroka helbestên wan xwedê nasîye , û rê û revişta taybet yê rêbazê xwe nîşan dane. hinekên din ji helbestvanên desteya duyem di helbstên xwe de , ji navroka xwedê nasî de pêşwazî ji pile û payeya

[188]Sidîq Sefîzade(Borekey),*Serencam Ya Kelamê Xezane ,*Heydery,Tehran,1370.r190,191

xwe kirine. di helbestên wan helbestvanan de mebestê xwedê nasînê dervîşî û bîr û baver û çawa bûna wê rêbazê rojekî piştre derketîye. hinek ji wan helbestvanan jî derketineke ji bo qehreman , lehenig , û serdarên kevin yê îranê , mîna :(Keykawis , Key xesrew , Key qobad , Rostem û zorab , Gîu goderiz , Reham , Menîce) kirine. ji wan diyardeyan de her yek ji wan lehengan yek ji peyrewan û rêberên rêbaza yarî helsengandine û hemtayê hev zanîne.[189]

### 3.4. Felsefeya Yarsan di Helbestên Wan de

Bîr û baverê ola Yarsan li ser binçîneya cûr be cûr çêbûye , ev jî diyar dike ku kirdigar heft cara dihê jêr ji bo zemîn û bi rengê mirov xwe nîşan dide , her car jî çar firîşte(Çar perî) li gel wî dibin. kirdigar li gel periyan de yekitiyeke kamil û bê kêmasî çê dike. li (Deftery tîrey heyasy)de ew mijar bi helbest hatî ye :

*Cibreîl dana*

*Pîr binyamîn , cibreîl dana*

*Duwem îsrafîl , daud dana*

*Sêyem mîkaîl , musa ne mana*

*Çarem îzreîl , mistefaş zana*

*Pêncem hureleîn , remzen we mena*

*Şeşem şentaîl , malik kiyana*

*Heftem îsmaîl , eyut birwana* [190]

*Wate :*

*Cibreîlê dana*

*Pîr binyamîn , cibreîlê danaye*

*Duhem îsrafîle , ku daud e*

*Sêyem mîkaîle , xwe ji musa de nîşa dide*

*Çeharem îzraîl e , bi mistefa tê nasîn*

*Pêncem horoleîn e , remzeka bi wateye*

---

[189]Sidîq Sefîzade(Borekey),pêşu,*Mêjuy Wêjey Kurdî,* ,r44,45
[190]Xeznedar,Marif ,*Mêjuy Edeby Kurdî,*Aras,Erbîl,2010,r250

*Şeşem şentaîl e , bi coreya melek nardin e*

*Heftem îsmaîl e , bi navê eyut hatiye*

Bi wî awayî li ba Yarsanan hêza çêker(Can)ji asiman dibe û(Ceste)ji ser zemîn dibe. li ba wan kirdigar ji bingehê de tenê(Can)e , lêbelê lewra ku diçe nav cesteyên cor bi cor xwe ji qalibên cuda nîşan dide , ji ber ew e bi nav jî mîna leş pir dibe , ji bo mînak ji(Defter ê Pirdîwer)de Sultan sehak di helbestekê de bi zimanê binyamîn(Cibreîl)dibêje :

*Daud rêberen , we şun û şesa*

*Xwacam(qodret)bê , xolam sermes*

*Yaran beyany , şahîd û gewa*

*Yadîm we dergay , xwacay(şentîa)*

*Ewsa padişam , ne deun(ya)by*

*Ne eriz ne sema , ne swreya by*

*Ne zat ne beşer , ne şerit ne qerar*

*Ne lewih ne qelem , ne denig ne diyar*[191]

*Wate:*

*Daud rêber û henarde ye*

*Daud rêber û henarde ye*

*Xwacam(morşîdim)qodrete , min*

*Yaran şahidy diden*

*Beriyê de padişeha min ji(Donadon) , (Ya)bû*

*Ne zemîn ne asiman , ne stêrk hebûn*

*Ne zat , ne mirov , ne zemîn , ne qerar*

*Ne lewih , ne pênus , ne awaz , ne xelikê hebûn*

*Navên(Qodret) , (Şentiya)û(Ya) , ji ola Yarsan de navên kirdigar e.*

---

[191]h.b., r.251-252

Piştî çêkirina heft kes ku(Canê xwedê )ne çil mexluqê din jî çê kir , bi cor , edgar û sîma ku dişibine heft kes. şêx emîr di wê derbare de dibêje :

*Çil şemi , çil çira , çil dane fener*

*Çil gul , çil gewher , çil camy cewher*

*Her çil yekê by , yeky her çil by*

*Sermayey esleiş , şay berze mil by*[192]

*Wate:*

*Çihil mom , çihil çira , çihil kes*

*Çihil kolîk , çihil gewher , çihil camê lolo û morwarîd*

*Hemy çihêlan yekin , yek jî hemy çihilan e*

*Ji bingehê jî şayê mezin û serbilind e*

Ola Yarsan bi tenê mijulê hizrê baş nebûye ji(Bûn)de , ew jî mîna her olekî din hizreke taybet bi xwe hebûye li ser hêza nebaş.bi wî rengî wan jî tiştek mîna şeytanê mosilmanan , ehrîmenê zerdeştiyan û êblîsê olên din heye , lê belê baweriya wan li hember wê hizrê li gel baweriya olên din cudaye , ew jî li ser wê baweriyê ne ku (Melekê Taus)kesekê xêr xwaz û başe , lewra ew kesên ku fermanên xwedê bi cîh nahînin û kesên nebaşin radestê melekê tavus dikin daku ku wan siza bike , bi kirina wî dibe şer ji bo nebaşan , di wê demê de ji aliyekî din ve diruşma xêr û başiyê ye. Di derbarê de helbestvan dibêje:

*Nawiş naus by*

*Zaty şaxoşîn , nawiş naus by*

*Ely morteza , hem keykaus by*

*Xwace eladîn , (melek taus)by*[193]

*Wate:*

*Nava wê naus e*

*Zatê şaxoşîn , nava ew naus e*

---

[192]h.b., r.252

[193]h.b., r.253

*Ely morteza keykaus e*

*Xwace elaedîn melek taus e*

Hemî berhemên helbestên ola Yarsan cuda ji nirxê îstetîkî wekî berhemeke wêjeyî-hunerî dahênan , çavkaniyeke girîng û bi bingeh ji bo zanîna rastiya wê ol û nivîsîna peyda bûna dîrok û geşe kirin û serbûrî bi taybet jî dewreya nû de ku dikeve dewreya ola musulmanî di civaka kurdî de ye.

### 3.5. Sirudên Pîroz Yên Yarsan

**1- Sirudê çêbûna cîhanê:**ew sirud ji aliyê (Xan Elmasê Loristanî) kurê(Mohemed beg ê lorêstanî) honraye sala (1072k)ji loristan hatiye dinya û danerê yekek ji kelamên Yarsane bi navê(Kelemê xan elmas) , (Xan elmasê loristanî)li ba Yarsanan pir mezin e.

*Heft donen beyan bovaçan pêtan*

*Ne heqîqet bizanan melum bo*

*Take ne çînan ve ragey şeytan*

*Ewsa ne lew bê ne ariya bê*

*Ne eriş bê ne feriş cîhan derya bê*

*Mewla ve dor bê dor ve tey derya*

*Ve dor ber ama cîhan kerid mehya*

*Navê wêş niya ve xawendigar*

*Eriş uqoriş û feriş ewsa da qerar*

*Heftad hezar sal tak û tenya ferid*

*Ve ruy delyawe çogan bazy kerid*

*Ne xakî bisat saza cibraîl*

*Ta by ve hem raz xaliqî celîl*

*Evel îcad kerid çiwar melek her çwar*

*Asman zemîn ewsa da qerar*

*Le siry qodret dirusit kerid alem*

*Hefit tebeq ve pişit mahy kerik mihkem*

*Ve siry qodret xaliqy ekber*

*Çehar ceste her çehar awerid ew nezer*

*Modet ehda bêve mabeîn vîyerid*

*Zeratê alem ve xiyal awerid*

*Ferma melekim exy cibraîl*

*Biçin xak barin ez ko serendîl*

*Belkey bonyadî ademîzad keîm*

*Dily ademî vey dinya şad keyim*

*Melekan yek yek daxil bîn we xak*

*Ve hokmî mocîz paşayê bê bak*

*Xak haşa mekerid megreva şîven*

*Aman taqet ademîm niyen*

*Melekan yek yek eriz kerden ve şah*

*Xak ademî mekero haşa*

*Ferma êzraîl ve tab û tacîl*

*To memury xak ve koy serendîl*[194]

*Wate:*

*Heft done werin ji were bibêjim*

*Heya ko heqîqet bizanbin*

*Heya ko naçin bi rêya şeytan*

*Ew dem ne lew bû ne ariya*

*Ne asiman bû ne zemîn , cîhan hemî derya bû*

---

[194]Rostem,Eyûb,*Yarsan*,Melbendê Rewşenbîrîyê Hewreman,Hewlêr,2006,r91

*Xoda(Mewla)dorek bû ji nav derya de*

*Dor(Xweda)ji naw derya der ket û cîhan çî kir*

*Navê xwe kir bi (xawendigar)*

*Paşan eriş , qoriş , û feriş çê kir*

*Heftad hezar sal bi tenê bû*

*Paşan cibreîl xolqanid*

*Heya ku bibe bi hemrazê xaliq*

*Ji desit pêk çehar melaêke qolqanid*

*Ji asiman û zemîn osa qerar de*

*Bi hêz û  qodreta xwe cîhan xolqanid*

*Hefit tebeq cîhan ji ser piştê masy çê kir*

*Bi hêz û qodret û  nihênî*

*Her çehar melaêk ehzar kir li ba xwe*

*Piştê demeka dirêj*

*Xwesit ku mirov çê bike*

*Bi melakê û  cibraîl ferman de ku*

*Biçin ji kêva serendîl ax bînin*

*Heya ku mirov çê bikem*

*Dilê mirov bi wî dinyayê şad bikem*

*Melaîk hemî  çun heya ax bînin*

*Bi fermanê padîşahê bê bak*

*Ax des bi girîn kir û  haşa kir*

*Got ez naxazim bibim mirov*

*Melaîk çun û ji padîşah(xweda) gotin*

*Ax haşa ji mirov bûn dike*

*Padîşah bi êzraîl got*

*To memurî ku biçî û ji kêva serendîl axê bênî*

Bi wî core bû ku êzraîl çu ji bo axê herçend ax razî nebû şîn dikir , êzraîl destê xwe bir ji bo axê û mistek ax bir ji bo padîşah(Xwedawend)u padîşah ferman kir ku ji ax hewîr çê bikin , hewîr çê kirin ji ser şêweya mewla(Elî kurê ebî talîb d)paşan xweda ji tenê mewla xwe nîşan da , melek hemu di hizurê wî zat de amade bûn , yekem(Selman kaka reday ku cibreîl e) , duyem(Qenber ku rêya rast nîşan dide û mîkaîl e) , sêyem(Mohemed ku esrafîl e) , çarem(Ezraîle)ku sîrê xwedê li ba wî ye û mafê can kêşanê deye wî.

**2- Siruda ser sîpardinê:**ew sirud ji aliyê Sultan hatiye honandin , yek ji bingehê ola (Yarsan)ku (Ser sîpardine)ji ser runahiya ew sirud bi rêve diçe.

*Bê gavan gavê bê gavan gavê*

*Gavê bê gavan bê gavan gavê*

*Ta ser nesparin kerde ve lavê*

*Ta heq neşnasin dur ne gişit bavê*

*Her serê nelo we hizur cem*

*Nesenco we des xelîfew xadem*

*Bê şik ew sere ve tomar nîyen*

*Ne rojê hesaw ve şomar niyen*

*Tomar pîr musa qelem baqiyen*

*Cem çilane binyam saqiyen*

*Rêber davîden des daman gîr*

*Tekbîr çy batin binyamîny pîr*

*Coz ne kejnîj ereq binyam ereq binyam*

*Averden we cem perê sere*[195]

Wate:

Di vî sirudê de(San sehak)behsa girîngiyê (ser sîpardin)dike û bi aşkere ji yariyan re dibêje :heya ku ser siporde nebin mîna (Ga)yê bê gavanin , û ji hev dûr dibin , her Yarsanek ser nekêşe nav (Cem) û ji xizmeta (Xelîfe û Xadem)neyê qebûl kirin , ew kes ji nav deftera pîr musa ku her dem qelemê wî baqîye nayê hesibandin , li wur (San Sehak) behs li çawa beş kirina erkên dînî ji nav hevalên xwe dike û serkeftinê wan nîşa dide , û dibêjê ku (Binyamîn) rêya rast nîşan dide û evna xweda perestî dide bi runiştinên cemê , (Dawud) rêberê Yarsanane û ji bo wan tika dike , û (Çihêlten) mîna perjînekêne ji bo wan , (Pîr musa) defter û heq li gel (Xatû rezbar)e û (Naz) jî dane (Bawa ydigar) , û gûz ji kijnêja xwêydana binyamîn çêbûye ,dema ku dînine nav civatê divê bişkînin postê wî cuda kin û nawê wî (Kakil)bidin civat vanan.

**3- Sirudê Telqîna Mirî:**ew sirûd ji aliyê(Hac nîmetolahê cîhun abadî)hatiye , ew kurê(Mîr baramê mukrî)ye , sala(1288k) li gondê(Ceîhun awa)hatîye dinê , û danerê yek ji kelamên(Yarsane) bi navê (Kelamê mocrêm) , ji sala(1338k) vefat kiriye.

*Filane kes merden filane kes merden*

*Ya şah amanen filane kes merden*

*Eger gona kar er kirdar kerden*

*Ve dêny yarî hesretiş berden*

*Pena we dergay Sultan awerden*

*We şertê binyam seriş siperden*

*Loqmey helaly heqîqet werden*

*Xeyanet we dîn yarî nekerden*

---

[195]h.b., r.93-94

*We cewz û îqrar dînişan moren*

*Her wêt mezanî we çi desturen*

*Ya şa qebûl ker lale û  ricaman*

*Bogzer we teqsîr corim û  gonaman*

*Rohî filane kes we fanî wiyerid*

*We barê gonah rû we oqba kerid*

*Ya heq nekerî ne kewin ezabiş*

*Her ci biperson îden cwabiş*

*Eweliş yaren axiriş yaren*

*(Pîriş)binyamîn(Şa)ş xavenidgaren*

*Delîliş dawud rahnimay rahen*[196]

Wate:

Filan kes miriye , padîşah aman filan kes miriye , eger ku gonehkare yan her gonehek kiriye li ser dînê Yarsan ked daye , ji bo Sultan(San sehak)hawara xwe anîye û bi merca binyamîn ser spardeye , nanê helal xwarîye û peymana xwe ligel Yarsan neşkestiye , dînê wî bi cewîc muhr bûye , padîşah rîcaya me qebûl bike û  kêmasî û gonehê me bibexşe , ewe ruha filan kese ku bi barekî ji gonehan roja wî bi dawî bûye , xwedayê rastî wî ceza neke , herçend jî ji wî bipirsin ewe bersiva wî ye:(ewel yare û axîr jî yare) , pîr binyamîn û  (Şah)ê xawendkar , dawud rêber û  pîr musa jî defter darê ew qîbleya rastî ya(Perdîwer)e , roja axîret(Xatû rezbar) rîca kar (Şa îbrahîm)dest gîr û (Yadigar)yawerê wî ye , penah gehê kesên baş(Cem)e û  roja pirs kirin ji wî (Heft ten)yarê evin , rêberê her kar(Heftwan)e (Çil ten) jî rênîşantî  dikin.

**4- Sirud ê Mirî Şuştinê**

*Pey xesly meît hazir ve îqrar*

*Ve hokmî ezîz şay xavendikar*

*Ve qelem zerîn pîr musa defter dar*

[196]h.b., r.94-94

*Ve camî êbrahîm ve abî rezbar*

*Ve qedry hîşmet mostefa zor dar*

*Ve nazy eyvet melekey teyar*

*Kerem şoştuş ve aby teşar*

*Pak û  tahîr bûît evel axir yar*[197]

wate:

Li vê derê bahsa erkê olî tê kirin hinek ji behsa(Heften)hatiye kirin , mîna(Pîr Musa defter dar , şa êbrahîm dixwaze , Xatû remizbar , mistefay qabiz) , behs ji wê jî kiriye ku mirîyê Yarsan bi ava (Teşar) paqij dibe , avê (kanî xeslan)ê teşar yek ji cihên pîroz ê Yarsan e , ew av ava kewser a yarsanane.

**5- Sirudê Xwe Şuştin**

*Ve watey mêrdan xerqey nur newer*

*Awim teşaren qîblem perdîwer*

*Ve camî îbrahîm oley cîhan bîn*

*Ve îqrary şerit şah binyamîn*

*Ve rezay davîd rehnimay rêber*

*Ve notqy nefes musa qelemzer*

*Pak û  tahîr bûm je pa ta ve ser*[198]

Wate :

Bi gotina kesên ku paltoyek ji runahî ji ber xwe kirine armanc(Kal û xelîfeyên Yarsan)e avê min ji teşar û qîbleya min perdîwer e , bi camê Îbrahîm ku ola cîhanbînî ye û  bi mercê binyamîn , û  rezamendiya dawud ku rêberê nîşanderê rêya rast e , bi gotina musayê qelem zêrîn , bi avê(Rezbar)ku xatunê roja mehşere  ji serî heta piyan  ez  paqij bûm.

[197] h.b., r.97
[198] h.b., r.97

**6-Siruda Pîroziya CemûNerîtê Cem Ango Civatgirêdan**

*Qîbley yarane qîbley yarane*

*Cem kebey şerîf qîbley yarane*

*Cem xezeb bexşen rehmet waranen*

*Cem yorty kirdar niyaz daranen*

*Cem xetmî temam dûaw amînen*

*Cem ne biyay şon pîr binyamînen*

*Cem davîd rêber her weqtê tengen*

*Bacien sed dînar her kes yek rengin*

*Cem sîfet sermeşiq pîr musa pîren*

*Cem qewil û qerar desit destgîren*

*Cem rengîn rezbar xidmet we desten*[199]

Wate :

Cem qibleya yaran û kebeya şerîf e , cem acizî û nerihetiya mirov dibe û lêborîn çê dike , cem ruha niyaz darane û çêkera nîza û rîca kirine , cihê lingê(Pîr binyamîn)u ji dema kêmasîde amade bûna(Dawud)e , cem sîfetê pîr musa û wê de û soza dest girtîye , cem rezbara rengîn û fetwayê vexwarina şerbeta sermestane , cihê niyaz û şikestina gûzên ser sîpardine , mizgeftê yaran û cihê çareser kirina arîşeyane , cihê(tesbîhat û hu hu)kirina riya rastîyê Yarsanane , cihê hizir kirin û qelayê yarî û penahgehe , her dem ku hewce be cem cihê emir kirina padîşah û kalan e , cihê axaftina kesên nexwendewan û dibistana wan e.

**7- Sirudê Nerîtê Qurbankirin**

wê sirudê jî ji aliyê (Xan elmasê loristanî) ye :

*Dostan qurbanî dostan qurbanî*

*Biwaçim adab ayey qurbanî*

*Temam teyar ken cemy Sultany*

---

[199]h.b., r.100

*Qewil rojî ezel şahy merdany*

*Xorid nosedy dey sipay şaxoşîn*

*We eşqê dawud çenî binyamîn*

*Ne wextê tengy pey refê bela*

*We naçar qorban bikeron sela*

*Ew perê oqba kerdiş natawe*

*Ji comle rişwe pêşkeş hesawe*

*We alemê weş hosnê rezay dil*

*Mebo bikalîn tom perê hasil*

*We yeqîny pak we sîdqy îxlas*

*Ewen qorbany pey roy îltîmas*

*Ewel cobreîl qoç ne xeyb awerid*

*We cay îsmaîl qurbanîşan kerid*

*Îsmê ew qorban meşhuren ne alem*

*Îsmiş mesano comley xas û am*[200]

Wate :

Hevalno werin pêkve siruda qurbanî bixwînîn û civata Sultan kamil bikin , li dema teng destî û ji bo na dur bûn ji belayan qurbanî bikin , qurbanî nabe mîna rîşe ve ji cihê tiştek be , û divê bi baweriyeke temam qurbanî bibe lewra ewe dibe berhema paşa rojê , bi niyeteke pak û bi dilsozî qurbanî bikin , yekem qurbanî ew bû ku cibraîl ji alemê xeybê de berxkek anî û ji cihê (Êsmaîl) qurbanî kirin , û ew qurbanî li dinê bi nave û roja dehema meha zy hecê ye , duyem qurbanî jî kele zer û goştê wê masiya ku san sehakî berzencî bi pîr mîkaîlê dewdanî de xwar.

[200]h.b., r.102-103-104

**8- Siruda Sitayşa (Hezretê Elî Korê Ebî Talib):**

*Ewel axir yar ewel axir yar*

*Biwanem senay ewel axir yar*

*Yar yenî mewlam sahîb zolfeqar*

*Ostady ezel ce ber ta be bar*

*Mîmary kewnîn sema sê w çiwar*

*Semay çehar melek peyky peyxam ar*

*Yek lome nury wera nam xore*

*Qerarda ne ruy sema çwn goher*[201]

Wate :

Sitayş ji bo yarê pêş û paşê min , yar yenî mewlam ku sahîbê(Zolfeqar)e , xalîqê hemî zemîn û deryayan e , xalîqê her dû cîhan û asîman û her çar periyên peyam bir û peyam dîne , ew heman runahîyê mezin e ku ji asîmane û ji wî re dibêjin(Tav),

Ew rûnahiya heyv û hemû sitêrkan e ku şeva tarî runî dike.

**9- Sirudê Sitayşê(Bawa Yadigar)û Rîca Ji Wî**

*Yadigary yar , yadigary yar*

*Dexîlen aman yadigary yar*

*Ya zaty zat pak serdary serkar*

*Nazy naz rewac je perwerdigar*

*Çilaney çil ten sebiz poş nur poş*

*Seraney baqy têj hoşy têj goş*

*Rewacy her dîn ser helqey şahan*

*Cemşîdi cem ben şon bery rahan*

*Êre cê yehya siyavehşy key*

[201]h.b., r.106

*Hoseîny şehîd ne kerbela tey*

*Alî qelender tahîr qelender*

*Heny çêş waçwm pury eskender*

*Yadigar dexîl to tacî şahy*

*To tacy tac bexiş cîhan nemay*

*Yadigar we heq Sultany sercem*

*We îsmy Sultan sed hezaran kem*

*We heqê dawud rêberen we nur*

*We heqy îsa , musa kuhy tur*

*We şay beze mil pîry rengînen*

*Pîr ew şahen îsmiş sengînen*

*Metleby hacet farix rewa ker*

*We sahîb kerem Sultany serwer*[202]

Wate :

Yadigarê yar destê min bigre , ey yadigarê serdar û serkar , ey kesê ku li ba xwedêya mezin nazê te heye , ey kesê ku kesik li ber xwe kiriye û nur li ber kiriye û hiş û gohê te tîje , ey gêşe pê kera hemiyê olan û serokê hemîyê şahan , ey cemşîdê cem û îrecê yehya û siyaweşê kiyanî , ey huseynê şehîd li kerbela , ey Elî qelender û tahîr qelender , her çi qas ku pesnê te bikim kême û tu zêdetirî û korê (Eskender)î. ji dêrên dawîyê sirud jî nîza heye :ji ber xatirê meziniya(san sehak)û pîrên mîna(Dawud) , peyxemberanê wekî( Îsa û musayê kêwa gur , li ba Sultanê jor ve xwesteka min bi cîh bîne).

**10-Siruda Sitayşa (Dawudê ku Swar-Dawudê Rêber)**

ji navenda sedsala heştemîn ya koçî li gondê(Dewdan) hatiye dinê û li wêderê jî xwendiye piştre çuye ba (San Sehakê Berzency) û yek ji wan kesan bûye ku pir karîger

[202]h.b., r.107

bûye ji bilav kirina ola Yarsan , duyem periya serdema (San sehakê berzencî) û rêberê Yarsanan bûye ji bo rêya rasit , ji serdema (Hezretê Elî) de qenber bûye û di bingeh de (Mîkaîl)e.

*Feryad res davêd feryad res davêd*

*Ve kolê Yarsan feryad res davêd*

*Eşxasy dêvan zebir desit davêd*

*Çerixçy cîhan şêry mesit davêd*

*Teberzîn be desit mîr şikar davêd*

*Mehremy esrar sahîb kar davêd*

*Cay hana dad res sobih êîvar davêd*

*Melek moqwreb davêd*

*Qahir we hoş û  cîlodar davêd*

*Hamrazy yaran berde bar davêd*

*Perê Yarsan recaçy davêd*

*Sahîby şeş per exmaçy davêd*[203]

...

Wate :

Dawud feryad resê Yarsanane , cîhanê dizşvirîne û mîna şêrê sermeste , tewêr weşîn û mîrê rawçîyane , nihênî parêz û xwedî kare , perest geha sibe û êvaran e û periya nizê xwedawende , hem razê(sırdaş) yaran e  ji wan re rîca kare , teyra seher xêza asîmane û agahdarê nihênî ye , bîlalê hebeşî bangder û serdar û pêşreva roja aşkera bûne , nihêniyê pir tirsnak li ba wîne , dost û dujmina ji hev cuda dike û ji kom kirina yaran de pêşenge , bijîşkê nexweşan û jiyan bexşê wane , hevalê civatvanên pak û hem razê û hem hizrê (Binyamîn)e , penah gehê yaranê birîndar û şadî bexşê derwîşan e , bi dî hênera daxwazîya min (mebesit ji min ew Yarsane ku ew sirud dixwîne) , ji gonehkaran beşxşindeye , ji bo kesên hejar destgîr û runahîya dilan û ji bo xwedayê mezin xolamekî dilsoz e , anha dilê min teng e û ji te rîca dikim , tu rîca karî Yarsananî li ba (Xwedawenid) û arîşeya yariyan nahêlî.

[203]h.b., r.108-109

### 11-Sirudê Elî Qelender li Ser Rihên Xwe Yên Curbecur

(Alî qelender)sala(838k)li navçeya Dalaho hatiye dinê , zarokî wî dane ber xwendin û çend salek mijulê xwendin bûye , hatiye gondê(Şêxan) û li wêderê dirêjahî bi xwendina xwe daye , piştre çuye bo (Bexdad) û mîna rêberekî dînî rê nîşa derê Yarsanan bûye û li (Bexda) jî hatiye koştin , piştî koştina wî du kes ji yaranê wî bi navên (dede elî û dede hosên) bi navê(elî qelender) ve bingehek ji bo Yarsan çê dikin.

*Ew koy serandîl ew koy serandîl*

*Alînan alî ew koy serandîl*

*Ji gah senden beyanî zelîl*

*Habîl biyanê koştim kerid qabîl*

*Ser wêm senden ser wêm senden*

*Aliyan alî ser wêm senden*

*Peykerey camim hîç kes newenden*

*Cemşîd biyanê cem wêm benden*

*Girdê donawdon girdê donawdon*

*Amaîm don we don bigendîm ew şon*

*Îrec biyanim pur fereydun*

*Mesty mey noşen mesty mey noşen*

*Alînan alî mesty mey noşen*

*Her wexit ke cîhan we hem mexroşo*

*Çakey naw dem da yasaqim kêşo*

....[204]

Wate :

Ez (Aîm)e û ji kêva(Serendîl) de pile û payeya min bilenid bû , min dixwesit ku qurbanî bikim û li dergeha yezdande riswa nebim , lê belê(habîl) ez koşitim û hîviyên

[204] h.b., r.110-111-113

min çal kir , (Cemşîd) bûm û min ji xwe re koma (Cem) çê kir , dixazim(cur be cur)iya rûhê xwe ji bo we bibêjim , ez ji desit pêkê de (Îrec ê kurê fereydun , bûm , ez(Alî) mest û bê hişim , Ezman û erd pêkve jî hat û çune û ez jî (Siyaweş)im û xuna min dikele , serê min ji ser laşê mine û ez bi agahdarim , bila hemû kesên mezin bên û şehadet bidin ku ez huseyn kurê (Şahim-hezretê elî) , me alim e û laşê min bê sere û ji destpêkê de ji bo xemgîniyê çê bûme , ez (îmam hisên kurê heyder im) şa bûye mêvanê min (mabesit şaxoşînê loristanî)ye , Nehsed qelender li gel îw bû û wê demê ez baba tahîrê hemedanî bûm , alîm e û ketime kêva (besevy) û birayên min li gel min dojmnatî kirin û ji wê demê ve ez (yosif kurê yequb) bûm , ez aîm e û ji her der ku heq binalîne ez hazirim , bi fermana mezin û serwera ez ku xalîqê zemîn û derya yê anha ji laşê (Bawa yadigarim) , yadigar û sinduqa min tijiye ji (Lel û gewher) û beriya hemû mîran gehiştime bajar.

### 12-Sirûdên Zewcandinê

Ew sirud ji aliyê pîr musa ve hatiye honandin. pîr musa sêyem firîşteyê(perî) dema (San sehak ê berzincî)ye , ji serdema (Hezretê Alî kurê ebu talib d) , (Hezretê mohemed d) bûye , û ji bingah de(Êsrafîl)e.

*Ney cem we heq şer*

*Ney cem we heq şer*

*Heq we heqîqet negirdîn pakter*

*Îna wanaman dûay ey mezher*

*Dûay helalî cifit made we ner*

*Pey îşwe fany çey dam we beşer*

*Mecy ney du dam kafur we tenker*

*Ney camê dinya mezîm we sefer*

*Camê faniyan rengînen çun wer*

*Renig der we renig jwane çun tîter*

*Ridoy mêrid kero cey pîle gozer*

*Ta zemaw wêwê bero pey teşter*

*Take hunu goşin neweroş semer*

*Ta ke mêrdaniş wêl newan çey ser*

*Ta kesê nebo ce şaba xeber*

*Ta we ser beyan melan çey hezer*

*Hem cey rawbere bizawêm we ber*

*Ta tom pakî peyda bo ce ser*

*Ce seraw baqy cey fany mewram*

*Barîkter ce mu rengîn ter ne cam*

*Ney mezew esel şîrîn tir çî tam*

*Yanî helalî ciftan mebo jam*

*Pey ole maçmê pey xomarê zam*

*Mewo raberan ta we ser dewam*

....[205]

Wate :

Her mê û nêreka Yarsan dibe ku gihîştine temetê balêx bûn bizewcin û xêzan çê biken , wî karî jî ji bo na dewam kirina regeza mirov e ne ji bo hewes , jin û mêr divê her dem li gel hew rastbîn bin , û divê zarokên baş perwerde bikin heya ku ji bo civak sud bexiş bin , divê xwe dur bigrin ji kirdar ê nerewa , her Yarsanek serspordeya be nabê ji wê malbatê jin bixwaze , ew kiç û kur ku dixazin bizewcin pêwîste ku biçine cem û peywest nameya jin û mêrayetyê girê bidin , pêştî encam dana Nerît seyîd wê sirudê ji bo bûk û zawa dixwîne û ji wan re şîrove dike , û wan ji bo xweda perestî , pak bûn û bihevre jiyan kirinê nesîhet dike.

**13- Siruda Çaar Bingeha Serekiya Yarsan ku Birîtîne ji (pakî , rasity , bexşşendiy , xwe newîstin)**

*Bawery we ca bawery we ca*

*Yary çiwar cêşin bawery we ca*

*Pakî û rastî û nîsity û rîda*

*Mebo bari wêt sok key ce donya*

---

[205]h.b., r.114-115

*Çunke ey donya cagey biwaren*

*Ga serew ban ga serew xiwaren*

*Mebo we pakî w we rastî û rîda*

*Girid wat wêtan nîsit ken pey hoda*[206]

Wate :

*Her kes ku Yarsan be ferze ji ser ew :*

*1-(Pak)be , pakî ji(Cisim û derûn).*

*2-Ji nêzîkatiyên xwe da rasit û dirusit be.*

*3-Bexşinde û ji bo bi desit anîna rizamendiya (Xweda) alîkariya gelê feqîr bike.*

*4-Xwe hecibandî û mexrur nebe û li dû hewaya nefsa xwe nekeve.*

**14-Sirudên Nizay a Teyemom**

ji cihekî de ku av pêwîsit nebû ji bo xwe paqij kirin , Yarsanan dikarin(Teyemom)bikin. bi wî rengî ku her du destê xwe dixin ser erdê û bi başî ax bikeve nav lepêkê wan û nizayê (Teyemom) bixwînin.

*Werdim ey torbet pakiyê mether*

*We yad koşik padişay perdîwer*

*We şertê îqrar ew ehid binyamîn*

*Malam ey turbet we suret temam*

*We reday dawud xawen koç û gep*

*Kefê des malam piştê desê çep*

*We qelem zerîn pîr musa îxlas*

---

[206]h.b., r.116

*Kefê des malam piştê desê ras*

*We xîdmet kirdey pakê pîr rezber*

*Pak tahir bûm ce pa ta we ser*

*We eşiq padişay pak bê zewal*

*Pak û  tahir bûm ce ahu xeyal*

Wate :

Bi yadê koşkê padişahê perdîwer(San sehakê berzencî) , bi merc û biryar û peyman ê binyamîn , bi xerqeya (Dawud) xwed yê gotin û kelam lepikê destê rastê xwe bi pişta destê çep da dînim , bi pênûsa pîr musayê dilsoz lepika destê çepê xwe bi pişta destê rastê xwe dînim , bi kirdarê pakê pîr rezbar ji serê xwe da heya ku piyê xwe paqij û temîz bûm , bi xweş wîstina padîşaha pakî û herdemî ji qirêjî û endîşeya xirab paqij bûm.

**15- Siruda  (abidîn ê caf)ji ser girîngî dan bi çavkaniyê bijêvê jiyanê**

Ew sirud bi Mebesta nesîhetê hatiye honandin.

*Yarim fermuy dar binêjin*

*Qisey xas ken her xas bêjin*

*Mer û  malat be xêw biken*

*Ta be berşe meşkey biken*

*Seg û  keleşêr rabigrin*

*Be siwary esip rêge bibirin*

*Le tek gêla mebine hawrê*

*Dosy letek gêla nakirê*

*Xotan la den le şokay*

*Ba tiya neçin le xoray*

*Diro meken her ras bêjin*

*Diro çes bo meger gêjin*

*Her kes ebê jinê bênê*

*Bo xêzany xoy binwênê*

*Mindalî baş bexêw bika*

*Neka qisey dizêw bika*

*Le rêgay rastewe birwa*

*Be bawik û dayik heybê birwa*

*Le lecery xotan la den*

*Dinya be lecer xo naden*

*Ewel yare axir yarê*

*We gişit şitê agadare*[207]

Wate :

Yarê min ferman da ku dar biçênîn , gotinê baş bibêjin , ajalên malê bi xwê bikin , heya ku ji wan re îstîfade bigehêje , se û dîk ra bigrin , li gel kesên nezan hevaltî nekin , nezan hevalti yê nizane , xwe ji bela dur bikin , heya ku zerer negehîje we , direw nekin û her dem rasit bibêjin , mirovê aqil direw nake , her kes divê bizewce û ji bo xêzana(hevjîn) xwe , xwe biwestîne , zarokên aqil perwerde bikin heya ku gotinê nebaş nebêje , û bi rêya rasit biçe , bi bav û diya xwebi bawerbe , ji rezîlî xwe dur bikin , xweda ji her tiştekî agahdare.

### 3.6. Pexşanên Pîroz ên Yarsan

Hejmarê wan(21)e , li vê derê behs li(4) ji wan dikin ku bingehê ola yarî ye (der ketina Xweda ji cesteya mirov û cuda cuda yên ruh).

**Pexşana Yekem:** Beid Hezretî Adem û Hewa îcadiş kerid we înis û ciny îcaiş kerdebê , yenî şeş dewre hen xeyir ce adem sazna we fena kerid , we beid ewan ademiş dirusit kerid ke eşref mexluqaten , ke heq maîl daşit cîlwey zat we beşer bawero we heften çehar ten we xodî heq hem we sîr beyaw tema w xolaman hem be ser yawero ama we donî beşer we zaty mîhmany xeylê aman , ta dewrey(Elî)zat we beşer her dû daxil kerid we dînî şerîet mohemed qerar da , heften heftwane we heftê we du pîr hem we dorey şerîet temam biyen.[208]

[207] h.b., r.117
[208] h.b., r.123

**Wate:** Piştî ku(hezretê Adem û Hewa)wekî birêztirîn can dar xolqanid , (Heq-xweda) xwest ku cîlweya xwe nîşan mirov bide , we jî pir kişand heya dewreya(Elî) ku xweda xwe xistiye nav laşê (Elî) , heften , hefitwane , heftêdu pîr , ji (Dewreya şerîet) xilas bûn.

**Pexşana Duyem :**Beid yawa we donî (Şaxoşîn)we zat beşery hem we dewrey mofeselî kelamiş hen , beid lwa we donî(Baba naul)dû zat mîhmany , we beid liwa we dûny(Baba celîl)we(Baba Serhenig)we(Behlul)we baba bî we derwêş , temam we zaty mîhmany ta yawa we donî(San sehak) , we zat beşery we dewrey(Şaxoşîn)yekdefe we der zerat hem yekdefe menzilî wêş qerar da , we sacî nar dewrey(Şaxoşîn)we jêr sacy nar beyaniş kerid , we heftewane we şikly wez sazy , we her dû hefteke heften we heftewane henin , yek yek remzê darun ke gahy cîsim we zat mewo we du zat , gahy heften gahy çiwar ten gahy sê neerin , gahê yekten ya çil ten.[209]

**Wate :**piştre bi zatê beşerî re çuye li dû (Şaxoşîn) ve , piştre bi mîvanî çuye li dû(Bawa nawus)ve , piştre çuye li dû(Bawa serhenig û behlul) ve xolase baba bûye derwêş bi zatê mêvanî heya ku çuye li dû(San sehak)ve.

**Pexşana Sêyem:**(Alî) arimaş kerid pey şime hem haşa bikeren we kesanê hen beid li î dewre meyo , îqrar baweran we zihury zat we wêm mehmanen mekery ta wedey hezar hen hem zatê wêm hem , zatê Sultanê alem yekrenig mekerom , ew wexit nîşaneş hen , ane hozury hezar hen bayed çîhar nefer hem ewladişan we qodret temam morîdan şeme biwen îne ewlad hem je nur mesazy , ta bo we pîrşan we keşkolê awediwe ewladişa sazna kerdiş we pîry ew çiwar nefer hem zoryetşan ziyad bî.[210]

**Wate :**(Alî) got çima haşa dikin piştî wê dewranê dewraneke din dest pê dike , ez hezar cara xwe wekî mêvan der dixim, ew şev xwe û Sultanê cîhanê yek reng dikim , û dem nîşaneya xwe heye.

**Pexşana Çarem :**Beid le ew dewre zerey zat liwa we(Şaweîs qolî)we tecdîdy ol kerid , baid liwa we(Şah eyaz) , beid liwawe(Mohemed beg) , beid liwawe(Ateş beg)beid(Seîd firzy)we dewrey (Firzy)we ateş zat we hefen we hefitwane , we çihil ten we çilane , ke mam mîhman bê zaty (Firzy)we lay(Ateş beg w seîd firzy)bê , beid liwa we dewrey(Baba heyder)we(Şa heyas)ta hefit pişit mîhman bê , beid liwawe (Zolfeqar goran) , beid liwawe(Seîd heyder)ke meşhuren we(Seîd birake)

**Wate :**Piştre gerdîleya zatim çuye(Şa weîs qolî) ku karî bû olê nu bike , piştre çuye li dû her yek ji (şa eyazê yekem) , (Mohemed beg) , piştre(ateş beg) , (Mohemed

---

[209]h.b., r.124
[210]h.b., r.124

ferzy) , piştre çuye li dû (Bawa heyder û şa heyas) û li gel wan heya hefit cîl mêvan bû , piştre çuye li dû (Zolfeqarê goran) û li dawî de li dû (Seyêd heyder-sey birake).

**Bi nêhrandina wê çar pexşanê ji mere der dikeve ku:**

Yekem mirov ji aliyê (Xweda)hatiye xolqanin û (Hezretê adem) bûye û ji ser şêweya (Hezretê Elî kurê Ebu talêb) , û (Adem) bi rêzdartirîn mirov hatiye bi nav kirin.

Bider ketina roh ji cisim ji bo cara yekem ji cesteya (Hezretê Elî bûye).

piştre ew berceste bûn ji laşê her kîjan ji(Balul maî , bava serhengê dewdanî , bawa nawusê caf , şaxoşînê Loristanî , san sehakê berzencî , Elî qelender , şa weîs qolî qirmizî) da dubare bûye û (Şa weîs qolî)jî bi nû kerê ew ol tê hisab kirin.

Ji qonaxên din jî berceste bûna ruhaniyet û cismaniyet ji derûnê her yek ji (Şa eyaz ê yekem , Mohemed beg , Ateşî beg , mohemed ferzy , Bawa heyder û şa heyas , zolfeqary goran) , paşan ji cismê(Sey heyder bi nav bi sey birake) de dubare bûye.

Li gel her berceste bûneke cismaniyet û ruhaniyet ji laşê (Mirov) de çar firişte û bazneyên (Heften , hewit ten , Heftewane , Hewtewane) û hinek car jî (Çilten) û çilane) bi rêya cur be curên ruh dubare bûne.

### 3.7. Kesayetiyên Girîng ên Yarsan ji Dîroka Helbestên Wan de

#### a- Abidînê Caf

Abidîn kurê nûrolahê cafe , ji sala (720h/1320m) li Şehrezur ji dayîk bûye , xwendina seretayî li ba mela Îlyasê şehrezuryî bûye , piştre zanistên kelam û belaxet li ba mela xefurê şehrezuryî xwendiye , peywendiya wî li gel xwendewan û peyrewanê sofîzm bihêz bûye. Piştre gehiştiye Sultan sehak û bûye yek ji yaran û peyrewanê wî , ji dawiya sedsala (797h/1394m) vefat kiriye. Abidîn yek ji helbestvanên navdar yê Yarsane , zimanê helbstên wî tevlêhewe zêdetir bi diyalektîên kurmancên jêr e , bi sitran jî helbest gotiye , hewil daye ku xwe ji wêjeya netewî û zimanê sade yê gel nêzîk bike , hokarê wî sadeye deng xweşîya abidîn bûye û yek ji tenbûr vanê Sultan bûye , li wê serdemê de korsên gotina siruda olî yê Yarsan bayxdar û pir riziq bûye.[211] Ji dêrek helbest de navê deng xweş û tenbûr vanê rojgarên kevin û derdora Sultan sehak bi wî rengî hatiye :

*Nekîsa , Ehmed , Barbed , Abidîn*

---

[211]Xeznedar,Marif ,*Mêjuy Edeby Kurdî,*Aras,Erbîl,2010,r292

*Ha ferhad , Daud , Şapur , pîr musîn*[212]

Nekîsa û Barbed ji deng xweş û mûzîkvanên serdema xosro perwîzê sasanî bûne. Ewê ku bala mirov dikêşe û ewê ku helbestên lîrykê Abêdînê caf û ewê ku bi kirmancî ya jêrê li ser kêşê heşt sîlabîyê helbesta netewî (Folklor) çêbûye , her çi helbestên din yê diyalektîkên gorane ji destura kêşê helbestê sitran derneketi ye ku deh sîlabîye. li pirtûka (Dewreya abidîn)de beşek ji berhemê helbestên helbestvanan kom kirine. Helbestvan di wê helbestê de behsa li bîr û baveriyeke din a Yarsanan dike , ku roja heşrê , li ba wan roja mehşer li deşta şarezure , ji bo wê ye ku şahrezur axa pîroz ya wane , wekî her oleka din ku her yek ji wan axeke pîroz ya wan heye û li ser wê baverîyê ku roja heşir û neşir û hesab ji ser wê axê dibe.[213]Abidînê Caf dibêje :

*Be pê witey Serencam*

*Le şarezurewe encam*

*Yarim lewê deda kamim*

*Le bade pir deka camim*

*Sarêj deka rîş û zamim*

*heya ku bigehêjime armanc*

*Min abidîny hewramim*

*Dildary cwany xwacamim*[214]

*Wate:*

*Wkî li Serencam de nivîsaye*

*Encam(Heşr)ji şehrezûre*

*Yara min li wê derê ye mizgîn dide min*

*Cama min ji şerab tijî dike*

*Hemû birîn û êşê min sarêj dike*

[212]h.b., r.292

[213]h.b., r.295

[214]h.b., r.295-296

*Heya ku bigehêjime armanc û  hiviya xwe*

*Ez abidînê hewramanim*

*Aşiqê rindiya xwacamim*

Abidînê caf ji helbesteke din de behs li wê dike ku malbend û kes û karên xwe bi cî hêştiye , pişt kiriye navçeya sazan û rû kiriye pirdîwer û bûye bi yar û peyrewê Sultan Sehak :

*Daudim toy , delîl û  pîrînim*

*Emcar sarêş bû , zox û  birînim*

*Ewel û  axîr , şahy dêrînim*

*Hatigim bo bezim , cemy Sultany*

*Kemtiryny kem , bew xolamany*

*Derçum le naw qewmy sazany*

*Wate:*

*Tu dawudê  minî ,  rêber û pîrê minî*

*Hemu êş û birîna min sarêj (sarmak) bû*

*Sereta û dawiya min şaha dêrîne(Sultan sehak)*

*Hatime merasîma kom bûna Sultan*

*ez yek ji kêmtirîn xolamanim*

*di nav xizm û xêşa xweyê sazanî derçum*

*Piştre Abidînê caf diçe xizmeta Sultan sehak , gift û gû navbera wan de rû dide.*

Abidîn dibêje:

*Mela layne pê xoşe*

*Bezmy merdan pê xoşe*

*Binyam saqy lew hoşe*

*Seryan le jêry koşe*

*Werin le niwêj ken tobe*

*Tobey îxlas yek nobe*

*Sehak xoday du sewbe*[215]

*Wate:*

*Mela ewe ji were xweş tê*

*Sewta merdan ji were xweş tê*

*Ey saqî  min bê hiş bikin*

*wan serê xwe kirine jêr solên xwe*

*Werin tobe bikin û nimêj nekin*

*Yek car bi rastî tobe bikin*

*Sehak xwedayê her du bereye(Gîty)*

Sultan sehak di bersvde dibêje:

*Ha qebûl biya*

*Recay ebdîntan ha qebûl biya*

*Dîdem we rehmet penatan dîya*

*Morxom we meîltan we desit ew eşya*

*Ta hemal koliş newero we ca*

*Nimeyan peneş ocret kiraha* [216]

Wate:

*Ewe ez qebûl bûm*

*li siyaa ricaya Abidîn ez qebûl bûm*

*Çavê min bi rehmeta weye*

*Xeta li gel we dimîne*

[215]h.b., r.297
[216]h.b., r.297

*Heya ku xolam barê xwe nebe cihê xwe*

*Kirê renc û ocreta wî nadin*

**b- Şa Êbrahîm Êyut**

Şa Îbrahîm kurê Seyîd Mohemedê mezin siwarê kurê Sultan sehak e , nasnavê olîya wî (eyut)e , (Rocyar) û (Melek teyar) jî dibêjin. li sala (725h/1324m) li gondê şêxan ji dayîk bûye , diya wî xatu zeyneba kiçê mîr xosrewê Loristane , bi zarokatî li xaneqa hatiye dinya yê û mezin bûye. li genctiyê de dersa olî û evînê xwedin ji Sultan sehak wergirtiye. şah Îbrahîm bi emrê Sultan sehak ji bo rêberî kirina navçeyên jêr yên kurdistanê diçe , diçe gelek navçe yan , di encamê de li gondê serane. baba yadigarê anha li wê derê nîştecih dibe , li sala (810h/1407m)li wê derê wefat dike. yaranê şa Îbrahîm ji navçeyên xaneqîn , mendelî û kerkuk (kakey)dên nasîn , evane peyrewkarên bîr û bawerê Yarsanê serdema şa Îbrahîmin. piranî helbestên şa Îbrahîm bi navê (dîwana eyut)ji ber destdaye , piranî helbest bi awaya bend (kople)ye , her bend mijara serbûrî û rudana peyxembereke , pîr , welî , sofî , yê mezin ê , pîrozî yeke olîye. hemu li derdora bîr û baweri yên cur be cur e û bi awayê eîposê efsaneyî waha dibêje. li bendeke din da serpê hatiyên nuh û pêkhateyên tofan ê wa dibêje , ewê ku ji efsaneya kevin û eîposê gilgamîş , tewrat û qoran êde hatiye behs kirin , bîr û baweriyên cur be cur a Yarsan de bi aşkira li wê bendê de diyare , şa Îbrahîm li ser wê bawerîya ku canê wî ji laşê hamî kurê nuh û canê baba yadigar ji laşê samî kurê nuh xwe nîşan duyem , canê ham jî şa Îbrahîm û canê Sam jî , ji baba yadigar derketîye :

*Zolaly koy kam , zolaly koy kam*

*Yadigary min , zolaly koy kam*

*Çaga tofany , mêrdan usit we dam*

*Nûhy nebî by , keşty yo erşam*

*Tîrendaz bîman , ez namim bê ham*

*Kakem yadigar , namiş biya sam*[217]

*Wate:*

*Peywendîya te bi kêwa pakve heye*

*Ey yadigarê min , peywendîya te bi kêwa pak ve heye*

[217]h.b., r.299

*Ji dema tufan mêrên te li ba te bûn*

*Nûhê peyxember û yaranê wî jî nav keştyê de bûn*

*Navê min Ham bû*

*Yadigarê kakoyê min Sam bû*

Şa Îbrahîm li gel bayexdan bi pêkhateyên kevin û bikaranînên wekî remiz (sırr) ji bo şîroveya nehêniyên ola Yarsan , pir girîngî bi diruşmeyên taybet yên wê olê daye. di sirudekî da dibêje :di rojgaranê pêş (kirdigar) , pêykera min sîmorix bû , ji perteva min runahî gehişte çîn , ez pîrê gelê cêhanê hemûyî bûm , Adem û Hewa peykerê min bûn , aniha jî peywendîya navbera afirîner û evd de ezim. Sîmorix li sofîzma Yarsanande nîşaneya kamil buna mirove , sofiyan bi perteva xwedê dizanin û ji qaliba metiryala xwe nîşan didin.[218]

*Yurty minenqa ,yurty min enqa*

*Ne yaney ezel , yurty min enqa*

*Ne qaliby çîn , nûr ez muheya*

*Ced û alemy , ez nan bya*

*Camey ez bya , meşyane w meşya*

*Eygaş ny perde , sikem by rewa*[219]

*Wate:*

*Peykera min sîmorxe*

*Di roja ezelde , peykera min sîmorix bûye*

*Rûnahî û pertewa min , ronahî ye heya çîn*

*ez kalê gelê hemû cîhanê me*

*Adem û hewa peykerê min bûn*

*Ez peywendiya xweda û evdim û rewaca sîkeya min heye*

[218]h.b., r.302
[219]h.b., r.303

Li helbesteke din de şa êbrahîm behs li wê cure don dike ku can tenê li laşê mirov xwe nîşan nade , belkî jî , ji laşê ajal , giyah û tiştên din yê xwe jî derdikeve , di wê derbarê de dibêje :

*Zolaly koy bîd , zolaly koy bîd*

*Êbrahîmnan , zolaly koy bîd*

*Êbrahîm namim , firem by şehîd*

*Padişam piling bê , ne koy napedîd*

*Ha kîşwer biyam , ez namim cemşîd*

*Kakem yadigar , namiş bê xorşîd*[220]

*Wate :*

*pakê çiyayê bîd*

*Ez Îbrahîmim , pakê çiyayê bîd*

*Navê min êbrahîme bilenid û bihêzim*

*Padêşahê min pilinge , li çiyayê nediyar daye*

*Hatime ser rûyê zemîn bi navê cemşîd*

*Birayê min ku yadigare ji nav rojê daye*

*Şa Îbrahîm ji nîzayek de bi vî regî li gel Sultan sehak da diaxave :*

*Şehenşay Şahan*

*Bê mewaw mekan ,şehenşay şahan*

*Agay her du ser , rehnemay rahan*

*Motîolemrîm , ce emir û xwahan*

*Seda ce wêten , ême hebabîm*

*Seda ce wêten , ême rebabîm*

*Ce xomxaney to camey rengaw renig*

---

[220]h.b., r.303

*Poşak yaran bê , şino û bê denig*

*Her kes ne emrit , ber bişo weber*

*Memury cezaş , mistefay dawer*[221]

*Wate :*

*Ey padişehê paişahan*

*Bê cih û bê mekan , ey padişehê padişahan*

*Agehdarê her dû serî (Sereta û encam) rêberê her rêyek*

*Ser ji bo emrê te ditewînim , her emir û xwastek*

*Deng dengê teye , em jî yarên tene*

*Denig dengê teye , em jî destên bihêz nê tene*

*Ji xomxane ya te rengê kincê tene*

*Yaran ji ber xwe bikn bê dengî*

*Her kes bê emriya te bike*

*Memurê dadgeha mistefayê hakime*

Ew helbestvan pir çavkaniyên olî û efsaneyên rojhilatî bikar anîye ji bo darijandina risteyên bi hêz û pir wate ji bo derbirîna bîr û baweriyên xwe , ji wan , serpêhatiyên Îbrahîmê xelîl û yosofê yequbê kenan û sîmorxê ba sofiyên pertevê (Îşraqî) û ola zerdeşit û pirtûka avêsta û cihên pîroz yên Yarsan û hewreman û...

**c- Baba Yadigar**

Navê wî Seyîd Ehmede , nasnavê olî jî baba yadigar e , yek ji pîrê herî mezin yê wê hefit rêkxistinên ola Yarsane ku Sultan sehak bi navê malbata baba yadigar ve ava kir.sala(761h/1359m) ji gondê şêxanji dayîk buye , li ba Sultan sehak xwendina xwe qedandîye , pir girîngî bi teoriyên felsefeya pertewî (Îşraqî) daye , bawernameya temamiya zanistiyan û terîqeta canî ji Sultan sehak wergirtîye. piştre li ser arizuya Sultan sehak ji bo nîşan dana rêya rastî ya(Îrşad) çuye hîndistan û demekî li wê derê maye , piştre vegeriya ye gondê seranê li çiya yê Dalaho li kirmaşan , piranî temenê xwe li wêderê bûye û piştre ji aliyê neyarên xwe ve li wêderê hatiye koştin , ji ber ku piranî

[221]h.b., r.304

temenê xwe li gondê seranê bûye bi seyîd Ehmedê serane jî bi nav û deng buye , li sala (885h/1480m) vefat kiriye. Baba Yadigar nezewciya , ji ber wê jî zarokên wî nebû ne , beriya mirina xwe seyîd xal û seyîd weysel weke cêgirê xwe diyar kiriye. Serpê hatiya baba yadigar wekî hinekên din ji pîrên Yarsan ji efsane yê çêbûye , hemîyên wan efsanane wekî mijara jiyana Mesîh û Meryem e. Lehengên efsane kiçin û zarokê wan çêdibin . Ew buyerana li derdora felsefeya curbe cur dizvirin , ku canê kirdigar yan jî afirîner , ji laşê mirov xwe nîşan dide. Ji bo na we ye ku navê bavê baba yadigar nezanrê ye.[222]Dîwaneke helbest ji baba yadigar bi cîh maye bi navê (Zolal zolal) , ew berhem wêjeya –olî ye li ser bingeha bend (kople) hatiye honandin , her bendek serpê hatiyeke peyxember , welî , sofî , mêrekî mezin e , helbest jî hêsan û rewanin. ji helbestekî de behs li ser pehatia yunisê peyxember dike , ku masî wî dixwe û çil roj di nav zikê masî de nîza û tehlîl dike , baba yadigar dibêje :

*Zolaly koy tat , zolaly koy tat*

*Êbrahîmy min , zolaly koy tat*

*Çaga xolaman , we yek dan sewqat*

*Padişam şa by , namiş bê ewqat*

*Ez yunis beyam , maîm by heyat*

*Kakem a mahê , we xir da qinyat*[223]

*Wate :*

*Ey pakê çiyayê tat*

*Êbrahîmê min , ey pakê çiyayê tat*

*Ji wê demê ku gencan diyarî didin hev(dildarî dikin)*

*Padişehê min şah ê nava wê qat ê*

*Wekî yûnis jiyana min bi masî bende*

*Birayê min hat û min rizgar kir*

Baba yadigar wekî hemî pîr û mezinê ayî na Yarsan pir girîngî bi mûzîk û sitranan daye û wî diyardeya hunerî bi felsefeyên cur be cur ve girê daye , di wê mijarê de dibêje :

[222]h.b., r.310
[223]h.b., r.310

*Zolalê sermesit , zolalê sermesit*

*Yadigary nan , zolaly sermesit*

*Çaga ke xosrew , behram da şikesit*

*We rebik we ferman , xwacekey elesit*

*Barbed ama , ber bety ne desit*

*Sê away Kurdî , pey dildaran besit*

*Ez bar bed bîm , new bezimgay lesit*

*Kakem xosrew by , ne girid bendy resit*[224]

*Wate :*

*Ey pakê sermest*

*Ey yadigar , ey pakê sermest*

*Ji wêdema ku xosrew behram şikest*

*Bi ferman û xwesta xwadaya rojê elesit(Xwedawend) (tanrıça)*

*Barbed(sitran bêj) hat amûra mûzîkê destê wî de bû*

*Sê awazê Kurdî ji bo dildaran got*

*Ez sitran bêj bûm ji wê sewtvana xweş de*

*Birayê min xosrew ji her nexweşiyek rizgar bû*

Baba yadigar ji monacateka xwe li gel Sultan sehak diaxave :

*Çage naziman*

*We nazy mêrdan , çage naziman*

*Wicudit mayey ser feraziman*

*Goşit şineway rêze raziman*

*Her weqit baqîm wat , menzurim to bît*

[224]h.b., r.312

*Ne pêç û penhan , penay du ho bît*

*Her cay to henen , ane baqîyen*

*Şerbet şîfay , desty saqîyen*

*Er asiman bo , eger zemîn bo*

*Padişam meîn amîn mobîn bo*

*Wate :*

*Kes nizane cihê te li kuderê ye*

*Şanaziya mêranî cihê te ne diyare*

*Hebûna te serbilindahî ya me ye*

*Gohê te ji hemû raz û niyazê(hewîn) me ye*

*Ku dibêjim(Baqî) mebesta min tu ye*

*Bi eşkira û nehînî her tu ye*

*Her derê ku tu hebî , ew der baqî ye*

*Tu şerbeta destê meygîra ye*

*Ji ezman heya zemîn(gök ve yer)*

*Padişahê min heye , berçav û eşkireye*

Baba yadigar felsefeyên cûr be cûr de tenê ji buyerên kevin û bûyerên netewî yên Kurdî sûd wer negirtiye , hezretî Elî kurê Ebû Talib mîna peykerê kirdigar dewreye ke mezin ya wî heye , ji bo na wê jî baba yadigar dibêje :

*Şert wêm we ca*

*Yadigarnan , şert wêm we ca*

*Don we don amam , qewa we qewa*

*Îmam hosên bîm , pury şehenşa*[225]

*Wate:*

[225]h.b., r.316

*Mercê xwe bi cîh dînim*

*Ez  yadigarim mercê xwe bi cîh dînim*

*Cûr be cûr hatime , qalib bi qalib*

*Îmam husêyn bûm kurê şahê şahn*

Baba yadigar xwe wekî rêberekî olî yê mezin nîşan dide , wekî helbestvan jî dahurandinê wî , bîr û bawriyekin di qalibên rind de darijandiye û peywendiya wî li gel jiyana ruhî û dîroka ola wan ve heye. bê goman serpêhatiya yunisê peyxember ji nav zigê hut û  çîroka salim û tur çavkaniya  berhemê wêjeyî ye , baba yadigar behsa (Elî)dike ku yek ji afirînerê  mezin yê yarsane piştî dewreya  piştî  îslamê .

**d- Qirmizî(Şaweîs Qulî)**

Şaweîs Qolî kurê pîr Qenberê şahoyî ye , nas navê wî (Qirmizî)ye û bi wê jî bi navbanig der ketiye , ji nameya(Dewreya Qirmizî) li sala (810h/1407m) li gondê derziyan ê navçeya çiyayê şaho ji dayîk buye. Di ola Yarsan de , şaweyîs qolî(Qirmizî) pêncemîn navdarê afirînere  ku li ser zemîn xwe nîşan daye , qirmizî di  zaroktiyê de desit bi xwendinê kiriye û di genctiyê de helbestvanî esas girtiye , (Qirmizî) peyveke azerbaycanî (Torkmanî) ye bi wateya rengê (Sor)e , qirmizî nezewciye û hemî demên xwe ji bo belav kirina bîr û bawerê Yarsan terxan kiriye. di jiyana xwe de malbata (Şamîhman) çê kir ji bo rêberîya ola Yarsan , yar , yan jî firîşteyên wî (Pîr Qenber , Kake Ereb , Kake Rehman , Kake Pîre , xatûn Zerbanu). Çar melekê şa û Sultan ê gîtî ji ayîna Yarsan çar yan jî pênc kesin , eger ku pênc kes bin  , ewê pêncem jine û wekî meryem bê zilam mirovekî çê dike , di laş de mirove û di cewher de canê kirdigare. qirmizî ji sed salzêdetir jiyaye , di sala 920h , 1514m , vefat kiriye , lê belê meqera wî nediyare. pir helbestên renga reng bi navê qirmizî û  yaranê wî bi yadigar maye û ji nameya (Dewreya Qirmizî) tomar kirine. Li du beytiyekî de qirmizî behsa  sê roj rojîyê Yarsan dike , ku (Rojîyê Şikefta newê) jî dibêjin. ji nameya Serencam de hatiye ku (Sultan Sehak) ji berzinc ê ve diçe  şêxan , di rê de komelek ji hozê çîçek rîya wan digrin , Sultan û yaranê wî jî di şikeftek ji şaxê şindirwê , sê şev û sê roj  xwe vedişêrin , roja çarem Sirut aciz dibe û bi reşe ba û tufan , hoza çîçek ji nav dibe , piştî wê Sultan ferman der dixe ku her sal sê roj rojî bigrin ji bo şokir kirina kirdigar ,[226]helbestvan dibêje :

*Yerê roy yaran , yerê roy yaran*

*Her kes negêro , yerê roy yaran*

[226]h.b., r.319

*Er rojê ser car , yaneş nur baran*

*Qebûlim niyem , we cemiş naran*[227]

*Wate :*

*Sê roja yaran*

*Her kes sê rojê yaran negre*

*Her roj jê nûr bibare mala wî*

*Ew kes nayê  qebûl kirin û nabe were cemxanê(civat)*

Qimizî ji du beytiyeke din de şanazî bi kurd bûna xwe dike û  we bi destana kawa yê asinger girê dide , ku bi hêz û tiwanaya gel kariye zordarî û sîtema Dehak ji nav bibe , dibêje :

*Esilmen ce kurd , esilmen ce kurd*

*Ba bom kordenan , esilmen ce kurd*

*Min ew şêrenan , çeny desty kurd*

*Silsiley sipay , zehak kerdim hwrid*[219]

*Wate :*

*Nejada min kurde*

*Bavê min ji kurdane , nejada min kurde*

*Ez ji wan şêranim ku bihêz û  cesur bûn*

*öin Sûpaya dahak ji nav bir*

Li wur qirmizî canê xwe ji baweriya curbe cur  bi canê kawa yê  hesinkar dizane.

Helbestên deftera (Dewreya Qirmizî) bi navê qirmizî û yaranê wî tomar bûne , piranî axaftinê navbera qirmizî û yaranê wî ne bi mebesta ronahîn kirina bîr û baveriya piratîkî ya ola Yarsan e , ew axaftin bi rengê bend (Kople) sê nîv dêr helbest ê , de sîlabî û  yek qafîye ye. dema ku qirmizî ji dayîk dibe , kake pîre gotîye:

*Bila mar bûrîm , ew yaney yary*

---

[227]h.b., r.319

*Padşahan ama , genic ke et şary*

*Ey dad siwarin , nuriş kerid dary*[228]

*Wate :*

*Xozî  ez mar bam di mala yar de*

*Padişehan hatin ,û genc ketine bajêr*

*Ey dad wane siwarin , nur aşkira bû*

**Kake Ereb bersiv dide :**

*Hakima nidar min mo , ew keman sexty*

*Xolam ew kesen , bişnaso weqty*

*Xwaceman ama , ew ser sexty*[229]

Wate :

*Wisa bizan ku ez hatime wê cihê zehmet*

*Xolam ew kese ku erêniya xwe bi cî bîne*

*Morşîdê me hatiye ji bo îw cihê zehemet*

**Piştre Xatun Rezbanu gotîye**:

*Karxaney xwacem , kerid beyny rîzwan*

*Eydaw siwaran , şêtiş kerid xezan*

*Ne pirdîwer darist kes nezan*[230]

*Wate :*

*Beheşta morşîdên me cihê rêzwane*

*Rêzwan û siwaran payîz dîn kirin*

*Kesî  nezanî ku  di pirdîwer de cêgîr bû*

[228]h.b., r.319
[229]h.b., r.320
[230]h.b., r.321

Pîrên Yarsan gotinên xwe bi helbes û awaz , bi lêv kiriye , û ew destur jî ji yayê wan yê destpêkê de ji wan re maye , mezinên Yarsan eger ku nebibûn helbestvan jî , gotin û nesîhetên wan di qalib de bi rengê helbestên diyalektîkî yên sitran hatiye nivîsîn. cuda ji pirtûka (Serencam) a Yarsan , hinek helbest bi zimanê torkemenî hene ku belkî jî , ji zimanê Kurdî vergera wêya torkmanî kirine ji ber ku beşek ji Yarsanan nejada wan torkemenin , lê belê zimanê wan yê fermî jî zimanê kurdîye.

**e- Elî Qelender**

Elyî qelender yek ji mezinê yan jî Rûsipiyê ola Yarsane , di sala (838h/1434m) li çiyayê dalaho ji dayîk bûye , xwendina seretayî li melbenda xwe des pê kiriye , di serdema genctiyê de ji bo berdewam kirina xwendina xwe berê xwe daye Dînewer , piştre çûye bexdad û mijulê rêberî kirina ola Yarsan bûye , piştre li wê derê di sala (889h/1484m) ji aliyê neyarên xwe ve hatiye koştin û bûye qurbanîyê bîr û baweriya xwe. Elî qelender piştî Sultan sehak peyda bûye , di pile û paye de weke şa îbrahîmê eyutî bûye , piştî koştina Elî qelender bi mebesta dewam kirina bîr û bawer û wê rêxistina ku wî rêberiya wê kiriye , du kes ji yaranê wî (Dede elî) û (Dede hosîn) malbata Elî qelender ava kirine. Berhemên Elî qelender yê pir girîng ku ji bo me maye , (Siruda

dûyem) di pirtûka ola Serencam daye. Di beşa helbesta pirtûka pîroz ya ola Yarsan (Serencam) de ku ji (10) parçe helbest (Sirud) çêbûye , siruda duyem ji hunîna Elî qelender e bi navê (Alî qelender wesfê guhertina navê xweda(tanrı) dike). Ew sirud ji ser bingeha bend(Kople) hatiye honandin , (16)bend e , (8 bend) ji wan du beytin (Çarû niv dêr helbest) , sê bend jî (6 nîv bend) helbeste e. Du beytîyên Elî Qelender wekî her du beytiyên din ji derdora hizreke felsefîye , nihêrtina ku daniye , gotinê pêşînan û nesîhet , yan jî pêkhatineke kurt digerin , bê goman ew buyerana ji cewhera bîr û bawerîya ola Yarsan dernakevin , wekî ku di bendên wê sirudê de derdikeve , her bendek serbixwye û peywendiya wê li gel benda pişt xwe de tune , em dikarin bibêjin ku her bendek berhemeke wêjeyî a serbixwe ye; lê belê bihevre jî mîna ewa ku rihekî wêjeya îposî (Merhemî) ji seraserê sirudê de hebe , ji ber ku helbestvan vegeriya ye dîroka pir kevin ya ola ku bawerîya wî ye.Ji adem heya dewreya jiyana xwe , û ji wê dema ku rihê kirdigar ji cesteya mirov xwe nîşan daye , sekiniye , helbestvan ew xistiye qalibeke sofîzmyê kozmosî ku hemuyê wan diyardeyeke civaki ye , siyasî-lahûtî(netewe-çîn-ol)bi hemû arîşeyekî ji nav yek tişit tewîne (Kirdigar).

Elî qelender dibêje:

*Ew koy serendîl*

*Alînan aly , ew koy serendîl*

*Qurbanîm kerden , newany zelîl*

*Habîl biyany , koştim kerid qabîl*[231]

*Wate:*

*Ew çiyayê serendîle (Walatê seylan , sîrîlanka)*

*Bi qasî , çiyayê serendîl dirêjim*

*Min niyaz kirye heya dergeha xwedê kurt nebe*

*Lê belê Qabîl hêviya min bi cîh neanî û ez koşitim*

(Liwêr mebesit ew ku ji vê demê Alî qelender ji dona habîle û qabîl birayê ew wî koştiye)

*Sery wêm sanen*

*Alînan aly , sery wêm sanen*

*Teswîry camim , hîç kes newenen*

*Cemşîd bîyena , camy wêm benen* [232]

*Wate :*

*Serê min Sultane*

*Minê bilind , serê min Sultane*

*Ji wêneya camê min kes negihe*

*Mîna cemşîdim ,camê min beşeke ji min*

*Gerdy donadon*

*Meyo biwanîm , gerdy donadon*

*Amaîm don we don ,bigandîm ew şon*

*Îrec bîyanim , pury ferîdun*[233]

---

[231]h.b., r.326
[232]h.b., r.327
[233]h.b., r.327

*Wate:*

*Cuda cuda kirin*

*Divê bizanbî , cuda cuda kirin*

*Cuda cuda hatim heya wî cihê*

*Îrecê kurê fereydun bûm*

(Mebesit şaîr ewe ku ji donê pêşuyê xwe de îrec kurê fereydun buye , fereydun yek ji padişahê îrane ji şehnameyê fidewsî de)

*Mesty mey noşen*

*Alînan aly , mesty mey noşen*

*Her wexit ke cîhan.we hm mexroşo*

*Çakey naw dem de , ya saqim kêşo*

*Siyawehşenan , hunim mecoşo*

*Qaf ta qaf cîham , we hem mexroşo*[234]

*Wate:*

*Mestê vexwarina mey me*

*Minê bilnd , mestê wexwarina mey me*

*Ji dema ku cîhan hemu dixroşa*

*Her tişit ji min yasax buye*

*Mîna siyaweş xuna min dikele*

*Ji qaf heya qaf ( ser ta serê zem gîty hemy dicoe)*

*(Mebest ew ku şaîr ji dinyayê xwe ku îrfane tijiye)*

*Ew teşty tela*

[234] h.b., r.327-328

*Sê donim çîyen , ew teşty tela*

*Ewel siyaweş , diwemîn yehya*

*Sêyemîn hoseîn , pury şehenşa*

*We teşty tela , kerden nexçîrim*

*Coda kerden , resy monîrim*[235]

*Wate:*

*Ew tiştê zêrîn*

*Sê ruhê min çuye nav wê tiştê*

*Yekem siyaweş , duyem yehya*

*Sêyem husênê ku şahên şaha*

*Nêçîrim ji nav tişta zêr danaye*

*Serê min yê pîroz hatiye jê kirin*

Elî Qelender felsefeya ola yrisan bi şîrek şirove dike , ji ber wê mebestê wedigere bo çavkaniyên wê olê ji demên bûr de , û suda wê wekî helbest diçe nav rupela zêrîna wêjeya kevin a kilasîka kurdî de.

**f- Seîd Ekabîrê Xamuşî**

Siyîd Ekabîr kurê şêx Ely ê xamûşy kurê seyd ebolwefa ye. di sala (844h/1440m) li gondê şêxan hatiye dinya yê û xwendina seretayî jî li wêderê qedendîye. Naskiryê zanistên olî û wêjeyî bûye , zimanê erebî zanîye û şarezayê serif û nehwê erebî bûye , li daviya sedeya panizdemî li sala (899h/1493m) vefat kiriye. Berhemê wî di defter û nameya Yarsan de tomar bûye.[236]Di du beytiyeke xwe de nesîheta ji xelkê re dike ku bi du kesên şareza bikevin , mebesit pîr û peyrewanê Yarsan e:

*Refêqy sifle w hamray gomra*

*Hergîz mekerin , yarany hemra*

*Mekefin we şon , kormy nareza*

---

[235]h.b., r.333
[236]h.b., r.333

*Pey wêtan peyda , pîry şareza*[237]

*Wate:*

*Hevaltîya kesên siple û  gomrah nekin*

*Li dû kesên ku rêya xwe wenda kiriye nekevin*

*Li dû kesên kor û ne riza nekein*

*Li dû pîrên dana û şareza bikevin*

Ji do beytiyeka din , seyîd ekabîr hizrê(fikir-raman) yarsan li ser kirdigar derdixe , li ser wê bawerîya ku (Hebûn) ji tiştê hûr (zere-etom) çêbûye , wê neguherîne , laşê mirov jî ji wê zere çêbûye , piştî mirin ew zere diçin di laşekî din de , û me wan zeran ji xiştên dîvarê xanî û herîya kuze (cêr) , û şînahyê de dibînîn , ew jî derdê dilê xwe ji mere dibêjin :

*Kote xiştê bîm , ce bine dîwarê*

*Naga be ziman , amawe carê*

*Watiş emin bîm , bê waney yary*

*Êsa xamoşim , hane pêwarê*

*Wate:*

*Min  Parçe xiştek dît di bin dîwarekî de*

*Bi ziman hat û  des bi axaftin kir*

*Got :min dîn ku z şeydayê yarekî bûm*

*Lê belê anha bê deng û  temirî me(sönmuşum) di  bin wî dîwarê de dijîm*

Di du beytiyeke din de monacat li gel kirdigar dike :

*Bînay gişit karan*

*Azîz her tony , bînay gişit karan*

*Ez siweylenan , merjî nedaran*

*Dildar mewêny , sob û  êwaran* [238]

---

[237]h.b., r.334

*Wate:*

*Tu her karekî dikî*

*Tu ezîzê min , tu her karek dikî*

*Hez kirina te ji sitêrka sîweîl û daran de derdikeve*

*Her dem , bi (Şev û roj) hezkirinê di te de dibînim*

Seyîd Ekabîrê xamûşî piranî mijulê pend û nesîhet e. Nîza û monacat jî ji serta serê helbestên olî yê Yarsan mebesteke serekî ye , bi taybet li ba seyîd ekabîrê xamuşî.

**g- Baba Celîlê Dewdanî**

Baba Celîl kurê Cozê Dewdanîye , di sala (883h/1478m) li gondê dewdan ji dayîk bûye , ew beyit ji bo sala ji dayîk bûna wî ye:

*We seney heştsed heşta w sê şeban*

*Celîl ce Dewdan , amawe cîhan*[239]

*Wate:*

*Ji sala heştsed û heştad û sê yê şeban*

*Celîl li dewdan , hate dunya yê*

Baba Celîl di melbenda xwe de perwerde bûye , li dema ciwantî de pir geşe kiriye , mijulê rêberîya ola Yarsan bûye. Ji pirtûka (dewreya baba celîl) hatiye ku zilamekî jîr û sofiyekî mezin bûye , zilamên mezin yê wê demê hez bi dîtina wî kirine , lê belê ew goşegîr bûye , piranî demê xwe li ba yaranê xwe bûye , temenê wî dirêj bûye , ji sala(968h/1560m)wefat kiriye.şîr û wêjeya baba celîl û yaranê wî ji nameya (dewreya baba celîl) tomar bûye , piranî sirudên wî du beytîne.[240]Baba Celîl di du beytiyên de wê nîşan dide ku rihê kirdiger(yaradan) hatiye nev laşê wî û ew bi xwe kirdigar e:

*Ecir ma ezîm*

*Ez uzugenan , ecirma ezîm*

*Xofy xolaman , hîç niyan perîm*

---

[238]h.b., r.335
[239]h.b., r.336
[240]h.b., r.336

*Penem mewaçan , celîly rehîm*[241]

*Wate:*

*Ecir û padaşta me mezin e*

*Ez ji mezinanim , ecir û padaşta me mezine*

*Tirsa min ji gencan nîne(Yaran)*

*Ji me re dibêjin celîlê rehîm*

*Di du beytiyekê din monacat (serlêdan) li gel kirdigar dike :*

*Riyazet kêşim*

*Ezîzm pey to , riyazet kêşim*

*Bizê ker we hal , derûny rîşim*

*Golim we destan , pey çêşen bêşim*[242]

*Wate:*

*Ez mijulê riyazetim*

*Ezîzê min ji bo na te , ez riyazet dikim*

*Rehmek bi derûna birîndarê min bike*

*Ji destên min de kolîk heye (kesê ku riyazet dikîşe)*

*Ji nav Yarsanan kesên wekî Baba Celîl pir hene ku pile û payeya wan bilinde.*

### 3.8. Efsane di Helbestên Yarsan de

#### a- Efsaneya Dane Enar

Pîr Mîkaîlê Dewdanî pismamê Sultan Sehak bûye , piştre ku dibe yek ji yaran pir nêzê Sultan(Sarê-şarê) kiça xwe pêşkeşê Sultan dike û dibe xizmetkarê wî. ji wê demê de Sultan dar destê şa Îbrahîm , ku hêj zarok bûye , dide bi pîr êsmaîlê golan heya ku ji baxê nîhaç de şetil bide. fermana Sultan cê bi cê dike , piştre dar şîn dibe û kulîlk dide û hinar digre , û wê hinarê ji bo Sultan dînin , Sultan ferman der dixe ji bo cem , hemû yar kom dibin , ewê yekemîn cem bûye ji pirdîwer û piştre nav nan (Niyaz). Sultan ji pîr

[241]h.b., r.337
[242]h.b., r.337

binyamîn dixaze ku dûayê niyaz bixwîne , lê belê di huzura Sultan de nikari ye , Sultan berê xwe da davud û pîr musa , ewan jî nikarî bûn , piştra ji çend yarê din xwesit lê belê bê feyde bû , piştre Sultan ferman da Seyîd Mohemedê Gewre(mezin) swar kurê xwe bi cî bîne , wî jî dest bi xwendina duaya niyaz kir :

*We îşarey şa , we fermudey yar*

*We şerit binyamîn , pîrê ser qetar*

*We razê daud , rahnimay kofar*

*We qelem zerîn , musay defterdar*

*We qerdy hîşmet , mistefay zordar*

*We xidmet kirde , pak pîrê rezbar*

*We nazy cemy , ewliyay nazar*

*We nazy cemy , ewliyay etar*

*(Etar nîşabûry)*

*Her ce roj ezel ta yewmolmişar*

*(Yewmolmişar-yewmolhisab)*

*Kerdey Yarsan , sef bo ne tomar*[243]

*Wate:*

*Bi îşareta şa bi fermudeya yar*

*Bi şertê binyamîn pîrê ser qafile*

*Bi rezamendiya davud rê nîşa derê fileyan*

*Bi pênusa zêrîn ya musayê defterdar*

*Bi hêza hîşmetê mostefayê bi hêz*

*Bi xizmet kirina pîrê rezbar*

[243]h.b., r.289-290

*Bi nazê hemîyê ewliyayî nazdar*

*Bi hemîyê nazên etarê ewlîya*

*(Etarê Neyşabûrî)*

*Ji roja ezel heya roja hesab*

*(Yewmolmişar-yewmolhisab)*

*Kirdeyên Yarsanan dên tomar kirin*

Piştî xwendina dûa , hinar didine destê davud heya ku bide hemû cem nişînan(civatva) bide , ew jî beş dike. dane hinarekî dikeve Dirzê fariş. dema ku (Sarê-şarê)dê û cem paqij dike , daneya enar dibîne , haldigre û dixwe , paş demeka hamîle dibe , û ji dev de kurekî dîne , mocîzeyeka din ya kirdigar çêdibe. Sultan ferman da Davud ku zarokê sê şev û sê roj bixe nav tenûr û derîyê tenûrê bigre , ew jî fermana Sultan bi cîh dîne , piştî sê roj Sultan tê ba tenûrê û derîyê tenurê bilind dike , zarok radibe ser lingan û silav ji Sultan dike :

*Yadgary yar , ewsa bîş menzur*

*Perê nîşane , niyaş ne tenur*

*Niyaş ne tenûr , ne şerarey nar*

*Ferma we daud , ser tenûr binyar*

*Sê roj sebriş kerid , daudy rehber*

*Niyaziş wer kerid , ama we nezer*

*Ferma we daud , ne eînim bawer*

*Dîş ama we ser , padişay pirdîwer*

*Yadigar ce tenur , urêza ew pa*

*We lefzy şîrîn , selam da we şa*

*Bergy xod rengy , kerid we xelatiş*

*Nemam kurdistan , kerid we beratiş*[244]

---

[244]h.b., r.291

